## ÇAND Û HUNER



### Xewn û xeyal bi hunerê derdikevin holê

**HUNERMENDÊ** şêwekar Luqman Ehmed jî, yek ji wan kesan e ku bi hunera xwe tekîliya di navbera çand, mirov û hunerê de radixe ber çavan. Ew, derd û êşên gelê xwe bi reng û tabloyan nîşan dide. Dengê Kurdan ê ku hatiye birîn bi saya hunerê dide sehkirin. Em bi Ehmed re li ser jiyan û hunera wî axivîn. **RÛPEL 06**


## KIRMANCKÎ



### Her çîyî ra ver Kurdîstano xoser!

**NÊ** rojan de bitaybetî Kurdîstan, Îraq, Îran, Tirkîya de, umûmî zî Ewropa, Amerîka û dinya de pêro goşî nîyayê Refarandumê Kurdîstanî ser. Her kes, her partî, her dewlete derheqê referandumî fikrê xo kenê eşkera. Eşkera kenî la nê eşkerakerdişê fikran, fikrê înanê faşîzane hîna zaf beno zelal. **RÛPEL 10**

## GEŞT Û GUZAR



### Kemaliye, bi navê xwe yê şaristanî; Eğin

**KEMALİYE**, li jora çemê Firatê ye û di navbera gelî û zinarên bilind de weke ku li benda demê be disekine. Dema wê tim dema veguhestina rojê ye. Xeyalên berê li malên wê kûçeyê nobedar in. Zeman kevin dibe, av kevin dibe, bajar kevin dibin lê wisa xuya dike ku li Kemaliyeyê tenetî kêm nabe. **RÛPEL 14**


# bas

HEFTENAMEYA NÛÇEYÎ Û ŞIROVEYÎ

HEJMAR: 36

02 - 08 COTMEH 2017

www.basnews.com




### KURDISTANIYAN JI CÎHANÊ RE BERZ KIRIN: R2

# ‘ERÊ’ JI BO SERXWEBÛNÊ

**> ROJA DÎROKÎ BI COŞEKE MEZIN DERBAS BÛ**

Referandûma serxwebûna Herêma Kurdistanê ku ev heyameke dirêje rojeva sereke ya herêm û cîhanê ye, 25ê Îlonê pêk hat. Miletê Kurdistanê bi hemû pêkhateyên xwe çûn ser sindoqan û ji serxwebûnê Kurdistanê re weke ku dihat çaverêkirin, gotin; ‘Erê’. Ev roja dîrokî ku ev sedsale Kurdistanî li bendê bûn, di nava aramî, kelecaneke mezin û weke cejnekê derbas bû.

**> HEMÛ PÊKHATE BEŞDARÎ REFERANDÛMÊ BÛN**

Roja 25ê Îlonê jî ku çavê hemû cîhanê lê bû, miletê Kurdistanê bi hemû pêkhateyên xwe çû ser sindoqan û dengên xwe dan. Herwiha hemû pêkhateyên Kurdistanê cihê xwe di dewleta serbixwe ya Kurdistanê de digirin û mafên hemû pêkhateyên olî û etnîkî yên Kurdistanê wek; Tirkmen, Êzidî, Kildanî, Suryanî, Asurî, Ereb û Ermenî hatine misogerkirin.

Nivîskar Hakan Albayrak:

## Divê Tirkiye dostê Kurdistana serbixwe be jî



R03

Nivîskarê rojnameya Kararê Hakan Albayrak piştî pêkanîna referandûmê û bidestxistina dengên ‘Erê’ ya bi rêjeyeke bilind, bi nivîsên xwe ket rojevê. Em weke Heftenameya Basê ligel Albayrak li ser rûdanên referandûmê û piştî referandûmê axivîn. Albayrak dibêje “Tirkiye û Herêma Kurdistanê dost in, bira ne û şirîk in”û dewam dike “Divê Tirkiye û Herêma Kurdistanê piştî serxwebûnê jî weke dost û bira bimînin. Divê wisa jî bimînin. Eger dewleta serbixwe ya Kurdistanê bê ava kirin divê ew jî dost û bira û şirîkê Tirkiyeyê be.”



**EKREM ÖNEN** >02

Piştî 25 îlonê rojeva cîhanê wê serxwebûna Kurdistanê be



**HOŞENG OSÊ** >03

Zirt, fort û gefxwarinên dewletên li hemanan



**FIRAT CEWERÎ** >08

Zimanê me

ROJEV R04



### “Roja referandûmê cejna netewa Kurd bû”

Di 25 Îlonê de referandûma serxwebûna Herêma Kurdistanê pêk hat. Bo refendûmê him ji dîasporayê, him jî her perçeyên din gelek Kurd çûn Herêma Kurdistanê. Ji Bakur jî gelek siyasetmedar, hunermend û welatî çûn Herêma Kurdistanê û bûn şahidê atmosfera referandûmê. Siyasetmedarên Kurd ku bo referandûmê çûbûn Herêma Kurdistanê dîtin û çavdêriyen xwe ji Heftenameya Basê re parve kirin.

ROJHILAT R07



### Plana vejandina gola Urmiyê rastî astengiyan tê

Rêveberê Navenda Çavkaniyên Avê yên Gola Urmiyê ragihand ku di demên dawiyê de asta baranbarînê li navçeyên derdora golê daketiye û di encamê de plana wan a ji bo vejandina vê golê rastî hin astengiyan hatiye û pêwîst e dewlet di vê derbarê de bûdceyeke zêdetir terxan bike. Di heyama salekê de ava golê zêdetir paş de çûye û zihabûna wê rengekî cidîtir bixwe ve digire.

ABORÎ R09




### Girtina deriyan wê tesîreke neyînî li her du aliyan bike

Serokê Konseya Karsazên Tirkiye- Îraqê û Serokê Lijneya Komeleya Lojîstîk a Karsazên Serbixwe yên Pîşesazî û Bazirganiyê (MUSÎAD) Emin Taha û Serokê Odeya Bazirganî û Pîşesaziyê yê Şirnexê Osman Geliş di derbarê egera girtina deriyên sînorî û danîna ambargoya li ser Herêma Kurdistanê û bandora vê yekê ya li ser her du aliyan de ji Heftenameya Basê re axivîn.



## EKREM ÖNEN

### Piştî 25 îlonê rojeva cîhanê wê serxwebûna Kurdistanê be

Ji 07 hezîranê heta 25 îlonê rojeva kurdan û ya cîhanê pirsa referandûma serxwebûna Kurdistanê bû. Ev dem yek ji zehmettirîn dem bû ji bo kurdan bi taybetî ji bo tevgera siyasî a başûrê Kurdistanê û ji bo serokatiya Herêma Kurdistanê. Zehmetî ew bû ku him li nav mala kurdan pirsgirêk hebûn, him ji derve de zorek mezin li ser kurdan hebû ku dev ji referandûmê berdin, lê em dikarin bêjin serokatiya Herêma Kurdistanê û tevgera siyasî li başûrê Kurdistanê xwe li hember hemû zordariya li ser wan bû girtin û ji kirina referandûmê gav bi şûnde ne avêtin û bi helwestek netewî sekneke milî nîşan dan û referandûm serkeftî bê ku tu bûyer bibin derbas kirin. Tevî ji alî ewlekariyê de gelek rîsk hebûn ku bûyerên mezin yên terorê bibin. Ji ber gelek xêrnexwazên kurdan ne dixwestin referandûm bibe. Lê li vir hêjayî gotinêye ku hêzên ewlekariyê yê Herêma Kurdistanê karekî profesyonal kirin ku nehiştin tu bûyer bibin. Bi taybetî li herêmên weke Kerkûkê ku rewşeke taybet û zehmet hebû. Ev em dikarin bêjin îmtehaneke dîrokî ya serkeftî bû ji bo hêzên ewlekariya Herêma Kurdistanê. Roja 27 îlonê komîsyona bilind a referandûmê diyar kir ku li Herêma Kurdistanê 4 581 255 kes mafê wan yê dengdanê hebûye ji vana 3 305 925 kesan dengê xwe bikar anîne yanî ji %72,16. Ji vana 2 861 471 kesî ji bo serxwebûna Kurdistanê gotin erê yanî % 92,73 her weha 224 468 kesan gotin na ji bo serxwebûna Kurdistanê yanî %07,27. Ev tev ji me re dide rêdan ku kurdan suprîz ji cîhanê re dan rêdan. Ev bê guman tesîra roja beriya referandûmê ku tevgera Goran û Îslamî helwesta xwe ya fermî aşkere kirin û ji Serxwebûna Kurdistanê re gotin erê hebû. Li hember referandûma serxwebûna Kurdistana Başûr dervî welatên Kurdistan perçe kirine hinek welatên din jî wek DYA û YA ne razî bûna xwe diyar kirin û ji kurda xwestin referandûmê nekin. Her weha hinek welatan jî wek Rûsya û Îsraîl fermî gotîn; “Ew rêzê ji îrade û daxwazên miletê kurd re digrin”. Referandûm bi selametî û serkeftî derbas bû. Niha li pêşiya kurdan karekî zehmet ku lazime bi sebir û pragmatik bê kirin heye ya herî girîng ew e ku ji ber helwesta DYA û YA a di derbarê referandûmê de negatîv, hinek kurd weke niha di medyayê de mirov lê rast tê li hustê xwe sar nebin û dijminatiya DYA û YA nekin her weha dostaniya bi Rûsya re dewam bikin ji bo kurdan gelek girînge divê di protsesa serxwebûnê de li gel Rûsya, DYA û YA dost bin bi tu awayî dijminatiya bi van welatan re ne di berjewendiyê kurdan de ye. Jixwe bi ya min helwesta DYA ji ber nakokiya hundir DYA weha negatîv bû ne ji ber dijberiya kurda ne.  Ji ber helwesta Rûsya a pozîtîv di derbarê referandûmê de û peymana ROSNEFT a ku beriya referandûmê bi du rojan li gel Herêma Kurdistanê kirin, piştî referandûmê bi rojekê Erdoğan û Ruhanî telefonî Pûtîn kirin û pirsa referandûma başûrê Kurdistanê gotûbêj kirin. Li ser hevpeyvîna wan a telefonê berdevkê medya yê Pûtîn Peskov got; Di helwesta me de a pirsa referandûmê de tu guhertin çê nebû. Her çiqas medya Tirkiye û Îranê xwestin bi awayekî din bidin diyarkirin. Her weha 28 mehê serokkomarê Rûsya Pûtîn serdana Tirkiyê kir. Beriya serdanê medya Tirkiye ji hemû pirsa bêhtir digotin wê pirsa referandûma başûrê Kurdistanê guftûgo bikin weke ku ev pirs ne pirsa kurda ye pirsa Rûsya ye. Raste di 28 mehê de di serdana Pûtîn a Tirkiyê de pirsa referandûma başûrê Kurdistanê hatiye peyivandin her çiqas Erdoğan xweş bêje; “Helwesta me û Rûsya di pirsa Iraqê de nêzî heve.” Lê Pûtîn got; “Di derbarê referandûma serxwebûna Kurdistana Iraqê de helwesta Rûsya wek prensîp aşkereye ev di beyana wezareta me a derve de hatiye diyar kirin.” Ev li malpera resmî a serokkomare Rûsya de hatiye weşandin.  http://kremlin.ru/events/president/news/55729. Her weha piştî referandûmê ku Tirkiyê got ew ê nehêlin nefta Kurdistanê biçe bazara cîhanê li ser vê ya wezîrê enerjiyê yê Rûsya Novak ji rojnamevana re got referandûm nabe asteng ji karê wan yê li Herêma Kurdistanê got; “Emê bi Herêma Kurdistanê re karê xwe dewam bikin”. Her weha got; “Ez ne bawerim Tirkiye rê bigire”. Li ser beyana Erdoğan ku got ewê rê li nefta kurdan bigre gelek ekspertan nivîsîn ku ROSNEFT û GAZPROM dikarin nefta Kurdistanê di ser rojavayê Kurdistanê û Sûriyê re bibin ser Behraspî ya din Tirkiye nikare rê li ber ROSNEFT û GAZPROM bigire ji ber projê wan ji Herêma Kurdistanê mezintir di ser Tirkiyê de diçin ku Tirkiye gelek muhtace. Rê girtina ROSNEFT ji Herêma Kurdistanê wê tesîr li projê din jî bike ku ne di berjewendiyê tirka de ne. Hewceyî gotinê ye beyana wezîrê derve ê Sûriyê Muelim di derbarê statuya kurdan li Sûriyê guhertina hevserokên PYD tev bi protsesa referandûma serxwebûna Kurdistanê ve girêdayî ye. Kur divê di nav mala xwe de li hevbin wê demê şertên serxwebûnê hin aktuel dibe û fereca xêrê wê ne dur be.



Kurdistaniyan ji cîhanê re berz kirin:

# ‘ERÊ’ ji bo serxwebûnê

■ MURAT ÖZDEMİR

> Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî jî li her platformê ragihand ku eger alternatîfekê ji rewşa heyî re bibêjin ew amade ne rûnin û gotûbêj bikin, lê her tim ev jî got; ‘Du rê li ber me hene; an bindestî an serxwebûn.’

Referandûma serxwebûna Herêma Kurdistanê ku ev heyameke dirêj e rojeva sereke ya herêm û cîhanê ye, 25ê Îlonê pêk hat. Miletê Kurdistanê bi hemû pêkhateyên xwe ve çûn ser sindoqan û ji serxwebûnê Kurdistanê re weke ku dihat çaverêkirin, gotin; ‘ERÊ’.

Biryara pêkanîna referandûma serxwebûna Kurdistanê 7ê Hezîrana îsal, di encama kombûna Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî ya bi partiyên siyasî re hat standin. Roja pêkanîna referandûma serxwebûnê ku beriya niha ji ber şerê li dijî DAIŞê hatibû paşxistin, di vê kombûnê de weke 25ê Îlonê hat destnîşankirin û komîsyona bilind a referandûm û hilbijartinê dest bi xebatên xwe kir. Bi diyarbûna roja referandûmê êdî li herêm û cîhanê rojeva sereke bû ev; ‘referandûm’. Dewletên herêmî bi nêzîkbûna dîroka pêkanîna referandûmê re helwestên xwe zelal kirin û dijayetiya xwe nîşan dan. Ji raya giştî jî bertekên cuda hatin û DYA, NY, Fransa û gelek welatan bi endîşeya tesîra neyînî ya li ser şerê li dijî DAIŞê daxwaza paşxistina referandûmê kirin. Di vê çarçoveyê de şande hatin Kurdistanê û li gel Serok Barzanî û berpirsên Kurdistanê rûniştin.

**“An bindestî, an azadî”**

Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî jî li her platformê ragihand ku eger alternatîfekê ji rewşa heyî re bibêjin ew amade ne rûnin û gotûbêj bikin, lê her tim ev jî got; ‘Du rê li ber me hene; an bindestî an serxwebûn.’ Hikûmeta Kurdistanê jî ji bo vegotina sedemên pêkanîna referandûmê li herêm û cîhanê xebatên dîplomatîk birêvebirin û heyet şandin. Herwiha piştî 2 salan Parlamentoya Kurdistanê kom bû û dest bi kar kir. Di wê navberê de dijayetiya dewletên herêmî bilind bû û gêhişt asta gefan. Li hêla din di siyaseta navxweyî de jî  geşedanên baş rû dan, Goran û Komel ku li dijî referandûmê bûn û beşdarî vê proseyê nebûbûn, biryarên xwe guhertin û bang li alîgirên xwe kirin ku biçin ser sindoqan û bibêjin, ‘Erê’. Di encama vê heyama di nava gengeşî, gef û aloziyan de, bi biryardarî û dirayeta Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî, hikûmeta Kurdistanê û miletê Kurdistanê, roja 25ê Îlonê Kurdistanî tevî hemû pêkhateyên xwe ji bo diyarkirina çarenivîsa xwe çûn ser sindoqan.

**25ê Îlonê weke cejnê derbas bû**

Ev roja dîrokî, roja diyarkirina çarenivîsa xwe ku ev sedsal e Kurdistanî li bendê bûn, bi piştgiriya her çar parçeyên Kurdistanê, di nava aramî, kelecaneke mezin û weke cejnekê derbas bû; Cejna Serxwebûnê ya Miletê Kurd. Sindoqên referandûmê weke ku hatibû gotin li herêma Kurdistanê û Kerkûk jî di nav de li herêmên Kurdî yên derveyî îdareya Herêma Kurdistanê hatin danîn. Li seranserê Herêma Kurdistanê hê bi şev xelk li ber avahiyên dengdanê sekinîn û li bendê man ku êdî ew bi xwe biryar bidin li ser çarenivîsa xwe.

**Hemû pêkhateyên olî û etnîkî beşdar bûn**

Roja 25ê Îlonê jî ku çavê hemû cîhanê lê bû, miletê Kurdistanê bi hemû pêkhateyên xwe çû ser sindoqan û dengên xwe bikar anîn. Di heyama dengdayînê de li seranserê Herêma Kurdistanê li her derê xelkê Kurdistanê bi rêjeyeke bilind beşdarî referandûmê bû. Referandûm ku berî wê gelek gef hatibûn xwarin, di nav aramiyê de derbas bû. Aheng, coş û kelecana ku berî referandûmê hebû, bi roja dengdanê re derket asta herî bilind, her der bi alên Kurdistanê hatin xemilandin, Kurdistaniyan ev roj weke cejnê pêşwazî û pîroz kirin.

**Cîhanê referandûm di cih de şopand**

Referandûma serxwebûnê ji aliyê hejmareke zêde ya nûnerên welat, rojnameger, aktîvîst, şande, hiqûqnas û pisporan ve hat şopandin û çavdêrîkirin. Şande û kesên ku referandûm dişopandin, piştî referandûmê çavdêriyên xwe bi raya giştî re parve kirin û ragihandin ku referandûm di nava rê û rêbazên demokratîk de pêk hatiye.

**12 hezar sindoq hatin danîn**

Li herêma Kurdistanê û deverên Kurdî yên derveyî îdareya Kurdistanê yên mîna Kerkûk û navçeyên wê, Xurmatû, Xaneqîn, Celawla, Karatepe û hin deverên girêdayî Mûsilê, bi tevahî 12 hezar sindoq hatin danîn. Deriyên navendên dengdanê saet 08.00an hatin vekirin û diviyabû di saet 18.00an de dengdan bi dawî bûbûya lê ji ber beşdariya zêde, maweyê dengdayînê heta saet 19.00an hat dirêjkirin.

**Ji %93 Kurdistaniyan got; ‘ERÊ’**

72 saet piştî dawîbûna dengdanê, Komîsyona Bilind a Referendûmê encamên teqez yên referandûma serxwebûnê eşkere kirin. Li gorî komsîyona referandûmê beşdariya referandûmê ji %72, 16 bû û ji % 92, 73 miletê Kurdistanê jî ji serxwebûnê re gotin, ‘ERÊ’.

Herwiha komîsyona referandûmê ev dane jî belav kirin: Di referandûmê de ji 4 milyon û 581 hezar û 255 kesan, 3 milyon û 305 hezar û 925 beşdarî dengdayînê bûn. Ji vê rêjeyê dengên derbasdar; 3 milyon û 85 hezar û 935 hatin tomarkirin. 21 hezar û 180 deng jî nehatin qebûlkirin û derbas nebûn. Ji sedî 92, 73 xelkê Kurdistanê got, ‘Erê’ û ji sedî 7, 27 xelkê jî gotin, ‘na’. Bi diyarbûna encamên teqez û rêjeyeke bilind a dengên, ‘Erê’ li seranserê Kurdistanê şahiyên pîrozbahiyê hatin li darxistin û Kurdistanî daketin qadan.

Herêma Kurdistanê bi îradeyeke mezin û dîrokî referandûma çarenivîsa xwe pêkanî. Ji ber ku berî refrandûmê ji aliyê dewletên herêmê ve ku ev dewlet li gel Kurdistanê xwedî rêjeyeke bilind a bazirganiyê ne di her warî de, gef li Kurdistanê xwarin. Lêbelê îradeya Serokatiya Kurdistanê û xelkê Kurdistanê bi ser ket û referandûm di nav aramiyê de derbas bû. Xelkê Kurdistanê di encama referandûmê de biryara xwe nîşan da ku ew dewleteke serbixwe dixwazin.

**“Tirkmen beşdarî referandûmê bûn”**

Ji wan şandeyên ku çavdêriya referandûmê kirin yek jê jî Baroya Amedê bû. Fahri Karakoyunlu ku di nav şandeya çavdêriyê ya Baroya Amedê de bû, ji  Heftenameya Basê re axivî. Parêzer Karakoyunlu diyar kir ku îdîayên çapemeniya Tirkiyê ku dibêjin Tirkmenan piştgirî neda referandûmê bêbingeh in û wiha axivî: “Em li Kerkûkê bi taybetî jî çûn taxên ku şêniyên wê Tirkmen in. Li wan taxan beşdariyeke zêde hebû. Em bi berpirsên sindoqan re jî axvîn ku Tirkmen bûn, diyar kirin ku ew ne li dijî referandûmê û serxwebûnê ne. Ragihandin ku tu kêşeyên wan li gel Kurdan nîn in û helwesta Tirkiyeyê jî şaş dibînin. Jixwe li wê herêmê 7 partiyên Tirkmenan hebûn û tenê yêkê piştgirî neda referandûmê, yên din hemû beşdar bûn.

**“Mafên Tirkmenan wê di bin garantiyê de bin”**

Serokê Partiya Geşepêdanê ya Tirkmenan Mihemed Sadedîn jî ji Basê re diyar kir ku mafên Tirkmenan di dewleta serbixwe ya Kurdistanê de wê di bin misogeriyê de bin û ragihand ku nûnerên Tirkmenan jibilî parlamentoyê wê di nava hikûmetê de jî cih bigirin. Sadedîn herwiha got ku hinek bendên wê rêkeftnamê wê di Destûrê de bi awayê nivîskî jî cih bigirin û hinek jî wê weke yasa bên pêkanîn.

**“Ev projeyeke niştimanî û Kurdistanî ye”**

Nivîskar û rewşenbîr Simko Mihemed li ser encamên referandûmê û dengvedan û geşedanên piştî referandûmê ji Heftenameya Basê re axivî. Simko dibêje, ev projeyeke niştimanî û Kurdistanî ye. Mafê her kesî heye ku beşdariyê tê de bike û axaftina xwe wiha berdewam dike: “Mecalek nemaye ku Kurdistan li gel Îraqê bimîne. Hemû aliyên siyasî beşdar bûn. Bertekên ku ji Rojhilata Navîn bilind dibin jî me şaş nakin, ji ber ku demokrasî li Rojhilata Navîn nîn e. Qewmiyetî û hizbayetî heye. Di warên maf û azadiyan de kêmasiyên mezin hene di Rojhilata Navîn de. Ev gengeşeya ku bi navê ambargoyê bilêv dikin jî bi ya min di rojên bê de bi riya danûstandinan wê çareser bibin. Ji ber ku ev şerê kompaniyan e. Her kompanî jî li berjewendiyên xwe dinêre.”

**“Eger hêzên navdewletî li dij bûna rê nedidan”**

Mihemed di dewama gotinên xwe de bertekên hêzên navdewletî dinirxîne û dibêje: “Ev mijar ne lokalî ye û êdî bûye navdewletî. Bi dîtina min eger palpiştek û piştgiriyek nebûya gaveke wiha nedihat avêtin. Divê di vê çarçoveyê de bê xwendin. Herêma Kurdistanê xwedî tecrûbe ye. Ev ne meseleyeke hêsan e. Eger hêzên navdewetî li dij bûna rê nedidan, ji her welatî ji bo çavdêriyê nedihatin. Hemû dewlet amade bûn di proseya dengdanê de. Îhtîmal e ku hin gotinên wan li dij bin. Lê Herêma Kurdistanê bêyî piştgirî gaveke wiha nediavêt. Divê Herêma Kurdistanê li her derê xebatên xwe yên dîplomatîk zêdetir bike, lobiya xwe bilind bike.”

**“Barzanî karekî dîrokî pêkanî”**

Lêkolîner,  Prof. Cengiz Aktar jî li ser encamên referandûmê ji Basê re axivî. Aktar dibêje tu kes nikare encama referandûmê nebîne û wiha pê de diçe: “A girîng ew e ku bi rêjeyeke beşdariyê ya zêdetirî ji sedî 70, derketina ji sedî 93 ye. Ev wê were nivîsin ne ku biryarên parlamentoya Îraqê an Destûra wê. Ev qonaxên wiha bi hêsanî derbas nabin, qonaxên ‘diyarkirina çarenivîsa xwe’ bi nermî derbas nabin. Divê bê qebûlkirin ku Mesûd Barzanî karekî dîrokî pêk anî, giraniya xwe dîsa nîşan da.”

> Roja 25ê Îlonê jî ku çavê hemû cîhanê lê bû, miletê Kurdistanê bi hemû pêkhateyên xwe çû ser sindoqan û dengên xwe bikar anîn. Di heyama dengdayînê de li seranserê Herêma Kurdistanê li her derê xelkê Kurdistanê bi rêjeyeke bilind beşdarî referandûmê bû.

## Mafê hemû pêkhateyên Kurdistanê hatine misogerkirin

Li hêla din pêkvejiyan di navbera pêkhateyên li Kurdistanê xurtir dibe û hemû pêkhateyên li Kurdistanê cihê xwe di dewleta serbixwe ya Kurdistanê de digirin. Hat ragihandin ku maf û daxwazên pêkhateyên Kurdistanê bi belgeyekê hatine misogerkirin.

Konseya Bilind a Referandûmê beriya pêkanîna referandûmê li gel pêkhateyên olî û etnîkî yên Kurdistanê rûniştin. Di vê civîna hemû konsey û pêkhateyên Kurdistanê de ji bo mafên hemû pêkhateyan temînat hatiye dayîn. Di vê civînê de her du aliyan li ser rêkeftineke ku ji 16 bendan pêk tê, li hev kirin. Di van 16 xalan de mafên pêkhateyên Kurdistanê bi avabûna dewleta Kurdistanê, di bin garantiyê de ne.

Li ser vê mijarê Endamê Konseya Bilind a referandûmê Şêx Şamo ji Basê re axivî. Şamo ragihand ku hê ku dewlet nehatiye ragihandin mafên hemû pêkhateyan misogerkirî ne. Parlamenterê Êzidî yê Parlamentoya Kurdistanê Şêx Şamo eşkere kir ku mafên hemû pêkhateyên olî û etnîkî yên li Kurdistanê wek; Tirkmen, Êzidî, Kildanî, Suryanî, Asurî, Ereb û Ermenî di bin temînatê de ne. Ev belge dîrokî ye. Di Rojhilata Navîn de yekem car dewletek hê ku serxwebûna xwe îlan nekiriye mafên hemû pêkhateyan nas dike û temînatê dide û her wiha rizaya wan distîne. Ew 16 bendên ku li ser li hev kirine, wê bibin bendên sereke û esas yên Destûrê.

Nivîskar Hakan Albayrak:

# Divê Tirkiye dostê Kurdistana serbixwe be jî

■ CESIM ÎLHAN

Nivîskarê rojnameya Kararê Hakan Albayrak piştî pêkanîna referandûmê û bidestxistina dengên 'Erê' ya bi rêjeyeke bilind, bi nivîsên xwe ket rojevê. Em weke Heftenameya Basê ligel Albayrak li geşedanên referandûmê û piştî referandûmê axivîn. Albayrak dibêje "Tirkiye û Herêma Kurdistanê dost in, bira ne û şirîk in"û dewam dike "Divê Tirkiye û Herêma Kurdistanê piştî serxwebûnê jî weke dost û bira bimînin."

**Referandûma Herêma Kurdistanê çima Tirkiyeyê nerehet dike? Bi rastî jî Kurd 'Kêşeya Beqayê' ne?**

Haşa. Kurd wesîleya beqayê ne. Ez ji girêdana Kurdên Tirkiyeyê bi Tirkiyeyê re bê guman im. Îstîsna hebin jî normal e, ew qaîdeyê xira nakin. Ez ji dostanî û biratiya Herêma Kurdistanê tevî gel û berpirsyarên xwe ve jî bê guman im. Li wir jî îstîsna hebin hene, ew jî qaîdeyê xira nakin. Ez ne di wê baweriyê de me ku Herêma Kurdistanê serxwebûna xwe îlan jî bike ji bo Tirkiyeyê bibe pirsgirêk. Ez wan fikr û ramanên ku di vê baweriyê de ne jî bi matmayî dişopînim. Li aliyê din jî di wê fikrê de me ku ew nexşeyên ji holê nehatine rakirin ku Tirkiyeyê jî parçe dikin û ragirtina ala Îsraîlê û bi xwe re anîna metirsiyan jî fêm dikim û divê em ji bo wan kesan jî bi rêz bin ku ji vê rewşê gumanbar in. Ev tişt tirsa parçebûnê, dorpêçkirinê û beqayê dixe nav hişê hin kesan.

**Egera danîna ambargoya aboriyê ya li ser Herêma Kurdistanê wê çi bandorê li herêmê bike?**

Têkiliyên di navbera Herêma Kurdistanê û Îraqê, Herêma Kurdistanê û Tirkiye, Îran û Herêma Kurdistanê de li ser menfaatên du alî ne. Kî ambargo deyne ser Kurdistanê wê zirarê bide xwe jî. Bifikirin ku Tirkiye ambargo danî û Îranê danenî, an jî berovajî bifikirin, wê demê kî ambargo daneyne wê valahiya yê din dagire. Kî wê valahiyê dagire wê him kara aborî bidest bixe him jî wê prestîja xwe ya ligel Herêma Kurdistanê zêde bike û sengereke siyasî bidest bixe. Em bibêjin ku Tirkiye, Îran û Îraqê bi hev re ambargoyeke hişk danîn ser Herêma Kurdistanê, wê gelê Herêma Kurdistanê mexdûr bike û dê ew gunehên wan ji serê me hêdî hêdî jî derkeve. Eger ambargoyeke mişterek û bi rijid deynin û Herêma Kurdistanê jî dev ji daxwaza serxwebûnê bernede kî bernade jî wê demê ji bo DYAyê wê derfet derkeve holê. Neçarî dibe ku Herêma Kurdistanê ber bi Bakurê Sûriyeyê ve bibe ku li wir dezgeha (lîstik) DYAyê heye.

**Qeyranek di navbera Herêma Kurdistanê û Tirkiyeyê de derkeve wê çi bandorê li Kurdên Tirkiyeyê bike?**

Dê bandoreke neyînî ya derûnî bike. Bi rastî jî ez niha nizanim ev bandor wê encameke çawa derxe holê, eger encamekê derxe jî wê ev encam çawa be tê dernaxim niha.

Gotinên berpirsiyarên Tirkiyeyê bi dijberiya referandûmê dest pê kirin û derbasî asta dijberiya Kurdan bûn. Bi taybetî jî siyasetmedar û medya li hember Serok Barzanî zimanê kerb û nefretê bikar tînin. Ligel ku têkilî ewqas baş bûn jî, ji ber referandûmê ev kiryar derketin holê, divê mirov vê yekê çawa bixwîne?

Ev cihê xemgîniyê ye. Tirkiye û Herêma Kurdistanê dost in, bira ne, şirîk in. Divê wisa jî bimînin. Eger dewleta serbixwe ya Kurdistanê bê ava kirin divê ew jî dost û bira û şirîkê Tirkiyeyê be. A niha gotin û rewş tund e lê di demeke nêz de wê ev rewş were asta asayî û navbera Hewlêr û Enqereyê dê baş bibe.

**Têkiliyên Tirkiye ligel Îran û Îraqê ne baş bûn lê di carekê de li hember serxwebûna Kurdistanê dev ji şirîkê xwe berdan û ligel wan tevgeriyan. Tu vê yekê çawa dinirxînî?**

Zehmet be jî divê mirov bi hestên aqilane şîrove bike.

**Tirkiye di mijara Kurdistanê de bi rastî jî, ji Îranê bawer dike? Gelo baweriya Îranê bi Tirkiyeyê heye?**

Bawer nakim.

**Li gor hiqûqa Îslamê û mafê biratiyê heqê Kurdan tuneye ku dewleta xwe ava bikin?**

Tişta girîng wehdeta misilmanan e, yekîtiya Îslamê ye. Mixabin ev ne di rojeva cîhana Îslamê de ye. Tunebûna rojeveke wisa, parastina sînorên niha û dewletên cîhana Îslamî yên niha li hember derketina dewleta Kurdistanê di vê mijarê de tenê subjektîf e. Nakeve asta realîstiyê. Rojeveke wiha hebe jî rastiyê naguherîne. Niha di serdema me de Yekîtiya Îslamî encax bi beşdariya dewletan, mînak weke Yekîtiya Ewropa bê avakirin. Ji ber vê yekê jî ez asayî dibînim. Heta li gor civaka Îraqê ya resen û dîroka şexsî ya Kurdên Îraqê, veguhestina Herêma Kurdistanê ber bi Kurdistana serbixwe ve ez asayî dibînim. Ez wisa difikirim ku li hember vê yekê kes nikare bisekine jî. Bi rastî hîsîyata min wisa ye.

**Ew kesên ku dema komkujî û jenosîdên Enfal û Helepçeyê li ser Kurdan dihatin kirin bêdeng bûn, ji ber çi li hember referandûmê derdikevin?**

Wan kesan ew komkujî ji xwe re nekirine dert, ew li aliyekî... Di nav ên ku li hember Serxwebûna Herêma Kurdistanê derdikvin de kesên li hember zilm û qetlîamên Sedam sekinîne û hêsîr rijandine jî hene. Heta kesên di wan demên qetlîaman de alîkarî berhev dikirin jî hene. Li gor min divê bi wan kesan re jî hevpeyvîn bê kirin. Divê ji wan helwesta wan bê pirsîn, divê hûn vê mijarê li gel wan bi giştî nîqaş bikin."

**Li gorî te umeta Îslamê ji neviyên Selahaddînê Eyûbî re ne deyndar in?**

Çawa ne deyndar in?

**Weke tê zanîn projeya Îranê ya Xîlala Şîe heye. Dijberiya Tirkiyeyê bi Îran û Îraqê re li hember Kurdistana serbixwe û li hember Kurdên Sûne wê li herêmê Xîlala Şîe xurt neke gelo?**

Berpirsyarên dewleta Îranê ku navê wê 'Komara Îslamî ya Îranê' ye bi dîrok û şaristaniya xwe ya hezar salî pesn didin. Referansên beriya Îslamê ji xwe re dikin bingeh. Me di Mahmûd Ehmedînejad de jî ev yek dît. Fikra Îranê ne tenê li ser Şîetiyê dimeşe, herwiha bi armanca Împaratoriya Persan û Îrana mezin jî tevdigerin. Li gor min fikra Şîetiyê ji aliyê dewleta Îranê ve ji bo armanca emperyalîzmê tê bikar anîn û tê suîstîmalkirin. Ji ber vê yekê gotina 'Xîlala Şîe' tercîh nakim. Mijar emperyalîzma Îranê ye û Îraq jî di bin mêtingeriya Îranê de ye. Divê Tirkiye ji pevçûna bi Îranê re xwe dûr bigire. Ji bo lihevkirina bi Îranê re divê herdem li rêyên baş bigere û bibîne. Lê li hember emperyalîzma Îranê jî divê di heman demê de di amadekariyê de be. Dibe ku Îran li hember referandûma serxwebûna Herêma Kurdistanê, Tirkiyeyê bikar bîne û serweriya xwe ya li ser Îraqê zeximtir bike jî. Dibe ku li wê hêviyê be ku Hewlêr bi şert û merc bi Bexdayê ve bê girêdan û jixwe ev yek Hewlêrê bi Tehranê ve girê dide. Dibe ku di wê fikrê de be ku 'Tirkiye wê bibe dijminê Herêma Kurdistanê û dostaniya Herêma Kurdistanê wê tenê ji min re bimîne.' Gelo wê basîret û feraseta Enqereyê ji pêkanîna vê planê re rê veke? Qet pêşbînî nakim.

**Ger Tirkiye li hember Kurdistana serbixwe derkeve, wê di nav Kurdên Tirkiyeyê de veqetandineke derûnî dernexe holê, di nav van Kurdan de piştgiriya AKPê kêm nake?**

Dibe ku piştgiriyê na, lê wê coşa piştgiriyê kêm bike. Alternatîfeke maqûl a AK Partiyê tune ye.

**Gotina Serokwezîr Binalî Yıldırım a "Em ê mijara referandûmê bi Neteweyên Yekgirtî, DYA, Rûsya, NATO, Brîtanya û Fransayê re di koordînasyonê de birêve bibin" tê çi wateyê?**

Nizanim.

**Li Tirkiyeyê hin komên Kurdan dibêjin: "Bi rastî AK Parti û Erdoğan ne li hember referandûm û serxwebûnê ne lê ji bo neteweperestan di destên xwe de bigirin û dilê Devlet Bahçeli xweş bikin li hember derdikevin" tu çi difikirî?**

Di nav de xweşkirina dilê Partiya Nijadperestên Tirkiyeyê jî heye lê ez bawer nakim hemû mijar bi vê yekê ve girêdayî be.

**Li gor te Tirkiye di fikra şer de cidî ye, gelo dê li hember Herêma Kurdistanê şer ragihînin? Gelo wê Tirkiye û Erdoğan mitefîkê xwe yê herî baş Serok Mesûd Barzanî ji çav derxînin?**

Serokwezîr Binali Yıldırım got, " Em nakevin şer." Hêvîdar im Eroğan û Mesûd Barzanî demildest hev hembêz bikin û daxwaza şerkeran di qirika wan de bihêlin.

**Hebûna dewleteke Kurdan di warê Îslamê de kêşeyeke çawa ye? Bi taybetî jî Îslamîst, Kurdistanê bi 'Parçekirina Umetê' tewanbar dikin...**

Di vê mijarê de yekdengî tune ye. Hin alî hene dibêjin, "Em dibêjin bila sînorên heyî di nav misilmanan de rabin, hûn diçin sînorekî din ava dikin." Hin alî jî dibêjin "Madem netewdewletên li cîhana Îslamê hene, bi sînorên xwe rijd in, wisa be zêdebûna Kurdistanê jî li wan rewa ye" Yên dibêjin " Mafê wan e bila ava bikin" Yên dibêjin: "Lê belê ew dewlet wê nebe ya Kurdan! Wê bibe pelîstoka Sîyonîst û Emperyalîstan" hene. Ez dixwazim careke din bilêv bikim ku di karnaval û festîvalên dema referandûmê de rakirina ala Îsraîlê, ji bo fikrên nebaş bû sedem ango yên ku nêrîna wan menfî bû, ew nêrîn bi wan re xurttir kir. Di vê mijarê de nêrîna hemû Îslamiyan wek hev e. Hemû Îslamîst, Kurd an jî Tirk li hember vê yekê yekdeng in û dibêjin îzaha vê yekê jî tune ye. Dibe ku îzaha wê ya maqûl ev be: "Îsraîl bi xwe wan alan li wir didaliqîne, ji ber ku dixwaze di navbera misilmanên cîhanê û Kurdan de dîwarekî ava bike." Têkiliyên Tirkiye û gelek dewletên Ereban jî ligel Îsraîlê tune ne qey? Hene. Ev têkilî li hin deveran di asta şirîkatiya stratejîk de ne. Lê gelên misilman ji vê yekê hez nakin, aciz dibin, şerm dikin. Dema ku têkiliyên Tirkiye û Îsraîlê di asta herî baş de bûn jî tu hemwelatiyê me ala Îsraîlê ranekir. Heta ku alîgirên Îsraîlê jî ranekirin. Eger xwestibin jî ji berteka gel tirsiyane. Li Hewlêrê berteke wiha ya gel nîne. Divê hebe. Dibe ku hebe jî em nizanin. Dibe ku di televizyon û rojnameyên wir de nîqaşek di derbarê vê mijarê de hebe jî lê em nizanin. Nêzîkatiya me û bê haydarbûna me ya ji hev pirsgirêkeke mezin e. Bi vî awayî em têkelî vê pirsgirêkê jî bibin.

**Herî dawî tu dikarî fikr û ramanên xwe yên di derbarê Herêma Kurdistanê de ji me re vebêjî?**

Bi gel û hikûmeta xwe ve li ser serî û çavên min in. Li Kerkûkê bi Kurd, Ereb, Tirkmen û neteweyên din jî bi hemû dewlemendî û rengên xwe li serçavên min in. Ez ji bo serxwebûna Kurdistanê bi rêyeke aştiyane û demokratîk encam bide dia dikim. Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî dibêje: "Referandûm nayê wê wateyê ku sînoran xêz bikin, emrîvakî bikin." Dibêje em di mijarên sînor, xaza sirûştî, neft û herêmên nakokî de amade ne guftûgoyan bikin. Ev helwest hêviyê dide mirovan.



> "Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî dibêje: "Referandûm nayê wê wateyê ku emê sînoran deynin û emrîwakî bikin." Dibêje em di mijarên sînor, qaza sirûştî, neft û herêmên binîqaş de amade ne guftûgoyan bikin. Ev helwest hêviyê dide mirovan."

**Her çiqas berpirsiyarên Herêma Kurdistanê bibêjin 'referandûm ji bo Tirkiyeyê ne tehdit e, heta ji bo Tirkiyeyê baştir e' jî Tirkiye li hember serxwebûna Kurdistanê bi tund e. Di vê mijarê de jî bi înyad û bi israr e. Tirkiye ji ber çi vê riyê hildibijêre?**

Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî dibêje: "Em bi Tirkiye û Îranê re dost in. Eger destê dostaniya me vegerînin jî em dostê wan in. Em ê dirêjkirina destê dostaniya xwe bidomînin." Serokwezîr Nêçîrvan Barzanî dibêje, "Dostê Tirkiyeyê li herêmê weke Herêma Kurdistanê baş nîn in, em gelek qedir didin vê dostaniyê, em Tirkiyeyê tehdît nakin, di hêviya baştirkirina têkiliyên ligel Tirkiyeyê de ne." Zimanê ji sedî sed rast jî ev e. Eger di vî ziman û nêrîna zanistî de bê domandin û ji bo ewlekariyê jî hinek tedbîrên din bên stendin wê rewş biguhere.

> "Tirkiye û Herêma Kurdistanê dost in, bira ne, şirîk in. Divê wisa jî bimînin. Eger dewleta serbixwe ya Kurdistanê bê ava kirin divê ew jî dost û bira û şirîkê Tirkiyeyê be. A niha gotin û rewş tund e lê di demeke nêz de wê ev rewş were asta asayî û navbera Hewlêr û Enqereyê dê baş bibe."

**Weke ku tu jî dizanî umet ne ji yekîtiya netewekî, yekîtiya bawermendên olekê pêk tê. Kurd, bi dewleta xwe nikarin di nav vê yekîtiyê de cih bigirin?**

Kurd di her rewşê de parçeyekî ji umetê ne. Dema dewleta serbixwe ya Kurdistanê hat avakirin ev yek dê bidome. Lê neheqiyê li Herêma Kurdistanê nekin. Herêma Kurdistanê mafê hemû pêkhateyan daye wan, ne tenê dewleta Kurdan e. Yanê tê gotin ku ew dewlet wê bibe dewleta hemû pêkhateyên Kurdistanê. Dema nasnameya neteweyî binav dikin nabêjin Kurd, dibêjin Kurdistanî. Ji ber ku hejmara Kurdan zaftir e û pêşengên serxwebûnê Kurd in her dem gotina 'Em Kurd' wê di proseyê de be. Lê belê di pratîkê de netewdewlet ji holê hatiye rakirin.

---

**HOŞENG OSÊ**

## Zirt, fort û gefxwarinên dewletên li hemanan



Tirkiye ji aliyekî ve, dewletên ereb ji aliyekî û Îran ji aliyekî din ve, hema her kes êdî li ser serên kurdan xwe dikin "qehreman" gefan dixwin, çavan sor dikin û diranan qîç û tûj dikin. Çi ye? Ne çi ye? Dixwazin kurd û tim çarenûsa wan di destê tirk, ereb û farisan de bimîne. Hingî çavên gelên xwe û yên herêmê ji referandûmê tirsandin êdî hest û henaseke wisa peyda bûbû ku di roja 25 Îlona 2017an de dê volkan biteqin, erdlerzên mezin çêbibin, lehî û tofan dê rabin. Lê roja 25ê Îlonê derbas bû û dawiya cîhan û jiyanê neanî! Û nebû "roja qiyametê".

Tirkiye dibêje: "Em qebûl nakin kurd bibin dewlet, eger bibin dewlet dê aramiya me û ewlekariya me ya netewî xerab bibe û dewleta me yê perçe bibe û hilweşe". Lewma ji mafê xwe dibîne ku: Nan, av, ba, baran, ronahiya rojê ji ser Kurdistanê bibir e! Îran jî wisa dibêje, ji xwe tew Iraq û Sûriye dema behsa metirsiyên referandûmê li ser "aramî û serweriya xwe" dikirin, te digot qey ev her du dewlet ne di nava şer, pevçûn, gendelî û destwerdanên derve de fetisîne. Te digot qey ev her du dewlet ne Sûriye û Iraq, lê Swîssre ne û di nava şîr, şekir û hingivê aramî, aştî, azadî û pêşketinê de dijîn.

Baş e, hela dev ji Sûriye û Iraqê berdin ku du dewletên xerabe, kambax û têkçûyî ne, lê çi derdê Tirkiyê û Îranê ye ku ewqas dikirin "firt firt" û "agir ketiye wan" û hema ji xwe ditirsin ku hilweşin? Ma ne qaşo temenê Tirkiye ji sala 1923an destpê dike! Ango dewleteke temen 94 salî ye û xwe dispêre dîroka Selçûqî û Osmaniyan û ji xwe bawer e! Û bi aborî û artêşa xwe, xwe dibîne û xwe paye dike, çima ewqas ji serxwebûna kurdên Başûr ditirs e? Eger wisa be, naxwe ewqas xwepesindan, payebûn, zirt û fortê Tirkiyê tev tewş û vala ne.

Tew Îran!! Tew Îran a ku temenê wê, weke dewlet û sîstem, zêdetirî du hezar sal e û qaşo komareke îslamî ye, ev dewlet çima ji serxwebûna Kurdistanê diveciniq e û ditirs e? Mirov li gef û çavsoriyên melayên şaşikreşên Îranê guhdar dike, tu dibêjî qey hema Kurdistan serxwebûna xwe îlan bike, dê di cih de Îran hilweş e!

Dema mirov li rewş û helwestên Tirkiyê, Îran, Iraq û Sûriyê dinêre ku çawa ji serxwebûna kurdan dilerizin û ditirsin, ku ev serxwebûn li ser 1 $km^2$ be jî, dixwazin êrîşî vê dewletê bikin û weke gurên har wê bixwin. Çima? Ji ber ku ne tenê rejîmên van dewletên nijadperest, faşîst in, lê ev dewlet, bin wan şil e û ji xwe ditirsin û nas dikin bê heta çi rade û astê mafê kurd û Kurdistanê xwarine. Ango ev dewlet, li hemanan in û ev "zirt û fort" û gefxwarin valan e û dê nebin sedemên ku kurd gavan li paş bavêjin û roj vegerin berî 25 Îlonê.

Ew dema ku rejîmên Enqere, Tehran, Bexdad û Şamê dest û milên kurdan badidan û dişkandin, ew dem çû û nema vedigere. Ev rastî, gelê kurd di roja 25 Îlonê de tekez û piştrast kir. Kurd dizanîn ku daxwaza paşvexistina referandûmê xêra wan têde tunebû û eger paşvexistinê qebûlkiribana, dê daxwaz û projeya serxwebûnê zerar û ziyaneke mezin bidîta. Ango ew hemû tehdîd û gefxwarin nedikarîn vîn, biryar û îradeya kurdan bişkînin.

Her kes dizane ku eger Tirkiye bixwaze Kurdistanê biêşîne, Tirkiye xwe diêşîne, ne tenê li ser asta aborî, siyasî û exlaqî, lê li ser asta ewlekarî jî, xwe diêşîne. Ji berjewendiyê Tirkiyê ye ku dewleteke kurd serbixwe li ser sînorên wê hebe. Dewleta kurd a serbixwe, dikare bibe dost û pişt ji Tirkiyê re û dikar bibe hêza alîkar a çareseriyê ji pirsa kurd a Tirkiyê. Ez bawer nakim AKP û Erdoğan ewqas dîn bin û kevir li çok û serê xwe bixin dema berê xwe bidin dijmintiya dewletbûna kurdan. Eger wisa be, Tirkiyê dê gelek winda bike.

Divê Tirkiyê ji ast û qûnaxa "dewleta li hemana" xwe derîne. Ev yek jî ne bi çavsorkirin û dijminatî, lê tenê bi dostbûn û rêzgirtina Kurdistana serbixwe pêktê. Divê Tirkiyê neyê rîsk, lîsk, xep û xefkên ku Tahran ji Enqerê re di Kurdistanê de vedide.

Bi rastî mirov bi hêsanî û bawerî dikar bêje: Çawa ku Mela Mustafa Barzanî şoreşa Îlona yekemîn di 11.09.1961ê de li dar xist, her wisa birêz Mesûd Barzanî di 25.09.2017an de şoreşa Îlona a duyemîn li dar xist. Biqasî şoreşa 11 Îlona 1961ê girîng e, ewqas jî şoreşa 25 Îlona 2017an jî girîng û berhemdar e ku bingeha sexwebûn û dewletbûna kurdan daniye û li ser ava dike. Hêvî ew e ku Kurdistana serbixwe bibe mînaka dewleteke resen, xurt, demokrat, sivîl, azad û pêşketî di nava birek dewletên li hemanan de.

## Siyasetmedarên Kurd:

# Roja referandûmê cejna netewa Kurd bû

NEFEL ZAGROSÎ

Di 25 Îlonê de referandûma serxwebûna Herêma Kurdistanê pêk hat. Bo refendûmê him ji dîasporayê, him jî her perçeyên din gelek Kurd çûn Herêma Kurdistanê. Ji Bakur jî gelek siyasetmedar, hunermend û welatî çûn Herêma Kurdistanê û bûn şahidê atmosfera referandûmê. Serokê Partiya Sosyalîst a Kurdistanê (PSK) Mesût Tek, Serokê Partiya Demokrat a Kurdistan a Tirkiyeyê (PDK-T) Mehmet Emin Kardaş, Serokê Partiya Azadî û Sosyalîzmê (ÖSP) Sinan Çiftyürek, siyasetmedarên Kurd ku bo referandûmê çûbûn Herêma Kurdistanê dîtin û çavdêriyen xwe ji Heftenameya Basê re parve kirin.

**"Li Herêma Kurdistanê referandûm bi coş derbas bû"**

Serokê PSKê Mesut Tek, destnîşan dike ku atmosfera referandûma Herêma Kurdistanê gelek bi kelecan û bi coş bû û axaftina xwe wiha didomîne: "Jin, zarok mêr, kal, xort hemûyan bi hev re dîlan digirtin. Atmosfereke gelek hêja û xweş bû. Her wisa encama beşdariya referandûmê jî nîşan dide ku ne bi tenê Kurd, pêkhateyên ku li Kurdistanê dijîn wek Asûrî, Ermen, Ereb, Tirkmen jî beşdarî referandûmê bûn. Dîsa encama Kerkûk, deşta Nînova, deşta Misûl jî nîşan didin ku yên ku ne Kurd in lê bi Kurdan re dijîn xuya bû dilê wan jî bi Kurdan re bû û çûn ser sindoqan û dengê 'Erê' dan. Ev encam, bersiveke gelek baş bû û bi hêz bû ku ew kes û aliyên ku digotin Suryan, Tirkman, Erebên ku li Kurdistanê dijîn di bin zilmê de ne. Suryan, Tirkmen, Ereb bi deng û beşdariya xwe bersiveke gelek xurt dan. Em berî referandûmê çûn Herêma Kurdistanê. Wexta ku em çûn em di nav gel de bûn. Ez ne çavdêr bûm lê çûm serdana sindoqekê. Lê di referandûmê de hevalên me wekî çavdêr li ser sindoqan bûn."


**"Divê înîsiyatîfa bo piştgiriya referandûmê xebatên xwe bidomîne"**

Mesût Tek amaje dike ku referandûm prosyek bû û Kurd bi serketin û serkeftineke dîrokî bû lê bi qasî referandûmê piştî referandumê jî gelek giring e û pê de diçe: " Wisa xuya ye ku em Kurdên Bakur PAK, ÖSP, Tevgera Azadî, PSK, KDP/B çawa ku bo pişgiriyê me li hev kir û bo piştgiriya referandumê înisiyatifek hat avakirin. Divê dîsa ev înîsiyatîf bi armanc û bi dînamîzmeke cuda lihevhatineke wisa bike da ku piştî proseya referandûmê bo piştgiriya serxwebuna Kurdistanê, gelo em bi hev re dikarin çi bikin, biaxivin. Em ê piştî demekê civîna xwe bikin û li ser vê biryarê bidin. Hin aliyên siyasî di wexta referandumê de tevlî înîsiyatifê nebûn, em hêvî dikim ev alî bên beşdarî ve înîsiyatifê bibin."

**"Hemû pêkhateyên olî û etnîkî beşdarî referandûmê bûn"**

Serokê PDK-Tê yê Mehmet Emin Kardaş jî di derbarê roja referandûmê de dîtin û çavderiyên xwe tîne ziman û dibêje, roja referandûmê cejna netewa Kurd bû û herkes geş û bi coş bû. Kardaş wiha axaftina xwe berdewam dike, " Morala gelê me gelek xweş bû. Li kolanan û hema li her cihî dawet hebû û bi rastî kelecaneke zêde hebû. Reqs, govend hebû û li ser referandumê nirxandin û axaftin dihat kirin. Ji her perçeyên Kurdistanê gelê me, çi siyasetmedar, çi akademisyen, çi hunermend hatibûn. Em li cihên ku sindoq danîbûn geriyan û ji xortê 17 salî heta mirovên 70î salî herkes bi awayekî dihatin û bi girseyî diçûn li ser sindoqan. Yanî, dema em çûn ser sindoqan me fem kir ku beşdariyeke baş heye. Te ji kê dipirsiya digotin 'Belê'. Her wisa li wir mafê demokrasiyê, mafên kesayetiyê hene û derbas dibin. Li wir hemû netew û olên wek Sunî, Şîa, Kurd, Ermen, Tirkmen hwd bi kêf û coş bûn bi rastî dîmenên xweş bûn."







**"Kurd divê li ser axa xwe doza dewletbûnê bikin"**

Mehmet Emin Kardaş diyar dike ku welatê Kurdan perçe bûye, Kurd ji hev belav bûne û bi sinorên ne fermî gel ji hev qetandine, çi têkiliya siyasî, çi ya ticarî, çi civakî û heta bi qaçaxî be jî heya niha ev têkilî nehatiye qut kirin û Kardaş wiha dawî li axaftina xwe tîne, "Cîhan tev de li dijî referandûmê rabe û li hember mafê rewa yê Kurdan derkeve ew ne demokratik, ne xwezayî, ne însanî, ne jî rewa ye. Her wisa, hê ev dewletên dagirker çawa radibin dibêjin ev referandûm ne meşrû ye. Di cihanê de herkes li gor berjewendiyên xwe tevdigere û demokrasiya wan jî wisa ye. Em Kurd, kîjan franksiyon, kîjan partî, kîjan fikr û ramanê bin, divê em îro li ser yekîtiya xwe cî bigirin. Li ser axa xwe doza dewletbûnê bikin û pey mafê xwe yê rewa bin û vê jî ragihînin cihanê. "


> Encamên referandûma serxwebûna Herêma Kurdistanê zêdetir ket rojeva Kurdan û ya cihanê. Siyasetmedarên Kurd ku di referandûmê de çûbûn Herêma Kurdistanê dibêjin tevî Kurdan gelên din jî bi coş û bi biryar beşdarî referandûmê bûn.

**"Gelên Kurdistanê bi biryar bûn"**

Serokê ÖSP Sînan Çiftyürek jî li ser roja referandûmê çavdêriyên xwe ji Heftenameya Basê re anî ziman ku desteya ÖSP şeva 22ê vê mehê gihiştiye Hewlerê û ewlehiya Tirkiye bo wan gelek astengî derxistiye. Çiftyürek axaftina xwe wiha didomîne, "Ji bakur çend kes û ji Ewropeyê jî hevalên me hatibûn wir. Me wek desteya ÖSP biryar girt, me got em helwesta siyasetmedarên me yên başûr ên wek Kdp, Ynkê, Goran dizanin. Gelo helwesta gelê me û helwesta gelên Kurdistanê çi ye da ku hîn bibin û rewşa kolanan jî fêm bikin ketin nav gel. Me li wir çi dît? Me dit ku ji her perçeyên Kurdistanê, li diasporayê, ji Xorasanê, ji Kurdisatana Sor hema hemû welatî, siyasetmedar, hunemend û kadroyên me giş li wê derê bûn. Em li wir diçûn, her li ku derê teqez em rastî kesên ku ji Bakur hatine dihatin. Kurdên ku ji her deverê hatibûn Hewlerê dixwestin kelecana birayên xwe parve bikin û hîs bikin û bûn şahidê vê biryara dîrokî. Dîsa me li wir her kî dîdît gişan bi taybet jî ciwanan digotin "an serxwebûn an neman, êdi bes e. Problema me bi birayê me yên Ereb re tune ye, bi rejima Erebê re problema me heye." Wekî din, gelê me di mejiyê xwe de meseleya serkeftina referandûmê qedandibû. Ew herî zêde bi xwe bawer bûn ku wê herî kêm ji %90î erê derkeve. Her wisa, kek Mesût û hemû partiyên me yên başûr, gelê me bi birçîbûn û bi tank û topan tehdît kirin. Gel li dijî wan zor û zextan, zexm sekinîn û me jî fêm kir ku gelên me yên Başur bi biryar in û esas biryara wan e. Kek Mesût gotibû biryara serxwebûnê ne ya partiyan e û ya gelê me ye. Di vê noxtê de me herî zêde fêm kir ku bi rastî, biryar ya gelê Kurdistanê ye. Ligel vê, kadroyên me yên siyasî jî piştgirî dan biryara gelê xwe û li hember zor û zextan baş sekinîn. "

## "Bi referandûmê meseleya Kerkûk û Şengalê safî bû"

Sinan Çiftyürek di derbarê encamên referandûmê de jî wiha axivî, "Bi rastî Kerkûkê dîrok nivisî. Kerkûkê meseleya sed salî xilas kir. Ereban digotin Kerkûk bajarê Ereban e, Tirkmenan digotin Kerkûk ya Tirkmenan e. Lê, gelê Kerkûkê çi Kurd, çi Ereb, çi Tirkmen û çi Suryaniyan gotin Kerkuk ya me hemûyan e lê axa Kurdistanê ye. Şengal jî wisa bû, Şengal meseleya Kurdan a hundir bû û nîqaşeke mezin bû li ber Kurdan. Siyaseta başûr ev mesele gelekî baş îdare kir. Lê di referandûmê de Şengalê ji sedî 90 got erê. Bi vê encamê re meseleya Şengalê jî bi riya demokrasî û aştiyê safi bû û mala wan ava. Yên ku li Başûr digotin erê wê bi serkevin jî hebûn û yên ku dudilî bûn û digotin na wê winda bikin ji hebûn. Wekî din, ev qeneta min e Kek Mesût careke din peyam da û got 'ez jî û ji malbata min tu kes jî di hilbijartinên serokatiyê de nabin namzet.' Ev peyameke dirokî û helwesteke dirokî ye. Dîsa qeneta min e ku parêzgerê Kerkûkê Necmettîn Kerim eger sibê bibe namzedê seroktiya Başûr bila kes şaş nebe. Wî û gelê Kerkûkê helwesteke baş nişan dan."



Karîkator ---------- Dijwar Ibrahim

# Karsaz li ser ambargoyê çi difikirin?

NUJIN ÖNEN

Pêkanîna referandûma serxwebûna Herêma Kurdistanê li Rojhilata Navîn hê jî di rojeva germ de ye. Beriya referandûmê Hikûmeta Tirkiyeyê daxwaza betalkirina referandûmê ji Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî kiribû. Piştî ku referandûm pêk hat jî Serokkomarê Tirkiyeyê Recep Tayip Erdoğan bertekên tund nîşan dan û got: "Dema em dest bi mueyîdeyan bikin hûnê birçî bimînin. Em yek mislixekî bigirin hûn têk çûne. Dema tirên me neçin Herêmê hûnê ji nêza bimirin." Piştî van daxûyaniyan Serokwezîr Nêçîrvan Barzanî jî gotibû: "Girtina deriyên sînorî ne di berjewendiyên tu kesî de ye. Wê tenê gelê her du aliyan jê zirarê bibîne." Rageşiya di nava her du welatan de didome. Em weke Heftenameya Basê ligel karsazên Diyarbekirê egera girtina deriyên sînorî wê çi tesîrê li aboriya herêmê bike axivîn.

**"Hêvîdar im hikûmet bi aqilê selîm tevbigere"**

Serokê Lijneya Şêwirmendiyê ya Federasyona Komeleyên Karsaz û Pîşesaziyê ya Rojhilat û Başûrê Rojhilat, Şah İsmail Bedirhanoğlu dibêje divê herkes ji encama referandûmê re rêzdar be û wiha didomîne: " Beriya pêkanîna referandûmê, me him bi saziyên sivîl re him jî bi kesayetên rûsipî re daxûyanî dan û him jî bi ragihandineke fermî me piştgiriya referandûmê kir û me diyar kiribû ku pêkanîna referandûmê li herêmê wê bibe sedema aştî, ewlehî û îstîqrarê. Herwiha me ji hemû aliyan daxwaza nasîna encama referandûmê jî kiribû. Dema em li encama referandûmê dinêrin ji sedî 92 hemwelatiyên Herêma Kurdistanê dengê 'belê' bikaranîne. Vê encamê derxist holê ku îradeya Kurdên Îraqê bi awayekî zelal veqetandina ji Îraqê ye. Ez bi rêya we bangî herkesî dikim ku ji encama referandûmê re rêzdar bin."

Bedirhanoğlu helwesta Tirkiyeyê jî dinirxîne û axaftina xwe wiha didomîne: "Eger em werin ser helwesta Tirkiyeyê jî em ê bibînin ku heta beriya hefteyekî jî helwesta Tirkiyeyê ne tund bû. Lê belê di vê heftiya dawî de gelek tund bû. Li hemberderketina referandûmê ne di berjewendiyên Tirkiyeyê de ye, ne jî di yên herêmê û ne jî di yên Herêma Kurdistanê de ye. Ji ber vê yekê jî em tênagêhin bê çima Tirkiye helwesta xwe wisa tund kir. Em hêvî dikin ku berpirsyarên Hikûmeta Tirkiyeyê demildest bi aqilê selîm tevbigerin. Dema em li van salên dawî dinêrin di hemû qrîzên Tirkiyeyê de, li hember cîhanê tenê Herêma Kurdistanê ligel Tirkiyeyê bi dostanî sekinîbû. Heta Hikûmeta Herêma Kurdistanê ji bo Tirkiyeyê gelek dost û şirîkên xwe jî danîbûn hember xwe û bi Tirkiyeyê re rêkeftinên neft û bazirganiyê îmze kiribûn. Ev helwesta Tirkiyeyê me xemgîn dike, em hêvîdar in ku ev siyaset ji bo raya giştî ya navxweyî be."

Şah İsmail Bedirhanoğlu di derbarê girtina deriyên sînorî yê Birahîm Xelîl de jî axivî û wiha got: "Girtina sînor, rawestandina bazirganiyê û rageşî wê ziyaneke mezin bide Tirkiyeyê. Hecîma tîcareta Tirkiyeyê bi Herêma Kurdistanê re nêzîkî 9 milyar dolaran e. Li bajarên Kurdan ên weke Mêrdîn, Diyarbekir, Batman, Riha û Şirnexê jî nêzîkî 3 milyar dolar bazirganî tê kirin bi Herêma Kurdistanê re. Aboriya bajarên Kurdan ji xwe girêdayî werîsekî ye, ji ber sedemên derbasbûyî yên weke xendek, şer û pevçûnan aboriya herêmê têk çûye. Eger rageşî jî bê kirin wê aboriya Bakurê Kurdistanê têk biçe û kesek nikare dahatûya xwe bike bin garantiyê. Li gel van babetan jî em rageşî û bertekên tund weke bê hişî dibînin û dinirxînin. Di vê derbarê de em hikûmetê demildest vedixwînin aqilê selîmiyê û em bi hêvî ne ku wê bi aqilê selîm jî tevbigerin."

> "Girtina sînor, rawestandina bazirganiyê û rageşî wê ziyaneke mezin bide Tirkiyeyê. Hecîma tîcareta Tirkiyeyê bi Herêma Kurdistanê re nêzîkî 9 milyar dolaran e. Li bajarên Kurdan ên wek Mêrdîn, Diyarbekir, Batman, Riha û Şirnexê jî nêzîkî 3 milyar dolar bazirganî tê kirin bi Herêma Kurdistanê re."

**"Deriyê herî karîger ê Tirkiyeyê ye"**

Serokê Navenda Lêkolînên Civakî ya Dîcleyê(DİTAM) û karsazekî ji Diyarbekirê Mehmet Kaya jî di derbarê rageşî û mueyîdeyan de ji Basê re axivî û wiha got: " Îhtîmaleke kêm didim van mueyîdeyan. Di demên wiha de Tirkiye bi giştî ji bo raya giştî ya navxweyî daxûyaniyên wiha dide û niha jî ez wisa texmîn dikim ku ji bo vê yekê wisa diaxivin. Ez wisa dinirxînim ku ji ber ku bi Partiya Nijadperestên Tirkiyeyê re şirîkatiyê dike û ji bo dengên wê partiyê dijayetiya Kurdan dike, vegotineke siyasî diafirîne. Lê eger hûn pirsa mueyîdeyeke wiha ji min bikin wê Tirkiye zaftir zirarê bibîne ji wê. Ji ber ku Herêma Kurdistanê deriyê Tirkiyeyê ye ji bo derbasî Rojhilata Navîn bibe."

Kaya girîngiya deriyê sînorî yê Birahîm Xelîlî tînê zimên û axaftina xwe wiha didomîne: " Deriyê Sînorî yê Xabûrê ne tenê di navbera Tirkiye û Herêma Kurdistanê de ye. Deriyê derbasbûna Tirkiyeyê ye ji bo ku derbasî Rojhilata Navîn bibe. Niha Tirkiye têkiliyên xwe ligel Rojava aniye wê astê ku dê ji hev qut bibin. Di rewşeke wiha de deriyê xwe yê Rojhilata Navîn jî nagire û xwe naxe nav vê kêşeyê. Ev yek dê întîhar be ji bo Tirkiyeyê. Li aliyê din jî têkiliyên Tirkiyeyê bi Herêma Kurdistanê re wisa baş in ku tîcareteke bê hempa tê kirin û aliyê herî destkeftî jî Tirkiye ye di vê bazirganiyê de. Kaya di derbarê 'girtina deriyên sînorî dê çi tesîrê li aboriya bajarên Kurdan bike' de jî wiha axivî: "Tirkiye partnerê xwe yê di tîcaretê de piştî Almanyayê di rêjeya duyem de winda nake. Ev yek wê ji bo Tirkiyeyê pirsgirêkeke mezin derxîne holê. Li aliyê din jî wê tesîreke neyênî li bajarên Kurdan jî bike ku jixwe îxracata herêmê gelekî kêm e û ev jî ji sedî 70–80 diçe Herêma Kurdistanê û Îraqê. Tîcareta sînor ji bo herêmê dahatûyeke baş e. Karê kargoyê ji bo bajarên Kurdan îstihdameke baş e. Tirkiye xwe naxe wê pozîsyonê ku di carekê de van tevan ji holê rake. Eger bi rêya van tiştên min jimartî di fikra cizakirinê de be wê zaftir Tirkiye û ew kesên li Tirkiyeyê dijîn bên cizakirin. Ev ne rêyek e. Gelek deriyên sînorî yên Herêma Kurdistanê bi Îran û Sûriyeyê re jî hene. Her çiqas bi Îranê re tîcareta xwe berfireh nekiribe jî, herêmeke ji bo tîcaretê potansiyela wê heye ye. Heta ji Çînê jî mirov dikarin bên û kelûpelên xwe bifiroşin. Ji ber vê yekê jî dema Tirkiye mueyîdeyan bilêv dike li vê derê hin hesaban bi kêmasî dike."


## "Ji 95 milyar dolarî 5.5 milyar dolar li gel Herêma Kurdistanê hatiye kirin"

Serokê Komeleya Pîşesazî û Karsazên Diyarbekirê Burç Baysal dibêje, gel biryara diyarkirina çarenûsa xwe dide. Tiştê din, bi min, divê welatên ku rêkeftina mafên mirovan îmze kirine, welatên ku parastina mafê mirovan dikin divê ji raya gelê Herêma Kurdistanê re rêzdar bin û wiha didomîne: "Di mijara ragêşiya aborî de li Tirkiyeyê ew kesên ku bi bazirganiyê re mijûl in baş dizanin ku îxracata mezin a Tirkiyeyê qediyaye. Îro dema em li îxracata Tirkiyeyê ya 8 mehên dawî dinêrin ji 95 milyar dolarî 5.5 milyar dolar li gel Herêma Kurdistanê hatiye kirin. Niha li gor van rêjeyan wê li benda zimanekî dîplomatîktir, aqlî selîmtir in. Ji ber ku îxracat li holê ye. Karîgeriya Herêma Kurdistanê û karê avakirinê bi rêya me Kurdên Tirkiyeyê dimeşe. Ji ber ku em li vir ne xwediyê herêmeke kaniya wê bê sînor e, di vir de jî Herêma Kurdistanê ji bo me bazareke pir girîng e. Hêvîdar im di vê derbarê de berpirsiyarên Hikûmeta Tirkiyeyê deriyê sînorî yê Xabûrê negirin û ambargo daneynin ser Herêma Kurdistanê. Eger ambargoyê deynin ser Herêma Kurdistanê ev yek wê ji bo me jî qet ne baş be."

Burç Baysal balê dikişîne ser westariya aborî û axaftina xwe wiha bidawî dike: "Di rewşa niha de westariya aborî li herêma me û bi taybetî jî li welatê me heye. Em di van şertên ne baş de naxwazin rastî handîkapên wisa werin. Herî dawî ez dizanim ku ew aqilê selîm ê her du welatan heye ku bi diyalog û dîplomasiyê van kêşeyan çareser bikin. Biryara Hikûmeta Navendî ya Îraqê ku daxwaza radestkirina balafirxaneyan dike û di encamê de jî geşta firokeyan sekinandiye jî di vê mijara aborî de ne rast e û wê tesîreke neyînî li herêmê bike. Hêvîdar im ku ev yek were sererastkirin."

# Referandûmê yekîtiya netewî derxist holê






**BILAL ADLIĞ**



Referandûma serxwebûna Herêma Kurdistanê li seranserê cîhanê dilê her Kurdekî geş kir û kir ku Kurd derkevin qadan kêf û şahiyan bikin. Bi taybetî jî li Rojhilat û Rojavayê Kurdistanê bi hezaran Kurd daketin qadan û bi dilekî germ pêşwaziya encama referandûma serxwebûna Herêma Kurdistanê kirin. Di nav perçeyên Kurdistanê de ya herî bê deng û kêfxweşiya xwe bi dizî dijiya Bakurê welêt bû. Li seranserê Tirkiye û Bakur niha rewşa awarte di meriyetê de ye û ji ber wê yekê jî Kurdên Bakur nekarîn kêf û dilxweşiya xwe li qadan nîşan bidin. Lêbelê bi hezaran Kurdên Bakur berê xwe dan Herêma Kurdistanê û pêşwaziya referandûma serxwebûna Herêma Kurdistanê kirin. Li aliyê din jî li ser torên medyaya civakî û li mal û saziyên xwe Kurdên Bakur pêşwazî li referandûmê kirin. Em weke Heftenameya Basê bi rewşenbîr, rojnameger û ronakbîrên Bakur re li ser tesîra referandûma serwebûna Herêma Kurdistanê ya li ser Bakûr û pêşwazîkirina xelkê axivîn.

**“Referandûmê Kurd kirin yekdeng”**

Siyasetmedar û Parlementerê BDPê yê Berê Nezîr Karabaş di derbarê tesîra referandûma Herêma Kurdistanê ya li ser Bakur wiha axivî: “Referandûm ji bo her Kurdê ku hay ji xwe û cîhanê heye bû sedema kêfxweşî, moral û motîvasyoneke xurt.” Karabaş bersiva pirsa gelo çima Kurdên Bakur ne li qadan lê li mal û saziyên xwe şahiya encama referandûmê kirin jî wiha dide: “Em di rewşeke wiha de derbas dibin ku Kurdên Bakur di salên 90î de di heman rewşê de bûn. Ji ber rewşa awarte ku kesek nikare li qadan çalakiyan bike û kêfxweşiya xwe bîne zimên. Li Bedlîsê jî ew kesê ku hay ji rojev û rewşa cîhanê bi taybetî jî ji rewşa Herêma Kurdistanê hayedar bû bi coşeke mezin pêşwaziya referandûm û encama referandûmê kir. Ez di wê baweriyê de me ku eger em niha ne di rewşa awarte da bûna wê Kurdên Bakur jî li qadan pêşwazî referandûmê bikirana. Referandûmê Kurd anîn cem hev. Referandûmê derxist holê ku Kurd di çi fikrê de bin jî ji bo destkeftiyên netewî bi yekhelwestê tevdigerin û hev digrin.”

> “Referandûmê li ser her Kurdekî bandoreke erênî hişt û ji bo her Kurdekî bû sedema moral û motîvasyoneke xurt. Referandûmê derxist holê ku Kurd di çi fikrê de bin jî ji bo destkeftiyên netewî bi yekhelwestê tevdigerin û hev digirin.”

> “Kurdên Bakur kêlî bi kêlî xebat û encama referandûmê dişopandin û bi kelecaneke mezin pêşwazî li encamê dikirin. Ez dikarim bibêjim ku Kurdên Bakurê welêt tu carî wisa bi yekdengî û yek helwestî tevnegeriyabûn.”

**“Hest û mejiyê netewî xurt kir”**

Aktivîst û Lêkolînerê Kurd Fehmî Atmaca jî li ser vê mijarê wiha axivî: “Xala girîntir ew e ku referandûm bû sedema vejîna hest û fikra netewî. Heta ku Kurdên baweriya wan bi wan û netewa wan tune bû jî bi saya referandûmê hişyar bûn û ketên fikra dewletbûn û azadiyê. Ew Kurdên ku li hember damezirandin û azadkirina Herêma Kurdistanê bûn, piştî referandûm û encama referandûmê ketin nava xelîl û celîlan. Li Agirî jî gelê Kurd bi hişmendiyeke netewî li ber televizyon û medyaya civakî referandûm dişopandin. Bi rastî jî referandûm û Herêma Kurdistanê nîşanî hemû cîhanê da ku Kurd dikarin bi rêya demokrasiyê xwe birêve bibin.”

Atmaca di berdewamiya axaftina xwe de dibêje, “Bi taybetî jî rola Serokê Herêma Kurdistanê di vê proseyê de girîng û erênî bû. Mesûd Barzanî bi şêweyeke demokratîk û ji xwe bawer ev prose meşand ku ev yek ji bo hemû Kurdan cihê serfiraziyê ye. Ji ber tirsa dewleta Tirkiyeyê û rewşa awarte gelê Kurd nikaribû derketa qadan lê têgihiştin ku dewletbûn ji bo Kurdan êdî ferz e. Referandûma serxwebûna Herêma Kurdistanê nîşanî me da ku eger siyasetmedar rola xwe di cih de bilîzin wê Kurd bibin yek.”

**“Kurd dikarin bêyî partiyan berjewendiyên xwe biparêzin”**

Rojnamegerê Kurd Ferat Mehmetoğlu di derbarê referandûm û tesîra wê ya li ser Diyarbekirê de wiha got: “Di sedsala bîst û yekan da êdî her Kurd dixwaze xwediyê mafên xwe û axa xwe be. Ji ber wê çavên Bakuriyan li referandûma Başûr bûn. Yanê Kurdên Bakur pirtir daxwaza serxwebûna Kurdistanê dikirin. Dema ez li Başûr bûm û min lêkolîna referandûmê dikir gelek kesan pirsa Bakuriyan dikir. Bi rastî têkiliyên çar perçeyan xurtir bûye û êdî Kurd dikarin beriya partiyan berjewendiyên netewî bifikirin. Ji ber wê em jî serbilind in û di hêviyên mezin de ne ku Kurd êdî dikarin bigihîjin mafên xwe yên windayî. Di van bûyerên dawiyê de Kurdan dît ku gotinên bavan dubare dibin. Yanî dijminê bavan nabe dostê lawan. Derket holê ku desthilata Tirkiyê tenê ji bo berjewendiyên xwe, xwe weke dostê Kurdan nîşan dida. Bi rastî êdî Kurd jî Kurdên berê nînin û dizanin çi zordestî heye li serê Kurdan. Ji ber wê him li Başûr him li Rojava gavên baş tên avêtin ji bo Kurd û Kurdistanê. Ji bo Kurdan ê herî pêwist ew e ku yekîtî û tifaqa xwe pêk bînin. Rast e peymana Lozan 1923 ye lê mixabin biryara peymana nû di vê salê da tê dayîn. Yanî eger Kurd di dawiya 2017an de xwediyê axa xwe bin wê demê di peymana nû de jî wê bi heman awayî be. Di vê babetê de rola herî girîng di destê birêz Barzanî de ye. Gelê Kurd piştevaniya referandûm û dewletbûyînê kir, niha pêwist e ku birêz Barzanî jî rêveberiya yekitiyê bike û her hêzên Kurdan di nav xwe de girêdayê hev bin. Ji ber ku dijminê Kurdan bûne yek û naxwazin Kurd di sedsala nû de bibin xwediyê mafên xwe.”

## “Kurdan berê xwe dan Başûr”

Siyasetmedarê Kurd Ezîz Ozdemir jî li ser vê meseleye wiha axivî: “Ez dikarim bibêjim, xebata amadehiya Înîsiyatîfa Piştgiriya Referandûma Serxwebûnê tesîreke erênî li bajarên Bakurê Kurdistanê kiriye. Roj bi roj saet bi saet çav, hiş û dilê wan bi kelecana herî bilind ligel Herêma Kurdistanê bû.” Ezîz Özdemir di berdewamiya axaftina xwe de dibêje: “Ji bo Batmanê dikarim bibêjim ku yên ku dikaribûn biçin Herêma Kurdistanê û li wir referandûma serxwebûna Herêma Kurdistanê bişopînin derketin rê û berê xwe dan herêmê. Ên ku derfetên çûyînê nedîtin jî li mal û saziyên xwe pêşwazî li referandûm û encama referandûmê kirin. Her çiqas ji ber rewşa awarte û dijayetiya hikûmeta Tirkiyeyê li hember referandûma serxwebûna Herêma Kurdistanê nehiştibe gelê Bakur derkeve kolanan û kêfxweşiya xwe nîşan bide jî Kurdan di her derfetî de dîlanên xwe girtin. Ev gef û dijayetiya Tirkiyeyê li Bakurê welêt bû sedem ku Kurd destê hev bigirin û bi yekdengî piştgiriya birayê xwe yên Herêma Kurdistanê bikin. Gav bi gav xebat û encama referandûmê dişopandin û bi kelecaneke mezin pêşwazî li encamê dikirin. Ez dikarim bibêjim ku Kurdên Bakurê welêt tu carî wisa bi yekdengî û yek helwestî tevnegeriyabûn.”

# Wekîlê Mîrê Êzidiyan daxwazên Êzidiyan vegotin

**LEZGÎN ŞAN**



Wekîlê Mîrê Êzidiyan ji Basê re daxwazên Êzidiyan ku ji bo Kurdistana dahatû projeyên olî, îdarî, siyasî û bi giştî daxwazên xwe pêşkêşî Hikûmeta Herêma Kuridistanê kiribûn, vegotin.

Wekîlê Mîrê Êzidiyan Tehsîn Beg, Hazim Mîr ji Basê re axivî û wiha got: “Daxwazên olî, serastkirina yasayên olî, razîbûna ji van yasayan tenê bi parastina van yasayan pêkan e. Ev yasa bi karên takekesî û şûnwarên dîrokî re girêdayî ne. Ev proje bi taybetî jî ji bo ku mafên Êzidiyan û pêkhateyên din bên garantîkirin hatine pêşkeşkirin. Dîsa parastina xweseriya Êzidiyan, avakirina Konseya Bilind a Êzidiyan, avakirina saziyên bi Êzidiyan ve eleqeder, avakirina goran û baştirkirina yên heyî û baştirkirina Perestgeha Laleşê. Ji vegûhestina demografîk dûr, dirûstkirina erdnîgariyê. Parastina nasnameya Kurdistanî ya Êzidiyan û qedexekirina vegûhestina demografî û parastina van herêmên dîrokî bûn.”

**“Divê Êzidî di her dezgehê de cihê xwe bigirin”**

Wekîlê Mîrê Êzidiyan axaftina xwe didomîne: “ Daxwazên îdarî jî divê di parlemento, mijarên navxweyî û dadgehan de cihê wan hebe. Bi taybetî jî di meqamên sê serokatiyê de, saziyên xweser û Meclîsa Şûra ya Dewletê de cihê wan hebe. Dîsa daxwaza birêvebirina Êzidiyan ji aliyê Êzidiyan ve, avakirina herêman û parêzgehkirina Şingalê û ji aliyê Şingalê ve birêvebirin careke din hatine dubare kirin.”

Wekîlê Mîrê Êzidiyan balê dikişîne ser avakirina herêmên îdarî bo Êzidiyan li deşta Neynowa û Başîkê û wiha didomîne: “Li Başik û Deşta Neynowayê ji dema DAIŞê êrîşê Şingalê kiriye û vir ve îdareyên herêmî tên avakirin. Ev yek daxwaza gelê me ye ku dahatûya wan were mîsogerkirin û parastina navnetewî bidest bixe. Em dixwazin ev tev di destûra bingehîn a Kurdistanê de cih bigirin. Dîsa daxwaza hêzeke leşkerî ku ji Êzidiyan pêk tê da ku bikaribin xwe biparêzin heye. Divê ev jî li gor erdnîgarî û xwezaya wan herêman bê kirin. Di asayîş û polîsên ku ewlekariya navxweyî pêk tîne, artêş, heyetên dîplomatîk, nûnerên derve de beşdariya Êzidiyan heye.”

**“Divê reseniya Êzidiyan hebe”**

Mîrê Êzidiyan di derbarê daxwazên siyasî de jî wiha axivî: “Êzidî di hemû deman de di daxwaza avakirina dewleteke sivîl û qanûnî de bi israr bûne. Dema qala nasnameya olî, yasayên olî tê kirin ev nayê wê wateyê ku divê olên din bên piştguh kirin. Divê reseniya Êzidiyan hebe, mafên siyasî û îdarî jî divê weke pêkhateyên din bên parastin. Dîsa oleke duyemîn divê hebe û di avakarina dewleta Kurdistanê de, di komîsyonên tên avakirin de divê Êzidî hebin. Divê nûnerên Êzidiyan di komîsyona nivîsandina destûra bingehîn û yên din de hebin.”

**“Daxwazeke me jî rizgarkirina Êzidiyên di destê DAIŞê de ne”**

Wekîlê Mîrê Êzidiyan ji bo daxwazên wan ên bi giştî jî wiha diaxive: “Em daxwazê ji Hikûmeta Kurdistanê dikin ku Êzidiyên di destê terorîstên DAIŞê de ne werin azadkirin û Êzidiyên ji aliyê terorîstan ve hatine şehîtkirin tezmînatên madî û manevî bê dayîn û dayîna hemû mafên şehîdiyê ji bo wan jî bê dayîn. Dîsa em daxwazê dikin ku ji bo wan kesên ku DAIŞê zirar daye wan mûçeyek bê veqetandin, ji bo vegera ser ax û malên xwe yasa bê derxistin, ji bo vegerin hemû mafên wan bikevin bin garantiyê, ew kesên ji aliyê dewleta dagirker a Îraqê ve ji cih û warên xwe hatine derxistin, derxistina yasayeke nû jî di nav daxwazên me de hene.”

## “Êzidî dixwazin balê bikişînin ser jenosîdan”

Hazim Mîr dibêje: “ Êzidî dixwazin balê bikişînin ser jenosîdan. Jenosîda Şingalê, ya Kurdên Feylî û Jenosîda Barzaniyan, Enfala 1988an di destûra bingehîn de cih bigirin. Divê li saziyên navnetewî jî xebatên van bên kirin û biryar bên derxistin. Dîsa di Kurdistana dahatûyê de divê ji bo hemû pêkhate û olan komîsyonek bê avakirin û kontrola mafên wan bê kirin. Û endam jî divê li gor hejmara her pêkhateyî bê diyarkirin. Berpirsiyariya vê komîsyonê jî beriya yasa ji parlementoyê derkevin şêwermendiyê ji parlementeran re bikin.”




**MURAD CIWAN**

**Rapirsiyê çi encam dan?**



Tevî hemû rêgirî, fişar û tehdîdên deverî û navdewletî, encama rapirsiya 25ê îlonê bû serkeftineka mezin. Fişarên li ser serok û berpirsên Kurdistanê gihaştin heda nemeşrûiyetê û neînsaniyetê. Teşebusên darbeyan li hember berpirsên bajar û deverên hessas bûn. Bi rexmê van dijminantiyên req, bes pêkhatina rapirsiyê bi xwe li ser esasekî demokratîk û azad, di asta standardên navneteweyî de, bû serkeftineka mezin, ku ruşda kurdan îsbat kir. Civaka navneteweyî bêyî dudilî îtîrafê pê dike û ji ber ew qas fişarên narewa şerma xwe dide der.

Beşdarbûna kurdistaniyan bi rêjeyeka bilind û derketina dengê ‘belê’ bi %92.73, bû mîladek di dîroka Kurdistanê de, mohreka şer’iyetê ji bo xewn û xeyala sedsalan a dewleteka serbixwe ya kurdan. Rêjeya beşdarbûyiyan (%72) û ya erê-dayan (%92.73) ew qas bilind e ku, eger hemî ew dengên ku neçûn ser sindoqan, yên ku di sindoqan de betal bûn û yên nadayan; li ser hev kom bibin jî, rêjeya ‘erê’ dike %62. Ev bersiva her awe dijmin û dilnexwazan e, dengê hemuyan hatiye birrîn û serxwebûna Kurdistanê bi ser prensîbên civaka navneteweyî yên mafên dewletbûnê de çespandiye. Nema kes an dezge bêyî ku wîjdanê xwe û prensîbên hiqûq û edaletê binpê bike, dikare li hemberî vê îradeyê raweste.

Destkeftineka mezin a vê rapirsiyê jî ew e ku li deverên bi yên madeya 140ê ya destûra Iraqê binavkirî, hem beşdarî hem jî rêjeya ‘erê’ ji asta navîn a seranserê Kurdistanê bilindtir e. Êdî cidiyeteka minaqeşeya kurdistanîbûna Kerkûkê û van deveran nema. Rapirsî hem ji dêlva xwe ve hem jî ya madeya 140ê ve cîbicî bû. Armanca wê ew bû ku nasnameya van deveran tesbît bibe û îradeya wan derxe meydanê ka gelo ew dixwazin bi Bexdayê re bimînin yan bigihên Hewlêrê. Niha, bersiva van herdu pirsan jî hat dayin.

Ereb, tirkman, asûrî-suryanî û kildanî; hemû pêkhateyên etnîkî, dînî û mezhebi yên Kurdistanê bi bawerî û dilxwazî aktif beşdarî rapirsiyê bûn û bi rêjeya bilind a erêkirinê îradeya xwe ya pêkvejiyana li gel hev a li Kurdistanê, li ser bingehê mafên wek hev, azadî û aştiyê diyar kirin. Serkeftinek jî ev bû. Ev biryar derfeteka hêja ya dîtina asoyekî berfireh li berhem û pêkhateyan vedike. Divê hemû kurdistanî, berî hemûyan jî kurd, baş tê bigihên ku ew pêkhate her yek dewlemendiyeka mezin e ji bo yên din. Avakirina bihevrejiyana li ser esasê mafên wekhev, azadî û aşîtiyê nikare li benda tu peymaneka li gel Bexdayê, an rakirina filan yan bêvan rêgiriyê bimîne. Divê piştî hilbijartinên parlamentoyê derhal têkeve rojevê û bi destûrekê (eger qet nebe yeka muweqet) sîstema federaliyê qebûl bibe, dest bi rêxweşkirina perwerde û têgihîştina hevnaskirinê, cudatiyên hev qebûlkirinê û xweşbîniya li hemberî hev bibe. Ji bo pêkhate tama erêkirina serxwebûna Kurdistanê rojekê zûtir his bikin, biçêjin çi lazim e bê kirin.

Lê rapirsî gelek girîng û fînala rabuhuriyê be jî, ew gava pêşîn a qonaxa nuh e. Ji fişaran derket ku ev qonax ê gelek dijwar be, ne diyar e çend bikêşe. Dikare şert lêhatî bin di hundurê salekê-dusalan de bigihê fînalê û dikare bi dehan sal jî bajo, her çendî avêtina gavên yek alî di destê gelê Kurdistanê bi xwe de ye. Em jibîr nekin, îsraîliyan tevî piştgiriya hemî yahûdiyên cîhanê ev 80 sal in avabûna dewleta xwe temam nekiriye, pirsgirêkên wê li gel ereban çareser nebune, li gel filistîniyan li ser esasekî adil li hev nehatine. Eger qonaxa avabûna Îsraîlê ew qas bikêşe, gelo paşeroja rêwîtiya meşa serxwebûnê ya kurdistaniyan ê çi be?!

Iraqiyan ji roja ku melikê xwe kuşt heta niha bi şer û darbeyên li pey hev ên li hemberî hev, bi şerê deh salan ê li gel gelê kurd, yê 8 salan ê li gel Îranê, yê Kuwêtê, hilweşandina rejima Saddam û şerê navxwe yê sune û şîeyan, tofana DAIŞê û niha amadekariyên şerê li gel Kurdistanê ev 60 sal in hê jî fahm nekirine ku pirsgirêkên wan bi şer çareser nabin, ev welatê dewlemend wêran dibe, eger li hev rûnên, hev qebûl bikin û biryara bihevre jiyanê bidin ê dewlemendî, aştî û azadiyê bijîn, bipêşkevin. Eger bi xêra hinekan ew ji hev cuda nebin belkî hê 60 salên din jî bikêşe û ew bîra aştiyê nebin.

Îşê kurdan zor e, mixabin ku nikarin li hêviya peydabûna aqlê selîm ê Bexdayê bimînin. Divê ew bi xwe her destpêşxir bin û riyên xwe rizgarkirina ji vê ceheneme bibînin.

Rêjeya kêm a dengderên Silêmaniyê û Helebçeyê derxist ku pirsgirêkên nav mala kurdan jî di wê astê de ne ku di derfeteka ew qas girîng a tarîxî ya neteweyî de jî dikarin rolê bilîzin. Ev birîneka kûr a li ber hemû aliyên siyasî yên kurdan e.

Fişara berî û piştî rapirsiyê durûtiyek be jî herwiha nîşana têramadenebûna kurdan e. Wan tesbîtên xwe têr rast û deqîq nekiribûn. Baş bû ku ev rûyê rasteqînî niha derket ne piştî roja îlankirina serxwebûnê…

Ji bextê me re, derket ku kes ne li alî kurdan be jî Xwedê li gel wan bû. Çimkî hin tesadufên ‘Îlahî’ jî bext da kurdan. Em teşebusa derbeyeka bi destên qirêj a cîranan ya li hember Kerkûkê bînin bîra xwe, eger Rêbwar Talebanî yê ji Yekgirtuya Îslamî bi wekalet ne serokê Encumena Kerkûkê buya û yê eslî li ser kar buya belkî niha Kerkûk li derveyî referandumê mabû.

Serkeftinên rapirsiyê bi coşeka mezin tên pîroz kirin. Mafê kurdan e, ew têhniyên bi sedan salan ên serxwebûnê ne. Lê ji îro ve, ji wê girîngtir, lazim e kurd rûnên lê binêrin di rêwîtiya nuh de hêza wan, kilûkêmasiyên wan çi ne, çareser bikin. Rojên pêş dijwartir in. Divê bi amadeyiyeka tam rêkûpêk û bi hesabekî dûrûdirêj derkevin vê rêwîtiya nuh a pîroz: RÊWÎTIYA GIHÎŞTINA SERXWEBÛNÊ.

Luqman Ehmed:

# Xewn û xeyal bi hunerê derdikevin holê

**ESAT KINIŞ**



Çand di formên derbirîna mirovan de bêguman roleke gelek girîng dilîze. Lewra çand, bo civatekê di heman demê de nasnameyek e jî. Ev yek gelek caran di pêwendiya çand û hunerê de xwe dide nîşandan. Huner bi hezar salan e di diyarkirina fikr û ramanên mirovatiyê de cihekî wê yê binirx heye.

Xewn û xeyal, fikr, êş, şanazî, serfirazî û gelek hestên mirovî bi saya hunerê derdikevin holê û bandora wan bi sed salan jî devam dike. Hunermend bi firça xwe, awaz an jî peykerên xwe, çavên temaşevan dibe nava çîroka gelekî. Her wiha bankirina, nasandina çandekê jî.

Hunermendê şêwekar Luqman Ehmed jî, yek ji wan kesan e ku bi hunera xwe tekîliya di navbera çand, mirov û hunerê de radixe ber çavan. Ew, li Washingtonê derd û êşên gelê xwe bi reng û tabloyan nîşan dide.

Her çiqas Luqman, ji welatê xwe dûr be jî mirov gava li wêneyên wî dinêre diyar e ku navbera wî û gelê wî qet qut nebûye.

Wêneyên wî, dengê Kurdan ê ku hatiye birîn bi saya hunerê dide sehkirin. Ew, di wêneyên xwe de qedera Kurdan a her çar parçeyî bi awayekî serkeftî tîne ziman. Luqman dibêje armanc ev e ku; hunera Kurdî ya ku bi jiyana wî re dîl bûye, dîsa û ji nû ve vejîne û azad bike.

Em bi Luqman Ehmed re li ser jiyan û hunera şêwekariya wî axivîn. Wî ji jiyan û hunera xwe beşek ji me re vegot.

**Hûn û şêwekarî cara yekem kengî û çawa gêhiştin hev?**

Hê di zarokiya xwe de, ez hezkiriyê hunerê bûm û mamosteyên min pir palpiştî didan min ku behreya min a hunerî baş bibe û min wisa berdewam kir. Ji wan mamosteyan nemaze jî keda Lîdiya Kirş û Nebîl Dolmayê li ser min gelek e.

Ez neçûm tu peymangeh an jî dibistanên hunerî, bi sere xwe, min xwe bi pêş xist. Bi rikberiyeke mezin ji aliyê malbatê ve, ku hez nedikirin ez karê hunerî bikim, lê min bi biryar û serhişkî berdewam kir... Wisa di dawiyê de tevan ez qebûl kirim û rêz li hunera min girtin.

**Weneyên we li gor kîjan teknîkê ne?**

Rastî ez bi serbestî danûstendinê bi hunera xwe re dikim, hewl didim ku nekevim xelekan û bi sînor nebim lê ji ber ku ez Kurd im û mijar û kaniya min a sereke mijarên Kurdî ne, ez piranî nêzîkî şêwazê Derbirînî dibim, ji ber ku ew bêhtir derfetê dide min ku ez xwe şîrove bikim.

**Hemû hunermend ji bo hunera xwe ji kaniyekê sûdê werdigirin. Gelo kaniya hunera we çi ye, an jî hûn hunera xwe bi çi dipêjin?**

Kaniya min a sereke çîroka gelê Kurd e. Bi xemgînî, kêf, trajedî û sawirên bejî min her car dîn dikin, ez pir ji stranên Kurdî yên destanî û dengbêjiyê hez dikim. Ew sermiyaneke pir hêja ye bo min, ez û hunera xwe deyndarê vî miletî ne. Çandeke dewlemend, sawireke bêhempa, bejî û tije hesret e. Wek berhemên navnetewî jî; xwendin, muzîk û sinema gelekî li ser min bi bandor e.

**Di berhemên we de cihê ku hûn lê hatine dinyayê û mezin bûne, wek zarokî, jiyan, êş, xweşî û hwd çiqas tê dîtin?**

Huner li ser hezkirinê tê avakirin, eger tu ji dest û çavên xwe heznekî û baweriya te bi te nebe, tu nikarî hunereke baş biafirînî, wisa ez bi hunera xwe re rast im û fermandariyê dixim deste wê, ew çîroka min dibêje ez jî tenê baweriyê didim wê û ew mîna hespê bejê serbest bazdan û livandinê dike.

Ez çîroka xwe dibêjim mîna beşekî ji çîroka miletê Kurd, her xwe û wê bi hev re girê didim.

Ma em dikarin bêjin di wêneyên we de Kurd û çanda Kurdistanî tê parastin?

Ji sedî sed ez bi wan ve girêdayî me lê di dawiyê de ew huner e, huner divê ku çîrokekê vebêje. Mark Şagal çîrokên Cihwan nîgar kir, Algirîko jî çîrokên Incêla Mesîh nîgar kirin, ta roja îro. Huner zimanê sawiran e, bi reng, xêz û şêwaz wan çîrokan tîne ziman.

Ez ji çanda Kurdî pir hez dikim û li ser kar dikim, heta ku xweşikbûn û payebûna wê bînim ber çavan.

**Hûn rewşa hunera Kurdî çawa dibînin, astengiyên li pêşiya hunera Kurdî çi ne?**

Hunermendên Kurd gelek zîrek û jêhatî ne, wan navekî mezin bi dû xwe xistine li cîhanê lê tekane neyîniya hunera Kurdî hê şêweya xwe nedîtiye ji ber nebûna deweleta Kurdî û ji ber nakokî û cudabûna nerînên siyasî û partîtiya Kurdî. Van sebeban ziyan gihandiye hunera Kurdî û bi nav nehatiye naskirin. Lê di heman demê de jî karên baş çê dibin û hunermendên Kurd bi hişyarî (ne siyasî) xwe didin naskirin û xebat dibe ku navend an pêşangehên giştî bên kirin bo hunermendan lê rê gelek dûr û dirêj e û karekî mezin jê re divê.

> Hunermendên Kurd gelek zîrek û jêhatî ne, wan navekî mezin bi dû xwe xistine li cîhanê lê tekane neyîniya hunera Kurdî hê şêweya xwe nedîtiye ji ber nebûna deweleta Kurdî û ji ber nakokî û cudabûna nerînên siyasî û partîtiya Kurdî. Van sebeban ziyan gihandiye hunera Kurdî û bi nav nehatiye naskirin.

## Luqman Ehmed kî ye?

Lukman Ahmad (Luqman Ehmed), li bajarokê Dirbêsiyê yê bi ser parêzgeha Hesekê ya Rojavayê Kurdistanê, sala 1972an ji dayîk bûye. Piştî 1981an tevî malbata xwe li Hesekê bicî dibe û piraniya jiyana wî li wir derbas dibe. Ehmed heta niha li welatên wek; Kurdistana Başûr, Sûriye, Libnan, Tirkiye, Swîsre û DYAyê beşdarî nêzî 45 pêşengehan bûye. Ji bilî hunermendiya xwe li dezgeha Radyoya Dengê Amerîka di beşa Kurdî de karê rojnamegeriyê jî birêve dibe.





Adem Özgür:

# Dara Mestê bo destpêkê girîng bû

**BERFO GILÎDAX**

## "Di van salên dawîn de Kurdên Anatoliyayê pir bi deng bûn"

Di van salên dawî de li ser Kurdên Anatoliyayê zêdetir xebatên wek belgefîlm tên çêkirin, her wisa nûçe û hevpeyvîn tên amadekirin. Li ser pirsa 'Bi ya we Kurdên Anatoliyayê bi xwe çiqas behsa çand û jiyana xwe dikin?' Özgür wisa bersivê dide, "Bi rastî van salên dawî Kurdên Anatoliyayê pir bi deng bûn. Rojnameger, sînemager, sîyasetmedar, dîroknas û lêkolîner zêdetir bala xwe didin Kurdên me. Kovara Bîrnebûnê ev derî vekir. Bîrnebûn bîst sal in ku vê dozê dide û çand, huner, dîrok û axaftina Kurdên Anatoliyayê diweşîne, tîne zimên. Îro di beşên Kurdî de, di nivîsên akademîk de, di pirtûkên dîrokî de, di belgefîlmên di derheqê Kurdan de qala Kurdên Anatoliyayê dikin. Kurdên Anatoliyayê jî van tiştan dişopînin, pê şa dibin û dîroka xwe meraq dikin. Di van salên dawîn de komelayan vedikin, xwe bi xwe xebatan dikin, panelan saz dikin, di civînan de meseleya Kurdên Anatoliyayê nîqaş dikin û bala xwe didin Kurdistanê jî..."




Kurd ji bilî welatên xwe ji ber gelek sedeman deverên din bi cî bûne. Yek jî wan deveran Anatoliya Navîn e (Enqere, Qonya, Kırşehir, Yozgat hwd.) Di derheqê Kurdên Anatoliyayê de ev çend salên dawî zêdetir an belgefîlm tên çêkirin an jî nûçe û hevpeyvîn tên amadekirin. Yek jî ji van xebatan belgefîlma Dara Mestê ye. Ev belgefîlm ji aliyê Kurdên Anatoliyayê ve hat amadekirin û belgefîlm behsa hebûn, çand û jiyana gundekî Kurdan a bi navê Celîkana Kuluya Qonyayê a Anatoliyayê dike. Her çiqas ev belgefîlm, bi tenê behsa gundekî bike jî di derbarê jiyana Kurdên din ên Anatoliyayê de jî hin tiştan bi me dide zanîn û belgefîlm 14 deqîqe ye. Derhêner û nivîskarê belgefîlmê rojnameger Adem Özgür di derheqê belgefîlma Dara Mestê de ji Heftenameya Basê re axivî.

**"Dara Mestê wek sembol tê qebûlkirin"**

Derhêner û nivîskarê belgefîlmê Adem Özgür bi xwe jî Kurdekî ji Kuluya Qonyayê û Özgür li ser pirsa me wiha behsa mane û sedema bijartina navê Dara Mestê dike, "Ligel Kurdên Anatoliyayê navên bi Kurdî yên taybet hene. Navê kevir û zinaran, navê gelî û nevalan, navê çiya û zozanan bi Kurdî ne. Em ji çiyayekî re dibêjin çiyayê Qerejdaxê, ji bilindiyekî re dibêjin Çalê Sor, Zinarê Gurru, Kaniya Hesê, Neqewa Birûskê hwd. Ev navê Dara Mestê jî ji vir tê. Dara Mestê li pêş gund e û kî dikeve gund cara ewil bala xwe dide vê darê û wek semblekê tê qebûlkirin. Me jî xwast ku navê belgefîlmê bi Kurdî û bi semblekê be."

**"Bo destpêkê Dara Mestê girîng bû"**

Belgefîlma Dara Mestê salek berê hat weşandin û Özgür li ser pirsa, 'we bi çi motîvasyonê dest bi xebata vê belgefîlmî kiribû?' wiha dibêje; "Ez ji bîst salîya xwe û vir ve li ser Kurdên Anatoliyayê lêkolînan dikim. Min di rojnameya BasNûçeyê de bi dehan nûçe li ser Kurdên Anatoliyayê amade kirine. Her wiha ev çend sal in nivîskarê kovara Bîrnebûnê me û heta salek berê jî rêveberekî komeleya Kurdên Anatoliyayê bûm. Ev hemû tecrübe gihêştin hev. Min fikrên xwe ji kek Hamo re got û wî jî qebûl kir. Me got çi dibe bila bibe emê li ser Kurdên me belgefîlmekî biçûk amade bikin, ji bo destpêkê ev girîng bû."

**"Amadekirina belgefîlmê ne hêsan bû"**

Özgür wiha qala zehmetiyên amadekirina belgefîlmê Dara Mestê dike, "Em ne sînameger in, loma jî wexta ku me dest bi belgefîlmê kir me got "em amator in, em ji vî karî baş fam nakin û emê karekî baş bikin." Bi telefonekê, bi kamereyeke biçûk û çend tiştên teknîkî em derketin vê rêyê. Ne sponsoreke me hebû, ne jî wê demê kesekî alikariya me kir. Tiştên wisa ji me re zehmet bûn. Carinan me nedikarî kamerayê kontrol bikin, carinan di dengan de kêmasî çêdibûn an jî piştî tomarkirinê me hin kêmasiyên xwe yên din didîtin. Wekî din, tirs li ser gel heye. Di rewşa awarte de kesekî nedixwast bersiva pirsên me bide. Ji kamerayê dûr diketin û pir kesan jî ji me re digotin dev ji vî karî berdin. Her çiqas belgefîlmekî çandî be jî ev tirsa polîtîk tesîreke mezin dabû ser gundiyên me û hê jî ev tirsa milet didome."

**Belgefîlmê elaqeyeke baş dît**

Dema ku meriv Dara Mestê temaşe dike, dibîne ku ji kal û pîr û heta zarok bi Kurdî xeber didin û dengkirina belgefîlmê jî bi Kurdî ye. Özgür li ser pirsa me ya 'Gelo piştî ku belgefîlm hat weşandin, him ji aliyê Kurdên Anatoliyayê him jî ji aliyê Kurdên din ve elaqeyeke çawa dît?' wiha diaxive, "Kurdên Anatoliyayê bi salan çand û hunera xwe ziman û baweriya xwe heta îro parastine. Emê çawa bi zimanekî din, bi zimanek biyanî vê xebatê bikin? Divê hemû xebat bi Kurdî bin. Armanca me ya yekem ev bû; çi dibe bila bibe ewê bi Kurdî be. Kurdên Anatoliyayê her çiqas pê de pê de ji zimanê xwe dûr ketibin jî hê li gundan Kurd bi zimanê xwe diaxivin. Loma jî belgefîlm di nav gundiyên me de, di nav Kurdên Anatoliyayê de elaqeyeke mezin dît. Ji me re peyamên pir xweş û jidil hatin. Em ji wan bersivan, ji peyaman, ji pîrozbahiyên wan kêfxweş bûn. Di medyaya cîvakî de bi hezaran hat parvekirin. Çend kesan ji bo gundên xwe ji me alîkarî xwastin. Li Danimarkayê, li Tirkiyê di televîzyonan de nûçeyên belgefîlmê hatin çêkirin. Di çend malperan de jî hate weşandin û nivîs li ser hatin nivîsandin."

# Dengê ‘Komara Îslamî’ di mijara dewleta Kurdan de bi ser neket

■ ESKENDER CEIFERÎ



“Ji bo Kurdistanê gefa herî mezin ne Tirkiye ye lê belê Îran e. Rast e Tirkiye jî piştî referandûmê gefan li Rêveberiya Kurdistanê dixwe lê roleke xuya û berbiçav a Tirkiyê di vê mijarê de nîn e belkî pirsgirêka sereke ji bo Kurdistanê Îran e û pêwîst e were çareserkirin. Ew dixwazin Kurd ji encamê vekişin lê Kurd natirsin.”

Referandûma serxwebûna Kurdistanê hate encamdan û bi serkeftina dengên erê, dengê Îranê ji bo dijatiya referandûmê bêbandor ma. Lê vê carê ‘Komara Îslamî’ dixwaze bi dîplomasiya xwe li navçeyê pêşiya ragihandina serxwebûnê bigire.

Berê hatibû ragihandin ku Îranê piştî birêveçûna referandûmê, deriyên sînorî bi Herêma Kurdistanê re girtine lê Wezareta Derve ya Îranê ragihand ku deriyên sînorî yên aliyê Herêma Kurdistanê vekirî ne û nehatine girtin.

Li gor daxuyaniyê, beriya niha berdevkê Wezareta Derve yê Îranê bi şaşî gotibû deriyekî bejayî yê sînorî hatiye girtin lê bi ti awayekî deriyên sînorî li ser Herêma Kurdistanê nehatine girtin û sînor vekirî ne.

**Rûsye, Îran û Tirkiyê referandûm gotûbêj kirin**

Berdevkê Kremlînê Dimtriy Peskov ragihand ku Serokkomarê Tirkiyê Receb Tayyip Erdogan, Serokkomarê Îranê Hesen Ruhanî û Serokê Dewleta Rûsyayê Vladimir Putin di derbarê referandûma serxwebûna Kurdistanê de axivîne, lê wek hertim, Kremlin naveroka civînê bi raya giştî re parve nake. Tevî vê jî guhertin di helwesta Rûsyayê de li ser mijara referandûma serxwebûna Kurdistanê nîn e û li gor Moskowayê, piştgiriya parastina yekîtiya axa welatên navçeyê û ewlekariya wan, ji bo çareserkirina pirsgirêkan pir girîng e.

**Îran hê dudil e**

Elî Muteherî cîgirê serokê Parlamentoya Îranê jî referandûma serxwebûna Kurdistanê nirxand û got ku em ji helwesta tund a Tirkiyê bi guman in. Wî di rûniştineke taybet a parlamentoyê de li ser mijara referandûmê got: “Amerîka û Îsraîl piştgiriya serxwebûna Kurdistanê dikin, lewma divê em li hemberî Herêma Kurdistanê bi hestiyarî tev negerin û em ji helwesta Tirkiyê ya tund di vê mijarê de bi guman in lê tevlî helwestên tund nabin û wê bisekinin û zû biryarê nastînin.

‘Komara Îslamî’ bi hêvî ye ku dewletên misilman rê nedin ku dewleta Kurdî were avakirin. Elî Ekber Velayetî fermandarê Îranî ragihand ku ew ê ligel Enqere û Bexdayê li hemberî ragihandina dewleta Kurdî derkevin û roja piştî referandûmê jî pergala parastina moşekan li ser sînorên Rojhilatê Kurdistanê ku bi Herêma Kurdistanê re hevsînor e, bicih kirine. Armanc ji bicihkirina wan moşekan, lihemberderketina êrîşên dagirkeriyê hatiye ragihandin.

Velayetî got ku gelê Îraqê li hember vê yekê bêdeng namînin û Îran, Tirkiye û welatên din ên herêmê jî wê li hemberî dewletbûna Kurdan bisekinin.

**Xamineyî Kurdan dişibîne Îsraîlê**

Aliyên nêzîkî Elî Xamineyî rêberê ‘Komara Îslamî’, ku heman nerîna wî hene, Kurdan dişibînin Îsraîliyan û dibêjin sedema avabûna dewleta Îsraîlê jî weke Kurdan ew nerîn bû ku neteweyeke belavbûyî ye û tenê bi riya dewletbûnê dikare aramiyê bi dest bixe.

Konstantin Kosaçev serokê Komîteya Pêwendiyên Derve ya Konseya Federasyona Rûsyayê li ser referandûma Kurdistanê da xuyakirin ku encama referandûmê, heman encam bû dihat hêvîkirin lê Rûsya dê wek dewletên din, di vê mijarê de gavên lezgîn neavêje

Ew senatorê Rûsî referandûma serxwebûna Kurdistanê weke gaveke aştiyane binav dike û welatên ku li dijî referandûmê derketine rexne dike û dibêje nabe ew kesên ku piştevaniya Bihara Erebî dikirin, li dijî referandûma Herêma Kurdistanê derkevin.

**Îran ji perçebûna xwe ditirse**

Muhamed Cewad Zarîf wezîrê Derve yê Îranê got ku ligor wan, referandûma serxwebûna Kurdistanê şaştiyeke mezin a stratejîk bû lê dîsa jî ew ê weke kesên dostên Kurdan dostê wan bimînin.

Zerîf teqezê jî dike ku biryara referandûma serxwebûnê tenê bi herêma Îraqê re sînordar namîne û ji ber wê, Îran û Tirkiye lidij derdikevin da ku bandora referandûma serxwebûnê li ser welatiyên wan ên Kurd çê nebe.

## Gefa herî mezin Îran e

Ryan Crocker balyozê berê yê Amerîkayê li Bexdayê da xuyakirin, ji bo Kurdistanê gefa herî mezin ne Tirkiye ye, lê belê Îran e. Rast e Tirkiye jî piştî referandûmê, gefan li Rêveberiya Kurdistanê dixwe, lê roleke xuya û berbiçav a Tirkiyê di vê mijarê de nîn e belkî pirsgirêka sereke ji bo Kurdistanê Îran e û pêwîst e were çareserkirin. Ew dixwazin Kurd ji encamê vekişin lê Kurd natirsin.

Wî her wiha rêveberiya Amerîkayê ji ber helwesta wan rexne kir û got ku vê helwestê hiştiye Bexda wêrekiyê li hemberî Rêveberiya Herêma Kurdistanê bi dest bixe û tevî ku Kurdan referandûmeke aştiyane pêk aniye lê gefan li Kurdan dixwin. Êdî dema wê hatiye ku DYA di derbarê krîza di navbera Bexda û Hewlêrê de tevbigere û pirsan çareser bike.

## Kurdên Rojhilata Kurdistanê daketin kolanan

Piştî pêkanîna referandûma serxwebûnê li Herêma Kurdistanê, xelkê li bajarên Rojhilatê Kurdistanê jî bi coşeke mezin pêşwaziya wê kirin û ji bo pîrozkirina encamdana referandûmê bi alayên Kurdistanê derketin kolanan.

Li bajarê Sine, Kirmanşan, Mehabad, Pîranşar, Ormiye, Ciwanro, Seqiz û gelek deverên din, hejmareke mezin a Kurdan bi şev derketin kolanan û dest bi pîrozbahiyan kirin. Ji wê demê ve heya niha bi sedan kes ji ber hildana ala Kurdistanê hatine girtin. Ew pîrozbahî di roja birêveçûna referandûma serxwebûna Kurdistanê de, heya derengiya şevê bi coşeke mezin berdewam bûn. Partiyên Kurdî yên Rojhilat ji xelkê xwastibûn ji bo piştevaniya serxwebûna Kurdan bi ala Kurdistanê derkevin kolanan.

# Plana vejandina gola Urmiyê rastî astengiyan tê

Rêveberê Navenda Çavkaniyên Avê yên Gola Urmiyê ragihand ku di demên dawiyê de asta baranbarînê li navçeyên derdora golê daketiye û di encamê de plana wan a ji bo vejandina vê golê rastî hin astengiyan hatiye û pêwîst e dewlet di vê derbarê de bûdceyeke zêdetir terxan bike.

Elîriza Mûsewî teqez jî kir ku ew ê pêdeçûnê bi plana xwe de bikin û pêwîst e plana B, rêkarên baştir li xwe bigire da ku eger asta baranbarînê jî kêm bibe, bandoreke zêde li ser plana vejandina gola Urmiyê çê nebe lê ji bo vî karî, pêwîst e dewlet bûdceya vejandinê ji çend milyar tumenan heya 100 milyar tumenan bilind bike.



**Baranbarîn %26 kêm bûye**


Ji ber ku di sala derbasbûyî de bi lihemberdana ligel sala berî wê nêzîkî %26 rêjeya baranbarînê kêm bûye, niha ew ava ku ji bendavan derdikeve û diçe nav golê, bi heman qasî kêmtir bûye. Lewma jî di heyama salekê de ava golê zêdetir paş de çûye û zihabûna wê rengekî cidîtir bixwe ve digire.

Ew berpirsê Îranî her wisa dibêje divê li gor bûdceya dewletê riftar bi golê re bê kirin lê mixabin bûdceya ku ji wezareta Çandiniyê re tê dayîn, qet ji bo karên plana vejandina golê nayê mezaxtin û ev jî di demekê de ye ku li gor biryarnameya dewletê, beşek ji van erkan dikeve stûyê vê wezaretê.

Heya niha plana B ji Navenda Çavkaniyên Avê yên Gola Urmiyê re nehatiye danîn û lewre dema ku rêjeya baranbarînê dadikeve, tevahiya rêjeya ava pişt bendavan ji bo çandiniyê tê bikaranîn û bi vî karî jî enbara avê vala dimîne û nikare heya salekê bandoreke erênî bike ser plana vejandina golê.

**Bûdceyeke zêdetir ji gola Urmiyê re pêwîst e**

Mûsewî got eger dewlet bi awayekî berpirsiyarane tevbigere, divê bûdceya pêwîst terxan bike û her sal jî hin rêkarên nû ji bo projeyên çandiniyê bide Wezareta Çandiniyê da ku av, bêmifah neçe û herî zêde ji sîstema avdêriyê ya pêşketî mifah bê wergirtin û ew ava ku zêde dimîne, ji bo gola Urmiyê bê veguhestin. Eger ew proje bi awayekî standard bêne encamdan, wê demê dikarin bi qasî ji %8 ava parêzgehê veguhêzin golê ku ew jî dikare bandoreke erênî bike ser zuhabûna wê ji ber ku êdî wê aveke zêde li pişt bendavan bimîne.



Heya niha plana B ji Navenda Çavkaniyên Avê yên Gola Urmiyê re nehatiye danîn û lewre dema ku rêjeya baranbarînê dadikeve, tevahiya rêjeya ava pişt bendavan ji bo çandiniyê tê bikaranîn û bi vî karî jî enbara avê vala dimîne û nikare heya salekê bandoreke erênî bike ser plana vejandina golê.

## Sozên vejandina golê nehatine bicîkirin

Gotinên vî berpirsê dewletê di demekê de ne ku beriya niha di dema propagendeyên hilbijartinên serokkomariyê de ku Hesen Rûhanî dixwast ji bo cara duyem bibe serokkomar, Rûhanî bixwe serdana Urmiyê kir û di derbarê hewlên xwe de ji bo vejandina gola Urmiyê got ew gol, 120 cm kêm bûbû lê min qewl dabû xelkê Urmiyê ku ezê vê golê ji mirinê rizgar bikim. Lewra min soza xwe bi cih anî. Min karî 10 cm ava gola Urmiyê bi lihemberdan ligel sala 2014an zêde bikim û niha jî em bo zêdekirina ava gola Urmiyê di nava hewlên berdewam de ne. Lê berovajî gotinên wî, piştî heyvekê dîsa asta avê kêm bû û xuya dibe ku zêdebûna ava golê, tenê ji ber barîna zêde ya baranê bûye neku ji ber veguhestina avê ji bo wir an jî bidawîkirina çêkirina bendavan e.

Hinek çalakvanên jîngehê jî dibêjin eger dewlet dixwaze gola Urmiyê ji zuhabûnê rizgar bike, divê ew pira ku di navbera Ormiye û Tewrêzê de ji nav golê derbas bûye, bê rakirin. Ji ber ku pir li ser kaniyên sereke yên bin erdê de û bi çîmentoya pêşesaziyê hatiye çêkirin ku rê nade ava kaniyên siruştî yên taybet bi golê ku ava şor e, derkeve û biherike nav golê.

# Heftiyek mafên mirovan li Rojhilatê Kurdistanê

Li bajarê Bokanê 11 welatiyên Kurd ji aliyê hêzên Îstixbarata Îranê ve hatin girtin. Tevî ku malbatên wan 11 kesan serî li saziyên pêwendîdar dane lê heya niha nehatiye zanîn ku ew li ku derê têne ragirtin. Ew kesên navborî di dema girtinê de rastî lêdanê hatine.

Çalakvanekî komûnîst bi navê Mizefer Salihniya li bajarê Sine hate girtin. Ew çalakvanê Kurd beriya niha bi tometa organîzekirina xwepêşandanên karkeran ji aliyê dadgehê ve bi salek girtîgehê hatibû cezakirin.

Li girtîgeha Urmiyê girtiyekî Kurd bi navê Muslim Temerxanî hate darvekirin. Ew girtiyê Kurd beriya niha ji aliyê saziya dadê ya Îranê ve bi tometa kuştina kesekî bi darvekirinê hatibû cezakirin. Ew hikum di demekê de jê re hatibû ku wî li dadgehê ragihandibû ku ti haya wî ji kuştina wî kesî tine ye. Dadgehê ragihandibû eger ew nikare malbata kesê kuştî razî bike, wê di demeke nêzîk de bê darvekirin.

Li bajarê Bane yê parêzgeha Sine du welatiyên Kurd ji aliyê hêzên ewlehî ve hatin binçavkirin û ji bo cihekî nediyar hatin veguhestin. Navên wan du kesan Sirûş Mihemedî (18) û Mensûr Esrarî (60) hatiye ragihandin. Tometa wan, endametî di partiyeke Kurdî de bûye. Tevî ku malbatên wan serî li saziyên ewlehî û dadê yên vê parêzgehê dane lê heya niha nayê zanîn gelo ew ji deh rojan beriya niha ve li ku derê têne ragirtin.

Li bajarê Ciwanroyê çar welatiyên Kurd bi navên Ako Yar, Hadî Bazanî, Kemal Zahirî û Mihemed Emînî ji aliyê hêzên Îstixbarata Îranê ve hatin binçavkirin ji bo cihekî nediyar hatin veguhestin. Tometa wan çar kesan beşdarî di meşên girseyî yên xelkê Rojhilatê Kurdistanê de bûye. Piştî ku ew hatine girtin, hêzên ewlehî çûne malên wan û dest danîne ser hin kelûpelên wan ên taybet weke laptop û pirtûkan.

Li bajarê Kamyaranê herî kêm sê çalakvanên sivîl ji aliyê hêzên ewlehî ve hatin girtin. Navên wan kesan Yasir Ferecullahî kurê Mihemed (29), Fireydûn Kerîmî kurê Elî Ekber (26) û xelkê gundê Mîsûra, Layiq Rehmanî kurê Qasim xelkê gundê Lon Sadat hatiye ragihandin û tê gotin ku sedema girtina wan sê kesan, rêkxistina meşên girseyî bûye.

Îstixbarata Îranê li bajarê Sine rê nade parêzerên Kurd ku dosyeya Ramîn Husênpenahî girtiyê siyasî yê Kurd ji bo parêzvaniyê wergirin. Li gor ku malbata Ramîn dibêje, vê saziyê ji parêzerên Kurd re ragihandiye ji bo ku malbata wî ji destnîşankirina parêzerekî ji wî re poşman bibin, divê pereyekî zêde ji wan bixwazin û ji ber ku nikarin wî pereyî bidin, êdî nikarin parêzer destnîşan bikin. Ramîn Husênpenahî çar mehan beriya niha bi tîmeke Pêşmergeyên Komele re li Sine ket ber êrîşa hêzên Sipaya Pasdaran û piştî birîndarkirinê, hate girtin.

Li bajarê Mehabadê sê kesên bi navên Ronak Aqayî, Sirwe Hesenzade û Kawîs Aqayî û li Pîranşarê çar kesên bi navên Şoriş Ibrahîmî, Soran Husênpûr, Bextiyar Meirûfî û Qadir Azerberzîn ji ber ku bo nîşandana kêfxweşiya xwe li hemberî birêveçûna referandûma serxwebûna Kurdistanê derketibûn kolanan, ji aliyê hêzên ewlehî ve hatin girtin û ji bo cihekî nediyar hatin veguhestin. Di wan çalakiyan de hêzên ewlehî jî bi kincên şexsî di nav xelkê de bûn û kesên ku çalakî organîze dikirin, binçav dikirin.

Li bajarê Bokanê 11 welatiyên Kurd bi navên Pûrya Qurêyşî, Umîd Farûqî, Awat Sultanî, Idris Qadirî, Rehman Qadirî, Selman Bêpûş, Rehîm Efşarî, Xefûr Nesîrî, Rehman Xusrewî, Diyako Pûrmistefa û Xefûr Pûrehmed ji aliyê hêzên Îstixbarata Îranê ve bi tometa hewldan li dijî tenahiyê hatin girtin. Tevî ku malbatên wan 11 kesan serî li saziyên pêwendîdar dane lê heya niha nehatiye zanîn ku ew li ku derê têne ragirtin. Ew kesên navborî di dema girtinê de rastî lêdanê hatine.

Ebdulbasit Emînî kurê Mihemed xelkê gundê Gelên yê Hewramanê û sê kesên bi navên Muslim Seîdpûr, Pêyman Mênberî û Mihemed Mênberî li Tengîserê ji aliyê hêzên ewlehî ve bi tometa endametî di partiyeke Kurdî de hatin girtin. Tevahiya van çar kesan beriya niha jî ji ber birêvebirina rêwresmên newrozê hatibûne girtin û pişt re bi danîna kefaletê hatibûne berdan.

Girtiyekî siyasî yê berê bi navê Bextiyar Xuşnam li Seqizê ji aliyê hêzên ewlehî ve bi tometa hewldan li dijî Komara Îslamî di riya endmetî di partiyeke Kurdî de hate girtin. Bextiyar Xuşnam beriya niha jî bi heman tometê bi salek girtîgehê hatibû cezakirin û piştî derbaskirina heyama salekê ji girtîgeha Seqizê hatibû berdan. Hêzên ewlehî ji bo berdana wî, kefalet jî qebûl nekirine û biryar e piştî lêpirsînê bê darizandin.

Li bajarê Bokanê du mamosteyên Kurd ên bi navên Seyîd Selman Îmam Zenbîlî û Mewlûd Xançêzerd ji aliyê hêzên Îstixbarata Îranê ve hatin girtin. Tometa wan du mamosteyên Kurd, hewldan ji bo xapandina raya giştî di riya organîzekirina xwepêşandanên mamosteyan de bûye.

Li girtîgeha Derya, girtiyekî Kurd ê bi navê Cewad Xêyrî hate darvekirin. Beriya niha Cewad ji aliyê dadgehê ve bi tometa kirîn û firotina madeyên hişber û kuştina polîsekî bi du caran darvekirinê hatibû cezakirin.

Husên Mensûrî Celalvend li Kirmaşanê ji aliyê hêzên ewlehî ve bi tometa organîzekirina xwepêşandanên oldarên Yarsan hate girtin. Ew welatiyê Kurd ku li parêzgeha Mazenderanê dijî, ji bo hin çalakiyên sivîl çûbû Kirmaşanê.

Li Serdeştê kolberekî bi navê Xizir Ispendar kurê Ehmed xelkê gundê Feqî Sulêman û li Newsûdê jî kolberekî din bi navê Ferzad Qadirî xelkê gundê Nîsanê ji ber teqeya hêzên sersînor birîndar bûn.

# Guherîna avûhewayê wê koçan zêde bike

MISTEFA PÎRAN

Li cîhanê piştî bobelatên li pey hev, performansa hikûmetan a li ser guherîna avûhewayê dîsa ket rojevê. Li gor rapora navdewletî ya, ‘Performansa Guherîna Avûhewayê 2017’ ku xwedî prestîjeke mezin e, her sê rêzên pêşîn ji ber ku welatekî ku performaseke bi rêk û pêk nîşan dabe tune bû, vala hat hiştin.

Di raporê de di derbarê enerjiya ku xwe nû dike de paşdeçûnek xuya dike û ji 58 welatan tenê 2 (Tirkiye û Cezayîr) ji berê kêmtir enerjiya veguherîner (yenîlenebîlîr) bikar anîne.

Di rêza CCPI 2017an de bi pêşketinekê Hîndîstan bilindû rêza 20an, Arjantîn di 36an û Brezîlyayê jî di rêza 40an de ku di heman demê de ev welatên ku bipêş dikevin in, cih girtin. Di aboriya van welatan de jî pêşketinek hat dîtin. Tirkiyeyê di nava 58 welatan de di rêza 51an de cih girt. Puana Tirkiyê gelek kêm tê nirxandin. Fransayê di rêza 4an de cih girt.

Li gorî Endeksa Performansa Guherîna Avûhewayê ya 2017an Kanada (55), Awistralya (57) û Japonya (60) di koma herî jêr de ku weke koma herî qels tê zanîn de cih girtin. Japonya ji ber performansa heyî 2 rêzan jî bi paş de çû.

Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê (43) û Çîn (48) ku di cîhanê de emîsyona herî zêde ew berdidin, ji aliyê CCPIyê ve hê jî weke qels tên dîtin. DYA di hemû kategoriyan de paş de diçe, lê di performansa Çînê de kêm jî be hinek pêşketin heye.

Fas ku îsal mêvandariya Konferansa Aliyan ya Rêkeftina Çerçewe ya Guherîne Avûhewayê ya Netewên Yekgirtî, kir di rêza 8an de cih girt. Fas bi vê performansa xwe ya baş yekem welat e ku ne endama YE ye û xwedî vê performansê ye. Ev pêşdeçûna Fasê jî ji ber armanc û veberhênanên wê yên li ser enerjiya ku xwe nû dike pêk hat.



Piştî germahiya zêde, bobelat xwezayî û yên din, zanyar ragihînin ku Rojhilata Navîn û Bakûrê Afrîkayê ji jiyanê re ne guncaw in û hişyariya koçên nû dikin.

**Li hêla din li gor Jan Burck bi gotinên “Li gor enerjiya gerdûnî şert û merc ewqas baş nebûbûn. Bi enerjiya veguherîner û daketina lêçûnên teknlojiya berhemdar, êdî tu sedem nemane ku dewlet, Peymana Parîsê bikin yasayeke niştimanî. Di warê enerjiya ku xwe nû dike de pêşketinên baş hene” balê dikişîne ser serdema nû.**

**Koçên Avûhewayê dê pêk werin**

Piştî germahiya zêde, bobelat xwezayî û yên din, zanyar ragihînin ku Rojhilata Navîn û Bakûrê Afrîkayê ji jiyanê re ne guncaw in û hişyariya koçên nû dikin.

Li gor raporta Dîrektorê Enstîtûya Kimya ya Max Planck û Profesorê Enstîtûya Qibrisê Jos Lelieveld, hejmara rojên germ li herêmê li gor salên 197an bû caran zêdetir bûye û heta dawiya vê sedsalê jî wê 5 carên din zêdetir bibe. Li gor vê raporê wê gelek mirov ji ber v rewşê ji cih û warên xwe bibin.

Lelieveld dibêje pileya germahiyê di navbera 1986-2005an de tenê 16 bû û dibe ku di dawiya sedsalê de ev derkeve 116an. Li gor navborî di demek nêz de gelek dever ji ber vê guherînê wê bikevin kategoriya birîsk bo jiyanê. Lelieveld herwiha dibêje germahiya zêde û bahozên xîz wê bandoreke gelek xirab li ser hin devera bikin û ev jî wê bibe sedema koçê.

Yekitiya Ewropa radigihîne û hişyar dike ku eger tevdîrên pêwîst neyên wergirtin, ji qutba Bakûr heta Rojhilata Navîn, ji Çînê heta Karayîban wê bêîstîqrariyeke mezin pêk were.

**Di raporan de guherîna avûhewayê**

Guherîna avûhewayê ku heta niha tenê di mijara hevsengiyên xwezay de dihat lêkolînkirin, bo cara yekem bû mijara siyaseta navdewletî jî. Li gor rapora YE bi guherîna avûhewayê çavkaniyên avê wê kêm bibin, koç wê zêde bibin û rîska pevçûnên ji ber van sedema wê zêde bibe. Di serî de Rojhilata Navîn tê ku ev rîsk lê zêde ye. Li gor raporê rîska veguherînarewşa heyî ku aloz e, bo pevçûnên dijwartir zêde ye.

Yekitiya Ewropa radigihîne û hişyar dike ku eger tevdîrên pêwîst neyên wergirtin, ji qutba Bakûr heta Rojhilata Navîn, ji Çînê heta Karayîban wê bêîstîqrariyeke mezin pêk were. Ev rapor ji aliyê Nûnera Bilind a YE Javier Solana ve hatiye amadekirin û xalên balkêş radixe be çavan.

Bi guherîna avûhewayê re erdê ji bo cotkariyê û çavkaniyên avê wê kêm bibin. Cureyên masiyan wê kêm bibin. Xela wê derkeve holê. Lehî wê rabin. Hişkahî wê demdirêjtir bin. Çavkaniyên enerjiyê wê nemînin. Bi bilindbûna avê li peravên Çînê yên rojhilat, Hîndsîtan, Karayîp û Amerîkaya Navend wê bobelatên mezin wê rû bidin.

**MENA di bin rîskeke mezin de ye**

Zanyar ji bo Rojhilata Navîn û Bakûrê Afrîkayê (MENA) hijyariyan didin û dibêjin bi koçên neçar û xerabbûna şert û mercên bo jiyanê ev herdu dever di bin rîskeke mezin de ne. MENA weke herêma herî hişk bi nav dikin. Ji sedî 6ê gelheya cîhanê li vê herêmê dijî û 12 welatên ku Tûnis, Bahreyn, Kuweyt û Cezayîr jî di nav de ne bi hişkahiya zêde xelayeke avê rû dide.

## Wek qonaxeke girîng Peymana Avûhewayê ya Fransayê

Peymana Avûhewayê ya Parisê di 2015an de ji aliyê nêzî 200 welatî ve hatibû qebûlkirin û ev peyman ji aliyê hiqûqî ve berpirsiyariyan çênake. Hedefên avûhewa yên her welatî wek esas tê qebûlkirin. Mînak, armancên DYA yên avûhewayê tê çavêrekirin ku heta 2025an berdana gaza serayê a DYAê di navbera ji sedî 26 û sedî 28an de bê daxistin. Tirkiyê jî di nav welatên ku îmze avêtiye Peymana Parisê de cî digire.

Di peymanê de tê armanckirin ku emisyona gaza serayê heta sala 2030î dakeve 56 mîlyon tonê. Tê çavêrekirin ku bi vê armancê zêdebûna germahî a kurewî heta dawiya sedsalê di bin 2 pîleyê de bê muhafazakirin. Di germahiya kurewî de pîleya 2 wek xala girîng tê pejirandin. Pispor di vê metirsiyê de ne ku ger germahiya kurewî 2 pîle zede bibe ji bo mirovahiyê wê zirarên mezin çêbibin. Digel vê, bi peymanê hin hişyariyan didin. Hişyariyên ewil di qeşayan de helîn zêde ye. Bi vê rewşê re, bal tê kişandin ku deverên bi cî bûne yên ku di asta behrê de ne wê di bin avê de bimînin û penaberên avûhewayê derxine holê. Talûkeyên din jî germehiyên pir zêde, ziwayî, xela û bagerên bi tund tên rêzkirin.

Peymana Parisê hikmên di mijarên kêmkirina emîsyonê de, welatên pêşveçûyî û yên pêş ve diçe cuda dike, her wisa divê welatên ku pêş ve çûne ji welatên pêş ve diçe re teknolojiyê transfer bike û fînansmanê peyda bike.

**Encamên germbûnên kurewî**

Germbûna kurewî, di encama gazên ku li atmosferê kom bûne tebeqeyekî peyda dike û germahiyê zêde dike çêdibe. Ev rewşa ku wek bandora serayê tê binavkirin zêdetir ji ber sotemeniyên fosîl neft, komir û gaza tabî çê dibe. Gubreyên ku bo cotkariyê tên bikaranîn û faaliyetên ajaldarî jî dibe sedem ku emîsyona gaza serayê pêk tê. Di nav gazên serayê de, karbondîoksît, metan û ozon hene.

**Teahûda Tirkiyeyê**

Tirkiye bi îmzekirina Peymana Avûhewayê ya Parisê teahûda ku heta 2030an emîsyonên gaza serayê ji sedî 21 hindik bike da. Lê belê Tirkiye eşkere kir ku wê di çarçoveya polîtîkayên enerjiyê yên nû de berê xwe bide komira xwemalî jî. Wezirê Enerjiyê Berat Albayrak di daxuyaniya xwe ya meha Sibatê de gotibû, mebesta Tirkiye ew e ku bi komira xwemalî hilberîna ceyranê zêde bike. Tê armanc kirin ku heta 2023an santralên enerjiyê yên bi qasî 15 hezar megavatê ên bi komira xwemalî, tav û bayê bên vekirin.

## Endeksa Performansê ya Guherîna Avûhewayê Çi ye?

Ji sala 2005an û vir ve ji aliyê Tora Guherîna Avûhewayê a Ewropayê (CAN–Climate Action Network Europe) û Rêxistina Hawirdor û Pêşketinê ya Almanyayê ve Konferansa Alîgiran a Peymana Hawirdorê a Guherîna Avûhewayê ya Neteweyên Yekbûyî tê lidarxistin.

Piştî konferansê, Endeksa Performansê ya Guherîna Avûhewayê (CCPI) tê weşandin. Di endeksa ku îsal hatiye weşandin de 58 dewletên ku ji %90 emîsyonên $CO_2$ ya ku kurewî ya enerjîyê re eleqeder in hene. Krîtera ku tevlî endeksê bibe divê ji %1 emisyonên $CO_2$ê yê kurewî be. Li gorî vê, welatên ku ji %1î zêdetir emisyonên $CO_2$yê berdabe ev daxilî endeksê dibin.

Endeks bi tenê welatên ku di parastina avûhewayê de ne serkeftîne, nahewîne di heman demê de welatên ku di polîtikayên avûhewayê de sepandinên wan ên baş hene jî dihewîne. Digel vê yekê tê armanckirin ku li ser welatan mobinga civakî çêbikin.

Di endeksê de, daneya herî balkêş, di nav salên 1996 û 2015an de ji ber 11 hezar sedemên avûhewayî, bûyerên avûhewa yên ku pir zêde pêk hatine. Di nav van bûyeran de, 530 kesan canê xwe ji dest dane û bi qasî 3.3 trîlyon dolar xisar çêbûye.

**Krîterên Endeksê**

Performansa guherîna avûhewayê, bi panzdeh hêmanên cüda tê pîvan. Asta emisyonê, pêşveçûyîna emisyonê, berhemdarî, tevî di polîtîkayên avûhewa û enerjî ya ku xwe nû dike de jî di pênc kategoriyan de tê nirxandin.

Li ser pûanên, asta emîsyonan %30, pêşveçûyîna emîsyona %30, enerjiya ku xwe nû dibe %10, berhemdarî %10 û polîtîkayên avûhewayê %20 tê hesibandin. Li gor vê, o puana herî kêm û 100 jî puana herî zêde tê nirxandin û welat jî ji ya herî zêde ber bi ya kêm tên rêzkirin. Welatan didin berhev û wisa nirxandinê dikin.

Ji %80ê van nirxandinan, li gor hêmanên objektîf yên zanistê yên ast û trenda emîsyonê tên kirin. Ji %20 jî li gor raporên nirxandinê polîtîkayên avûhewa yên navneteweyî û netewî yên pisporên wî welatî tên kirin.

Di endeksê de tiştê herî balkêş jî her sal her sê dorên ewil vala tên hîştin. Sedema vê yekê jî ew e ku heta niha tu welatekî bo guherîna îklîma bi talûke tevdîrên pêwist negirtine û lîmîtên emîsyonê jî ne di asta normal de ne. Yanî li cîhanê tu welat li gor lîmita 1.5-2 °C tevnagere.

Konferansa îsal li bajarê Marakeş ê Fasê hat lidarxistin. Îsal dane li gor berê bi qismî erenî ne. Di enerjiya ku xwe nû dike û berhemdariya enerjiyê de, geşadanên erênî hatine tespîtkirin lê belê, şoreşa enerjiyê hê jî ne di asteke baş de ye. Û di eksana sereke ya ku lê de ye.

**Tirkiye di rêzên dawî de ye**

Tirkiye li gor endeksa Performansa Guherîna Avûhewayê ya 2017an, wek par di listeyê de cihê wê neguheriye û di rêza 51. de ci digire. Polîtikaya avûhewayê ya Tirkiyeyê di derecekirinê de di dora dawin de cî digire û bi ‘zehf qels-lawaz’ hat qeydkirin. Tê destnîşankirin ku Tirkiye, polîtîkayên avûhewayê yên pêşverû li ser çavkaniyên enerjiyê yên ku xwe nû dike navendên enerjî yên ba û tavê pêş ve nabe. Di heman deme de, bi polîtîkayên xwe yên ku komirê zêdetir derdixe pêş û teşvîkirina komiriyê.

**Fasa ku mazûvaniya konferansê dike hêviyê dide**

Fasa ku îsal mazûvaniya Konferansa Aligirên Peymana Hawirdorê ya Guherîna Avûhewayê ya Neteweyên Yekbûyî dike, di dora 8. de cî digire. Fas bi vê yekê di CCPIê de rewşa xwe ya baş didomîne. Her wisa rewşa Fasê ji bilî welatên endamên YE ê, wek yekane welatê ku di derecekirineke baş de tê diyarkirin. Fas bi veberhênanên cidî yên bo enerjiya ku xwe nû dike kiriye û bi hedefên xwe yên orte û dirêj ve, wek pêşanga parzemîna Efrîqayê tê dîtin.

# Li aliyekî birs, li aliyê din obezî

Sala derbasbûyî li gor serdema beriya pîşesaziyê di asta 1,1 C weke sala herî germ hatibû tomarkirin. Îsa jî daneyên berdest heman rewşê nîşan didin. Cîhana ku serdemên xwe yên herî germ dijî berdelên vê yekê bi xela, bêavî û xîzaniyê dide. Daneyên rewşa 2017an ku pêwîstiyên sereke yên însanî yên wek av û birsê bi awayekî berbiçav nîşan didin cihê xwe yên di raporan de jî girtin.

Netewên Yekgirtî (NY) û Rêxistina Qutû Cotkariyê (FAO) bi rapora li ser vê mijarê balê dikişînin ser pevçûn û guhertina keşûhewayê. Li gor vê yekê pirsgirêka birsê zêde dibe.

Li gor rapora bi navê, ‘Li Cîhanê Ewlekariya Qut û Rewşa Xwedîbûnê ya 2017an’ ku ji aliyê Sindoqa Geşepêdana Cotkarî ya Navdewletî (IFAD) ya FAOyê, Sindoqa Alîkariya Zarokan a Netewên Yekbûyî (UNICEF), Bernameya Qut a Cîhanê (WFP) û Rêxistina Tendûristiyê ya Cîhanê (WHO) tê amadekirin, rêjeya birsê ku di sala 2015an de 777 milyon bû, sala par bûye 815 milyon kes. Daneyên balkêş nemaze jî di derbarê Rojhilata Navîn û Asyayê de ne. Li gor raporê li Asyayê nêzî 520 milyon kes di bin sînorê têrbûnêde ne, yanê birsî ne. Li Arfîqayê 243 milyon kes, li Amerîka û Karayîpan zêdetirî 42 milyon kes bi birsê re rûbirû ne.

Li gorî raporê ji sedî 20ê Afrîqayê, ji sedî 11,7ê Asyayê, ji sedî 6,6ê Amerîkaya Latîn û Karayîpan li ber birsê ne.



Ewlehiya qut nemaze jî li Afrîkaya Jêr Sahrayê, Başûrrojhilatê Asyayê û li Bakûrê Asyayê kêm bûye. Ev rewş bi hişkayî û pevçûnan derket asteke bilindtir.

Li cîhanê herêmên ku herî zêde hejmara mirvên ku xwarin destbi nakeve û birsî ye, deverên şer û pevçûnan in. Li van herêman 489 milyon însan di ava birsê de ne.

**Obezî zêde dibe**

Li cîhanê li aliyekî birs heye û li aliyê din têkoşîna li dijî obeziyê berdewam dike. Kurtbûna bejnê, qelewbûna zêde di nava daneyên girîng de cih digirin. Li gor raporê li cîhanê 155 milyon zarokên li jêrî temenê 5an bejnkurt in. 52 zarok jî zêde zeîf in û 41 milyon zarok jî zêde qelew in.

Li gor raporê rêjeya kesên obez jî zêde dibe. Herwiha dîsa li gor raporê belavbûna nexweşiya anemî (kêmxwînî) di nav jinan de kêşeyeke mezin e. Ji sedî 13ê cîhanê li gor vê raporê obez e. Li gor vê yekêli cîhanê 641 milyon kes obez in. Ev rêje ji bo yên kesên kemilî/gihiyayî derbasdar e.

Li gor raporê rêjeya jinên ku bi nexweşiya anemiyê ketine bûye 613 milyon kes û ev jî dike ji sedî 33ê jinên li cîhanê.



Li cîhanê li aliyekî birs heye û li aliyê din têkoşîna li dijî obeziyê berdewam dike. Kurtbûna bejnê, qelewbûna zêde di nava daneyên girîng de cih digirin.

Serokê Konseya Karsazên Tirkiye–Îraqê Emin Taha:

# Girtina deriyan wê tesîreke neyînî li her du aliyan bike

■ DARA BANDÎNÎ




Pêkanîna referandûma serxwebûnê ji aliyê Herêma Kurdistanê ve bû sedema nakokiyan, di navbera Herêma Kurdistanê û Tirkiyeyê de. Serokkomarê Tirkiye Recep Tayip Erdoğan ragihandibû ku eger referandûm neyê betalkirin dê têkiliyên xwe yên siyasî û aborî yên li gel Herêma Kurdistanê qut bikin. Erdoğan destnîşan kiribû ku tenê bi qutkirina têkiliyan ranawestin, dê deriyê sînorî yê Birahîm Xelîl (Habur) jî ji bo hatûçûnê bigirin. Aborînas, karsaz û siyasetmedar di vê mijarê de ji Tirkiyeyê dixwazin ku çareserkirina pirsgirêkan bi rêya diyalogê be, ne bi rêya ambargo û qutkirina têkiliyan be. Serokê Konseya Karsazên Tirkiye–Îraqê û Serokê Lijneya Komeleya Lojîstîk a Karsazên Serbixwe yên Pîşesazî û Bazirganiyê (MUSÎAD)ê Emin Taha û Serokê Odeya Bazirganî û Pîşesaziyê yê Şirnexê Osman Geliş di derbarê egera girtina deriyên sînorî û danîna ambargoya li ser Herêma Kurdistanê û bandora vê yekê ya li ser her du aliyan de ji Heftenameya Basê re axivîn.

**“Girtina deriyên sînorî zirarê li her du welatan dike!”**

Serokê Konseya Karsazên Tirkiye–Îraqê û Serokê Lijneya Lojîstîk a MUSÎADê Emin Taha dibêje çi sûda ambargoyê ji herdu welatan re jî tune ye û axaftina xwe wiha didomîne: “Em weke karsaz û endamên saziyên sivîlan dixwazin ku têkiliyên di nav her du aliyan de herdem baş bin û erênî bin. Em di wê hêviyê de ne ku her du alî bi rêya diyalogê li çareseriya kêşeyê bigerin û ev kêşe nebe sedema girtina deriyên sînorî û ambargoyê. Li Tirkiyeyê gelek hilberîner û pîşesaz hene ku baziraniyê li gel Herêma Kurdistanê û Îraqê dikin. Wan pîşesazan li fabrîkayên xwe beşek ji bo vê herêmê veqetandine û ji bo daxwaz û kêmasiyên vê herêmê hilberînan dikin û dibin Îraq û Herêma Kurdistanê. Em dibêjin bila deriyên sînorî neyên girtin. Bila vekirî bin. Eger bê girtin wê Tirkiye jî zirar bibîne, Herêma Kurdistanê jî wê bibîne û heta Başûrê Îraqê û Bexda jî dê ji vê yekê zirar bibîne. Eger ew derî bê girtin em neçarî ji ser Îranê re diçin ev yek jî lêçûnên me zêde dike. An jî em ê bi balafiran biçin, balafir jî gelekî biha ne. Divê çareserî bi rêya diyalogê bê dîtin. Em dixwazin Herêma Kurdistanê û Tirkiye ligel hev bi awayekî aştiyane têkiliyên xwe bidomînin.”

**“Rawestandina firokeyan kêşeyeke mezin e!”**

Serokê Konseya Karsazên Tirkiye–Îraqê û Serokê Lijneya Lojîstîk a MUSÎADê Emin Taha dibêje, divê em biçin Hewlêrê û wiha didomîne: “Ji bo em li deverekê xebatan bikin divê em biçin wê derê. Eger em neçên, wê bazirganiya me têk biçe. Eger balafir neçin Hewlêr û Silêmaniyê divê em biçin Şirnexê, Mêrdînê, Batman an jî Diyarbekirê û ji wir jî bi rêya wesayetan derbasî Zaxo, Dihok an jî Hewlêrê bibin. Ev yek jî dê kar zêde û dirêj dike. Hêvîdar im kêşe di zûtirîn demê de bên çareserkirin û em jî karên xwe ligel Herêma Kurdistanê bidomînin.”

**Referandûmê bandor li pereyên Tirkiyeyê jî kiriye**

Emin Taha di derbarê pêkanîna referandûmê û bandora wê ya li aboriya Tirkiyeyê de jî wiha diaxive: “Ev yek bandorê li dolarê dike li hember pereyê Tirkiyeyê. Ji ber ku metirsî heye tîcareta di navbera Herêma Kurdistanê û Tirkiyeyê qut bibe. Ev yek jî dibe sedem ku hatina dowîzan kêm bibe ji bo Tirkiyeyê. Eger dowîz nekeve Tirkiyeyê wê demê rêjeya dowîzê jî li hember pereyê Tirkiyeyê (TL) bilind dibe.

**“Bazirganiya di navbera Herêma Kurdistanê û Tirkiyeyê de nêzîkî 3 milyar dolaran e”**

Emîn Taha her wiha xwediyê Taha Groupê ye û li Herêma Kurdistanê û Îraqê karê kargoyê birêve dibe. Taha axaftina xwe berdewam dike: “Em îsal di wê baweriyê de bûn ku bazirganiya di navbera Îraq û Tirkiyeyê de wê 10 milyar dolar be. Ji wê jî 3 milyar dolarî yanê ji sedî 25/30î ligel Herêma Kurdistanê bûya. Eger tu li gorî hejmara şêniyan jî binêrî ev yek

> “Em weke karsaz û endamên saziyên sivîl dixwazin ku têkiliyên di nav her du aliyan de herdem baş bin û erênî bin. Em di wê hêviyê de ne ku her du alî bi rêya diyalogê li çareseriya kêşeyê bigerin û ev kêşe nebe sedema girtina deriyên sînorî û ambargoyê”





derdikeve holê. Li Herêma Kurdistanê hejmara şêniyan 5-6 milyon e û li deverên Îraqê yên din 30 - 35 milyon kes e.”

**“Ji bo avakirina deverên ku hatine rûxandin jî divê derî vekirî bin”**

Emin Taha di berdewamiya axaftina xwe de dibêje: “Ji bo alternatîfa deriyê sînorî yê di navbera Îraq û Tirkiyeyê de niha deriyekî din ê bi navê Ovakoyê tê ava kirin. 30 km ji deriyê Birahîm Xelîlî ye û di nav axa Sûriyeyê de derbas dibe. Lê ew jî beriya 4 mehan temam nabe û nakeve xizmetê. Ji bo ku kargehên Tirkiyeyê yên avadankirinê biçin wan deverên ji ber şerên DAIŞê hatine rûxandin divê deriyê sînorî yê Birahîm Xelîl vekirî be. Ew deriyê ku nû tê avakirin heta 4–5 mehan jî nayê vekirin. Yanê deriyê sînorî yê di navbera Herêma Kurdistanê û Tirkiyeyê de neyê girtin û karsaz û xebatkarên Tirkiyeyê bikaribin biçin Herêma Kurdistanê û werin.” Emîn Taha di dawiya gotinên xwe de bang li aliyan dike ku vegerin rewşa beriya referandûmê û dibêje divê bi tu awayî têkiliyên di navbera herdu aliyan de qut nebin.

## “Girtina derî wê bandoreke neyînî li seranserê Tirkiyê bike”

Serokê Odeya Bazirganî û Pîşesaziyê yê Şirnexê Osman Geliş jî di derbarê girtina deriyê sînorî û egera ambargoyê ya li ser Herêma Kurdistanê de dibêje, girtina deriyê sînorî bandoreke neyînî li her du aliyan dike û divê siyasetmedarên herêmê û Tirkiyeyê çareseriyê di diyalogê de bigerin. Osman Gelîş axaftina xwe wiha didomîne: “A niha herêm ji bo karsaz û pîşesazên Tirkiyeyê cihekî taybet e. Bazirganan li gel herêmê gelekî kar danîne û ev kar jî ji bo ekonomiya Tirkiyeyê pir girîng e. Girtina deriyê sînorî ji bo karsazan întîxar e. Em weke Odeya Bazirganî ya Şirnexê dibêjin bila deriyên sînorî neyê girtin û karsaz mexdûr nebin. Bi giştî kargehên Konya û Kayserî di warê pîşesaziyê de ligel Herêma Kurdistanê kar dikin. Ev yek ne tenê li Şirnexê bandorê li seranserê Tirkiyeyê jî dike. Bi kurtasî eger deriyê sînorî bê girtin wê karsaz têk biçin. Ev ne mijara pêkhateyekî ye. Eger derî bê girtin wê karsazên Konya, Edene, Qayserî û Dîlokê jî winda bikin. Ji ber vê yekê divê berpirsiyarên Bexda, Tirkiye û Herêma Kurdistanê vê kêşeyê bi rêya diyalogê çareser bikin.”

# Zebeşên Îdirê bo derveyî welêt tên îxrackirin

■ GÖNÜL GÜN



Li Herêma Serhedê ku xwedî avûhewayeke sar e, bajarê Îdirê bi avûhewaya xwe ya germ û taybet derdikeve pêş û ev yek li gorî bajarên derdorê zêdetir derfet dide vî bajarî ku cotkarî tê de bê kirin. Heta ji ber vê yekê ji bo Îdirê dibêjin; Edeneya biçûk. Li vî bajarî ji bilî sewze û fêkiyên bostanan ên wek zebeş, petîx, şemamok; sêv, hilû û hin mesxûlên din û heta cotkariya pembû jî li vî bajarî tê kirin.  Ji bilî van berheman li Îdirê cotkariya zebeşan jî tê kirin. Cotkarê Kurd Elî Akkuş di derbarê çandinî û bazirganiya zebeşên Îdirê de ji Heftenameya Basê re axivî. Akkuş dibêje mezinahiya zebeşên Îdirê hema hema bi qasî zebeşên Amedê ne û tam û aromaya zebeşên Îdirê jî gelekî xweş e û ev zebeş li herêmê zêdetir tê hezkirin.

**“Axa Îdirê berhemdar e”**

Elî Akkuşê ku ev 7 sal e cotkariya zebeşan dike dibêje, zebeş salekê diavêjin sala din bo axê navêjin û dewsa zebeşan mexsûleke din diavêjin. Akkuş li ser cotkariya bajarê Îdirê jî wiha diaxive, “Li Îdirê ji zû ve ye ku cotkariya zebeşan tê kirin û axa Îdirê gelek berhemdar e û bo zebeş jî ava zêde ne pêwist e. Berê bi rê û rêbazên kevn dihat kirin lê ev hema di 15 salên dawîn de bi rêbazên nû cotkariya zebeşan tê kirin û zeviyên zebeşan hê berhemdar bûn. Niha cotkarên zebeşan an xwedî erd in an jî zeviyan kirê dikin û wisa dixebitin.”

**“Li Îdirê zebeş bi du awayan tên çandin”**

Cotkarê Kurd destnîşan dike ku li Îdirê bi du awayan zebeş tên çandin û wiha pê de diçe, “Niha dema ku bi riya rêbazên berê zebeş bên avêtin wê demê, tov di meha Adar û Nîsanê de tên avêtin û di dawiya mehaTebaxê de jî zebeş tên berhevkirin. Cotkar dema ku bixwazin bi vê usûlê zebeşan bavêjin, divê li hêviya hewayê bisekinin da ku hewa germ bibe. Ger wisa nebe wê zebeşên wan di bin qeşayê de bimînin. Wexta ku cotkar bi riya rêbaza din zebeşên xwe biavêjin, tovên xwe zû diavêjin. Ev usûl ne tam sera ye. Yanê di vê usûlê de ji aliyekî axê tê bilindkirin ji vê re ‘girik’ tê gotin û aliyên din çel dimîne. Li cihê ku hatiye bilindkirin bi navber tov tên reşandin. Ev tov dibin şitil. Ji bo ku şitil cemed negirin tên naylonkirin. Ev usûl cotkarî biha ye lê bi vê usûlê zebeş li gor ên din bi qasî 20-25 roj berê zû tên berhevkirin û wisa jî zû dikeve bazarê û biha jî tên firotin. Bi vê usûlê zebeş di dawiya pûşper û serê tîrmehê tên rakirin. Bi saya vê usûlê avdan û kolandina zebeşan zû tê kirin. Her wisa ji bo ku divê zebeş tavê jî baş hilde ev usûl tê tercîhkirin. Çimkî dema ku zebeş mezin dibin xwe berdidin erdê.  Wekî din hin cotkar salek berê amadehiya vê usûlê dikin, hinekên wan jî di biharê de dikin. Amadehiya salek berê baştir e ji ber ku wê demê zebeş baş çê dibin.”

> “Zebeşan îxracî welatên wek Georgia, Azerbeycan û Rûsyayê dikin. Yên ku bi usûla berê zebeşan diavêjin jî pêşiyê difiroşin nav bajêr. Em dikarin bibêjin ku ev 15 salên dawîn e zebeşên Îdirê bo derveyî welêt tên çandin û îxrackirin.”

**“Rewşa bazara zebeşên Îdirê diguhere”**

Akkuş radigihîne ku mezinahiya zebeşên Îdirê hema hema bi qasî zebeşên Amedê ne û tam û aromaya zebeşên Îdirê jî gelekî xweş e û ev zebeş li herêmê zêdetir tên hezkirin. Akkuş di derbarê îxracaata zebeşên Îdirê de jî wiha diaxive, “Niha me gotibû li Îdirê bi du usûlan zebeş tên çandin. Bi usûla ku bi riya girik û cotkariya zebeşan dikin zebeşên xwe zû radikin ji xwe re bazarek peyda kirine. Zebeşên xwe îxracî welatên wek Georgia, Azerbeycan û Rûsyayê dikin. Yên ku bi usûla berê zebeşan diavêjin jî pêşiyê difiroşin nav bajêr. Eger zebeş zede bin ji bajarên derdor esnaf tên ji zeviyan zebeşan radikin û dibin. Yanî zebeşan difiroşin bajarên wek Bazîd, Agirî, Wan, Qers, Erzîrom, Erzîncan û heta diçe Stenbolê jî. Em dikarin bibêjin ku ev 15 salên dawîn e zebeşên Îdirê bo derveyî welêt tên çandin û îxracatkirin.  Lê ev yek jî heye ger di dema rakirina zebeşan de û di piyaseyê de zebeş hindik an jî zêde be ev yek bandorê li ser firotina zebeşên Îdirê jî dike. Yanî ne her sal lê carinan ji ber hin sedeman rewşa bazara zebeşên Îdirê diguhere. Bo mînak bibêjim zebeşên Amedê  ne evqas bi bandor e lê  ger zebeşê Mûşê zû derkeve wê bandor li ser bazara Îdirê hebe. Wekî din, ji ber bûyerên dawî di çûyîn û hatina bajerên derdorê Îdirê de zehmetî çê dibin. Yanî ji ber bûyeran, cotkar nikarin biçin bajarekî mezin wek Wanê wê demê bazarekî wisa mezin ji destê cotkarên Îdirê diçe. Heta carinan rewşeke wisa dibe ku cotkar nikarin mesrefên rakirina zebeşan jî bi dest bixin. “

## “Bihayên zebeşan daket”

Akkuş dibêje dema ku cara ewil zebeş rakirin bihayê wê 60 qirûş bû û niha jî daketiye 30 qirûşî. Akkuş di derbarê cotkariya zebeşan de dibêje yên ku vê cotkariyê dikin, dikarin debara xwe bikin lê divê hin şert hebin û wisa pê de diçe, “Ger bi usûlên kevn cotkarî bê kirin, divê  erd zêde be. Hin hevalên me yên ku bi riya girik û li ser 100 donim erd cotkariyê dikin hene. Ev cotkar dibêjin ‘em debara xwe bi rehetî ji vî karî dikin û heqê keda xwe distînin.’ Hin cotkar jî hene ku li ser zeviyên 100, 150 û 200 donimî zebeşan direşînin.”  Cotkar Elî Akkuş di dawiya gotinên xwe de dibêje eger ji bo zebeşên Îdirê piştgirî hebe û bi riya rê û rêbazên tabîî ev cure cotkarî zêdetir bê kirin wê qîmeta zebeşên Îdirê her hebe.



NADÎRE GUNTAŞ ALDATMAZ

## Dûhok -III-

Sulav ra tepîya raya ma hîna zaf mendîbî. Seba raya Barzanî melumato xelet dîyaybî ma, vatbî ke raye di-hîrê seatî ya labelê henî nêbî çar-panc seatî ra zêde bîye. Ma bizanayêne raye hende derg a, belkî zî nêşîyêne. Rind ke ma nêzana û şîyîme. Raywanîya Barzanî de çîyo tewr balkêş koyî bîy. Koyê berzî bi daranê mazêran sey koyanê Dêrsimî bîy. Mi heta o wext koyê nîyanênî tena Dêrsim de dîbî. Çar goşeyê Tirkîya de zî koyê berzî estê la darî mazêr nîyê. Koyê berzî bi daranê çaman xemilnîya yê, geme hama-hama her ca de gema çaman a. Coka ez kotî de ke gema mazêran bivînî ci rê gonî girênena. Çamî zî rindek ê helbet la darê qewetinî nîyê, kile ke pa nîşo desinde vêşenê, qedînê. Dara mazêre de yew asalet, yew vindetişo qeyîm esto. Dare ke va, mazêre yena vîra mi, dara mi, mazêr a.

Şîyayîşê Barzanî de amacê mayo bingeyin, şîyayîşê bi mezela Mela Mistefa Barzanî bî. Mezele, dewa Barzanî de bîye, yanî nameyê dewe zî Barzan bî. Barzan dewade zaf rindeke bîye. Naver û boverê xo koy bîy, mabênê koyan de zî yew çemo ke ma namey ser o nêameyme hure, o bî. Mînîbusa ma dewe ra vêrde ra devacor şîye, cêrê mezele de vindete. Mezele tam verê koyî de bîye. Uca de zî yew bînaya neweye bala însanî antêne. Na bînaya newe û moderne de cayê werdî, yê îbadetî û hîna belkî zî cayê zaf çîyan bî la hîna nêqedîyaybî çike seba tuvaletî çend konteynerî uca de bîy û zaf-zaf qilêrin bîy, sey boya binatî boyê dayêne. Asayîşê bîna zaf weş bî, seke peyê bîna aznaybî re ko. Di mezelî têleye de, binê yew darade girse de bîy, yew Mela Mistefa Barzanî, yew zî birayê xo yan zî yê birazayê xo bî. Mezelî zaf sade bîy, bi kemeran dorme çarnaybî. Tena yew sale (kemere) serê sereyê mezelan de tîk kerdîbî. Zowbîn çîyo balkêş, çîyo şaşayin çin bî. Merdim hende namdar o, mezela xo sey mezela yew dewijê bêkesî bîye.

Tayê hevalan mezele ser o duayî kerdî, ma fotografî antî û dima şîyîme yew cayo sergirewte de nîştîme ro, ma rê çay ard, ma çayê xo şimit û reyna kewtîme raya agêrayîşî. Êdî cayê de nêvindetîme, ameyme otêl. Heta ma ameyîme otêl seate bîye 21.30. Ma ameyîme ke embazê bînî (Tayê embazî bi otobuse, kombîyayîşî ra rojê aver amey.) zî uca der ê. Ma pîya şamî werde û a roje zî henî qedîye.

Roja hîrêyine de kombîyayîşê ma dest pêkerd. Munzur Çem, seba ke nêweş bî, nêameybî. Ma zaf kewtîme ver ke o nêweş o. Haq ci rê bêro comerdîye û ci rê berjêno xeyr bo ke kombîyayîşo amaye de mabênê ma de bo.

Wextê kombîyayîşî de xizmeta otêlî zaf rinde bîye, her deqa çay, qehwe û hîna zaf çîyo bîn teber de, serê masa de amade bî. Key ke ma orte de oreşîyayme ra, ma ci ra îstîfade kerd. Şanê roja verêne yê kombîyayîşe ma de, ez û Pinare, ma derûdorê Duhokî de fetelîyayîme. Şarê Duhokî ra yew merdimê ma bî, înan ma berdîme ca-cayanê Duhokî ra fetelnayîme. Seba şamî zî ma berdîme yew ca. A roje, roja paşemeyî bîye, roja îneye ê cayan de tatîle bîye coka şewanê îneyan (şewa ke paşemeyî îne ra girêdana) de şarî xo rê keyf kerdêne. Cayo ke seba şamî ma berdîme, tey muzîk zî bî. Hunermendan hem cinitêne hem zî vatêne. Tîya de zî dî çîy bala mi ante, o verên, mekan de cinî zaf bîy. Teyêne kincê modernî girewtîbî pira, tayêne sereyê xo girewtîbî la ancî zî zaf xemelnaye bîy. Heme zî zaf xemelnaye bîy, rindek bîy. Ci ra tayêne nargîle şimitêne. Leyê tayêne de camerdî estbîy la zaf nêbîy, zafaneyê xo cinî bîy. Nê durumî çirê bala mi ante? Çike ez verî ra henî heşîyaybî pê ke, ê cayan de, cinî zaf teber nêvejînê. Coka mi bi şaşîye tey nîyada. Cînîyê henênî bî ke wile ez zî şaş bîya. Cinîyê ke cixara şimenê estê, zaf ê la nargîle, mi heta nika zaf nêdîbî. Tabî ez zaf şa bîya ke cinî zî cayanê umûmîyan de ca gênê û fetelînê. Cinîyê ke mi uca de dîy, heme zî kinc kolê xo rind û qalîteyin bîy. Ez persa, mi va gelo nê kesê ke halê xoyo ekonomîk rindêr o, ê yê? Va, ya. Henî bo zî ez şa bîya.

Çîyo balkêşo dîyin zî, kesî kay nêkerd. Muzîk çiqas ke dawetkar bo zî kes herinda xo ra nêwuşt ra. O muzîk tîya de, yanî Dîyarbekir, Dêrsim, Mêrdin, Çewlig ûsn. kotî bîyêne wa bibîyêne şar qet nênîştêne ro, bi seatan kay kerdêne. Labelê înan kay nêkerd. Ez ecêbe de menda. Kurd û kaynêkerdîş? Çirê? Mi cinîke ra pers kerd, a tena peşmirîyaye û cewab nêda. Belkî zî persa mi fam nêkerde. Seba ke mevajê "canê naye kay wazeno" ez êdî zaf dima nêkewta.

Roja bîne zî înan ez berda yew eşkefte. Na eşkefte serra 1974î de seba peşmergeyan sey nêweşxane ameybî şuxulnayêne, coka muhîmîya xoya tarîxîye bîye. Roja peyêne de zî ma çarşîyê Duhokî dî. Boya şaristanî zaf xirabine bîye, çike kanalîzasyonê xo çin bî. Ge-ge awa qilêrin û boyîne orteyê cadeyan ra şîyêne.

nadirega@hotmail.com

# Her çîyî ra ver Kurdîstano xoser!

■ MURAD BURTAKUÇÎN



Îraq xora nêwazeno kolonîya xo Kurdîstanê Başûrî nêwazeno vîndî bikero. La hêzê Îraqî çin o, nêeşkeno vera Kurdîstanê xoser astengîya xurte bikero. Hetanî ke referandum nêzdî nêbi Îraq seba referandumî îzahatanê xo hîna nerm dayênî. Hukmatê Îraqî şîî yo, semedê ayê ra têkilîya Îran û Îraq zaf nêzdî ya.

Nê rojan de bitaybetî Kurdîstan, Îraq, Îran, Tirkîya de, umûmî zî Ewropa, Amerîka û dinya de pêro goşî nîyayê Refarandumê Kurdîstanî ser. Her kes, her partî, her dewlete derheqê referandumî fikrê xo kenê eşkera. Eşkera kenî la nê eşkerakerdişê fikran, fikrê înanê faşîzane hîna zaf beno zelal. Goreyê mi fikrê faşîstan bi xo eşkera bi! La ê kesanê ke nê faşîstî nêdîbîy (yan zî nêwaştênî ke bivînî) ez bawer kena ke nê eşkerakerdişî ra dima fikrê nê faşîstan înan ra zî bîyo zelal.

Dezgehê Asayîşê Neteweyî yê Tirkîya (MGK) kombîyayîşê xo yo plankerde seba referandumê Kurdîstanê Başûr girewto 22 êlule. Seke şima zî zanî no kombîyayîş de qerarê tehdîtkerdişê Kurdîstan ame girewtene.

Parlamentoyê Tirkîya de seba ke semedê herîşê Kurdîstanê Başûrî selahîyet bidîyo hukmat kom bî û tezkere vet. Her hîrê partîyê faşîstî yê Tirkîya amêyî têhet û vera Kurd û Kurdîstanî de bîyê yew veng û yew reng. Şima zî zanî ke ez Akp, Mhp û Chp ra behs kena! Mhp cû ver ra faşîşt yew partî ya û xora timûtim na faşîstîya xo eşkera kena, Kurdan rê xerez qelibnena. Akp wexto ke newe vejîya vatibi; meseleyê kurdan esto, la nika Akp faşîştîye de Mhp ra zaf xirabin a. Chp, xora vana ez sosyal demokrat a û çepgir a (!) Labelê faşîştîya Chp, Akp û Mhp ra vana; weta şo! Nê rojan yew parlamenterê Chp vato; "48 saet mudet bidî Barzanî û vajîn referandum ra fek verabide. Eke tepîya game nêerzono kam ziwan ra fem keno ma zî bi ê ziwanî cevabê ey bidî. Ma tedbîranê leşkerî, ekonomî û sîyasî bigerî!"

-Îran de zî sey Tirkîya yew hewayo faşîşt esto. Timûtim îzahatanê faşîştan danê û Başûrê Kurdîstanî tehdîd kene.

-Îraq xora nêwazeno kolonîya xo Kurdîstanê Başûrî nêwazeno vîndî bikero. La hêzê Îraqî çin o, nêeşkeno vera Kurdîstanê xoser astengîya xurte bikero. Hetanî ke referandum nêzdî nêbi Îraq seba referandumî îzahatanê xo hîna nerm dayênî. Hukmatê Îraqî şîî yo, semedê ayê ra têkilîya Îran û Îraq zaf nêzdî ya. Demo ke referandum bî nêzdî, Îran zî hukmatê Îraqî ser o teda ramit û coka Îraq nê rojan de sey Tirkîya û Îran zî îzahatanê faşîzan dana û Kurdîstanê Başûrî tehdîd kena! Nika ma Îraqî ra bipersî: Madem ke qewetê to hendo esto, qey dema ke DAIŞî cayê to talan kerdî leşkere to çekê xo caverdayî û remayî?

-Xora Sûrîye temîyan kewta. Aktorê ke uca şer kenê xo mîyan de heta nika zî pênêameyî û no proses de xora Surîye nêeşkena kesî ra çîyê vajo. Hêzê Sûrîye zî bibo, a zî vera Kurdîstanê xoser de vindena. Heto bîn ra zî zafê Ewropa, Amerîka û dewletê bînî, seba ke zerrîya Tirkîya û Îranî weş bikerî weverê Kurdîstanî de îzahat danî.

Dewranê verênan ra heta nika xeyalê pêro kurdan de Kurdîstano xoser esto. Ganî pêro welatperwerî fikrê Kurdîstanî ser o berî têhet. Fikrê Kurdîstanî fikrêko neteweperwerîya menfîye nîyo, fikrê Kurdîstanî fikrêko faşîş nîyo! Fikrê Kurdîstanî; azadî ya, kurdê ke cuya xo hende qas dem bindestî de mendê! Fikrê Kurdîstanî; qedexeyê ziwanî ver serewedaritiş o! Fikrê Kurdîstanî qetlîam, zulm, qirkerdiş û nêheqî qebul nêkerdiş o! Seba nê xeyalî kamî têkoşîn kerdo ma ci rê zaf-zaf sipas kenî û ma çimanê xo ser ca danî înan.

Bakur, başûr, rojawa û rojhelat de pêro hêzê kurdan vera faşîzmî ganî bibî yew. Beno ke vînayîşê dinya û metodê çareserkerdişê meseleyane sîyasîyan yê her partîye cîya-cîya bê. Cîyabîyayîşê fikrê partîyan normal o. La meseleyanê esasan de, meseleyê kurd û Kurdîstanî de, meseleyê heq û edaletî de pêro partîyî ganî bêrî têhet. Kurdî ganî vera kolonyalîstan de hîşyarê xo bî. Bi fekê dişmenan qiseykerdiş karê ma nîyo. Çend aşmê verî kurd xo mîyan de seba Şengalî pênêameyî û yew munaqeşe kerd. Neçîrvan Barzanî ameybi Tirkîya û agêrayişê xo dima îzahat dabi. Ey vatbi ke; "eke hêzê PKK Şengal ra nêvejîyê ma înan bomba kenî!" No vatiş vatişê Tirkîya yo. Eke Kurd bi fekê dişmenan îzahat bido na meseleyêko pîl o. Dîplomasî û sîyaset de ti her kesî de yenî têhet. Kes nêeşkeno vajo qey şima Tirkîya de, Îran de yan zî yewna dewlete de yenî têhet û qisey kenî, dîplomasî kenî? Labelê ê zî nêeşkenî pê fek û uslûbê înan qisey bikerî! Nika derheqê referandumî de îzahatanê Tirkîya dima ez bi xo vana qey fikrê faşîstî yê Tirkîya Neçîrvan Barzanî rê zî bîyo eşkera. Heto bîn ra zî tayê kesê ke Chp ra medet dîyêne, vatinî qey, çi ameyo sereyê Kurdan ser tena rîyê Akp ra ameyo. Înan vatinî qey, Akp şero her çî beno zelal. Vatinî qey, kurdî heta nika azad û keyfweş bîy Akp ameye û heqê kurdan destê kurdan ra girewtî! Ez vana qey înan zî vînayo ke mesele kurd û Kurdîstan bo Chp zî, Mhp zî, Akp zî û dewlata Tirkîya zî faşîstîye de dore yewbînan nêdanî. Înşellah faşîştîyê înan, her kesî rê bîyo eşkera!

Peynî de ma vajî pêro partîyan û koman de çepî/şaşî bena. Fikrê cîya-cîyayî estî û xora ganî bibî zî. Welatperweran mîyan de keso ke eleyhê Kurdîstanê xoserî de vindero çin o. Xeyalê Kurdîstanê xoserî, xeyalê Ehmedê Xanîyî, xeyalê Şêx Seîdî, xeyalê Seyîd Riza, Qazî Muhemed, Mela Mistefa Barzanî bi û xeyalê pêro partî û komanê Kurdîstanîyan o. No xeyal xeyalê heq û edaletî yo! Coka ganî pêro kom û partîyê Kurdîstanî no mesele de berî têhet û yew bibî. Eke kongreya neteweyîye demo tewr nêzdî de kom biba û hêzê Kurdîstanî bibî yew seba kurdan hîna beno hol. Ma hêvî kenî ke no referandum bibo wesîleyê xoserîya çar leteyanê Kurdîstan.

# Janaîzm

■ ELÎDA ZERRÎ

Janaîzm, Îsayî ra ver (ÎV). ss. 4. de Hindîstan de awan bîyo. Tayê vanê janaîzm bawerî ya, tayê zî van yew felsefe yo. Sazkarê janaîzm/caînîzm Mahavîra yo. Mahavîra ÎV 599 de Benares de ameyo dinya. Mahavîra gama ke beno hîrîs serrî, cînî û domananê xo caverdeno şino. Şino beno rahîb. Pêro lezetanê dinya ra dûrî vindeno. Mahavîra hewtay û di serrîya xo mireno. Ey xo tecrîd kerdbî. Yanî seba ke çîle bianco xo lezetanê keno. Vêşan maneno û çîyê nêweno. Vano; 'merdîmî ganî bedenê xo bi vêşanî terbîye bîkerî.' Dima zî mireno. Raşta ci întîhar keno. Dinya de mîyane pêro bawerîyan de tena janaîzm de întîhar qedexê nîyo. Yew janaîst eke biwazo bimiro; çîyêk nêweno û nêşimeno tena no zî ney her çîyî ra dûrî vindeno. No yew roje yo; rojeyê mergî. Janaîstî wexto ke mirenî, benê 'ezîz' yan zî 'ezîze'.. Milet, înan xo vîr ra nêkeno û yad keno. Mahavîra zî no tewir merdo û bîyo azîz. Resayo Nîrvana. Taqwîmê janaîstan roja ke Mavahîra merdo, a roje ra dest pêkeno.

Bawerîya janaîzmî Hindîstanî ra vila bîya her ca. Na bawerîye de di mezhebî estê; Şvetambara û Digambara. Rahîbê Şvetambaraye kincê sîpîyî danê xo ra. Linganê înan ra solî çin ê. Vanê, nêbo ke yew gandar binê linganê ma de bimano û bimiro.

Rahîbê Digambarayijî zî tu çî xoranêdanê, uryan ê yanî rût û pepal î. . Ney ney, şima şaş fehm nêkerd, mensubê nê mezhebî her wext ûryan î. Vanê; îcab nêkeno merdîm kincan xorabido. Çimkî ma asmên xoradayo.

Murîdanê înan ra şravaka vajîyeno. Na bawerîye de merdim zaf muhîm o. Merdimî Homa ra berzêr ê, semedê înan luzumê Homayî çin o. Na bawerîye de Homa çin o. Kaînat de her çî homa yo. Pêroyê kaînatî nemerg o. Rihê herkesî nemerg o, yanî rihê herkesî 'jîva yo' [nemerg]. Her kes xo ra mes'ul o. Kam se keno xo rê kenê.

Panc heb qaydeyê bawerîya înan estî:

Ahîmsa; Şîddet qedex o. Ganî herkes yewbînan rê hurmet bido, mewkîyê her kesî seypê yo.

Satya; Zur qedexe yo. Ganî her kes raşt qal bîkero.

Asteya; Dizdîye qedexê ya.

Brahmacharya; Ganî her kes seksî ra dûr vindero.

Aparigraha; Mal û milkê şehsî çin o.


Janaîzm de gama ke şan beno kes tu çî nêweno û nêşimeno. Ê seyahet zî nêkenî. Janaîzm de heskerdîş esto, şewqat esto. Kes kesî rê zulm nêkeno. Kes kesî ra pîl nîyo. Pêro janaîstî vegan [êyê ke goşt û berê heywanan nêwenê û nêbitnenê] Goşt werdene qedexe yo, qet nêsawenî fekê xo ra, nêwenî. Eke hadrebîyayîşê yew werdî de şîddet û zulm estbo, o werd seba înan qedexe yo, yanî ê nêeşkenî biwerê. Ê tena sewze û meywe wenî. Labelê mîyanê înan înan de zî sîr û pîyazî ra dûrî vindenî. Vanê; sîr û pîyaz ma de pexîle (hesûdîye) peyda kenê, benê sedemê hersî. Coka sîr û pîyazî ra dûrî vindenê. No semed ra janaîzm goreyê ma nîyo. Homa, ma sîr û pîyazî ra dûrî meverdo..

Pêro janaîstî alkol zî nêşimenî. Cuyayîşê înan zaf sade yo. Eke şorê bajarê Bihar yan zî Maysor, heykelê Belgda Bahubalîyê zîyaret kenê, êyê ke şonê heykele ey vînenê bena hecî. Yanî na bawerîya de hec esto. Hindîstan de taye mintiqayan de cayê hecî estê.

Koyê Şîkharjî cayo tewr fîraz o. Mahavîra tîya de resayo Nîrvana.

Mabedê Dîlwara, Palîtana, Ranakpur, Gîrnar û Gujaratî zî fîraz ê. Kam ke şiro uca, beno hec.





Edebîyatê înan zî esto. Nuşteyê înan yê tewr verênî Şaurasenî û Ardha-Magadhî Prakrit o. Ziwanê înan Sankrîste yo. Kîtabê fîroz yê janaîstan Agama ya. Nika nufùsê înan 4 mîlyon o. Zafanê zî Hindîstan de ciwîyenê. Eke yew janaîst cayêk de ronişo, verê cû uca gezî keno û dima ronişeno. Vano, beno ke murcilayî yan zî lulikî/kêzikî estbê. Nêwazeno înan ser o ronişo û bibo sedemê mergê înan. Coka destê janaîstan de hertim gezî estî. Fekê înan ra zî her tim maske estî. Vanê, nêbo ke ma wexto ke cîfê xo gênê û dane o wext yew gandar bimiro.

Bawerîya înan de reenkarnasyon esto. Goreyê înan ruh nemerg o. Ruh qet nêmireno, tekrar tekrar yeno dinya. Ê, bawerîya hinduîzm ra hes nêkenî. Vanê; Hinduîzm de sistemê kast esto, rîtuelê qurbanî esto. Labelê janaîzm de mewqî û makam çin ê, her kes seypê yo. Qurban zî qet çin o, bawerîya înan de kes nêeŞkeno yew gandarê rê zulm biko û bikiŞo. No cînayet o. GoŞtê înan zî heram o.

Janaîstê awe zaf zî nêŞimenî. Vanê; mîyane awe de bakterî este wa nêmirê. Janaîstî hende zaf qîymet danê gandaran. Û ê zerrîya kesî/e nêŞiknenê.

Beno ke Şima vajê, "la hende zî nêbeno, yanî merdîm pêro gandaran rê hende qîymet nêdano. Ê zaf-zaf mubalaxa kenê." RaŞt a, beno ke biney mubalaxa kenê labelê her bawerîye fîraz a. Mîyane her bawerîye de çîyo raŞt zî esto xirab zî. Labelê ma ganî hûrmet bide pêro bawerîyan.

Ez vana kaŞka herkes sey janaîstan yewbînan rê qîymet bidê, pêro gandaran rê hesas bibê. Goreyê mi ganî herkes vegan bibo. O wext herb zî nêbeno, xirabî zî dinya de nêmanena. Yanî o wext dinya bena cenet.

Labelê ganî o cenet de sîr û pîya zî bibê. O wext cenet cenet o, ney?

# Rueja Newî*

**SUPHÎ AYDIN**

Rueja newî bî nizdî, teyna hîri şowyona pê bena berz sêr kuêyon welat ma ra tîja germin û bi bereket. Na tîja şîrin û delal yow felqê – letê welat ma ser ra darena wi horan sîeyon, tarîtî kêy xwi azmîn ra bar kena şena. Eyi hor siey ko se hezaron ra cinî, camîyerd, qij û kal ma kişt pê kîmyavarona, enfala hin bên vila şên nimonên ni pêr welat ma ser di. Nîe Barzan ser Enfal, nîe Helebçe ser kîmyavaron û nîe zî Şengal ser tertele û qetlîam. Na tîja newî û bi bereket ver di şar welat ma yow dilîg û dezgow raştkîn non rue, nîzam û edalet ben şêrîk emir yin. Nîe zulim monen ica di û nîe zî neheqê, teyna deyrê serbestê, azadîyê û yê wirîeameyiş yena vatiş. Pêynî feqîrê û neçarê yena ica di û herkes ben wayêr welat xwi. Şar welat mi ica di hin ben serbest û azad, xwiser û serfîraz. Ben wayêr kar û gurî, îlîm û zanko, bax û baxçi, mal û milk. Herkes xebat ken qay verşîyayiş merdimatê û welat xwi ya û pê zerrê xwi kên şa.

Dunya alem pêhesîyaya ke, 25. 09. 2017 di şar welat ma yê verraruêj sibara ro yi hon şîrin ra wirzên wi û ref bi ref sê way û birayon, duêst û embazon şên sandûqê rayon ser û qay xatir cuyayiş serdêst û azada rayê xwi don, von ê, ma hin nîwazên bindestê, ma dewleta xwiser yê Kurdîstan wazên. Kurdîstan azad hesrêt zerrê kal û pîron, xuêrt û kêynon ben heqîqet, ben raştkîn vîst û poncê aşmê eylul ra pê.

Çond sê serro ko merdim welat ma qay na rueja newî, delal û zelala xebat kerda û guêynê xwi rijnaya semêd azadê welat û mîlletê xwi ya? Çond girong yin sarri wedarit verbo zalim û zuardaron di, serasêr welat di kal û pîron ma, way û birayon ma xwiverda kot cergon û pîyerdayişon ko yow ruej cuya ver xwi û zûrêt xwi, qij û kulfêt xwi azad bîk na bindestê ra. Yi kot sêr kuêyon, vêşonê û têyşonê dî, vor û varon vara yin ser. Tay yin ra kot hepson tehdayî û îşkence dî, şow ruej amê kuayiş. Tay zî mal û milk xwi ra, pez û dewarê xwi ra, bax û baxçê xwi ra bî, remay şî bî macîr dûrgelon xerîbon. Milletê ma kurdan zaf ruêj têng û tarî dî, xirabê çay pîyesîr yin vera nida, bî xizmekar, kole û bindêst şar.



Ma qalê kam qetlîam û tertelon bik, yow nî, didi nî. Şêx Seîd, Seyîd Riza, Qazî Mehemed, Mela Mustefa Barzanî û hezaron ra şehîd Kurdîstan. Teyna Kurd zî namê qetilkerdiş ni welat di, cîran ma Ermenî çay? Çi zulim ami Suryanîyan ser? Çond girong terteli û ferman Êzîdîyon vêjîya û kêy yin kerd xirabi?

Ma qalê kam qetlîam û tertelon bik, yow nî, didi nî. Şêx Seîd, Seyîd Riza, Qazî Mehemed, Mela Mustefa Barzanî û hezaron ra şehîd Kurdîstan. Teyna Kurd zî namê qetilkerdiş ni welat di, cîran ma Ermenî çay? Çi zulim ami Suryanîyan ser? Çond girong terteli û ferman Êzîdîyon vêjîya û kêy yin kerd xirabi? Nizdê yow mîlyon û nîyem Ermenî serrê 1915 di amê kiştiş û nîo zî bî macîr dunya ra bî vila şî. Herçiqas yi pê ferman dewletê Osmanîya û pê deston eskerona amê kiştiş zî tay kurdon ma zî hêt dewlet guret û bî qetilkar cîranan xwi. Helbet xêlek Kurdan zî Ermenî queri kêrd, bêrd kêyan xwi di nimit niverda yi bîyêr kiştiş. Merdim hol, zerr pak û bi merhamet mîyan her kom di êst û hê xirab zî. Na mesela gerega mar bib yow ders ko rayna çîko naterîn mîyon şar welat ma di meb. Zulim kam het ra yen wa bîyer gerega ma zuardarê qebûl mek û verboci sarri wedar.

Kurdîstan welat dewlemend, bi bereket, la heton nikay şar ma dest ra guretib. Hin dunya bedelîyaya bîya nerm, bîya hera. Teknîk zaf ver şu û hayê her kes yowbînan ra esta, merdim bî wayêr îlîm û zanayê, bî demokrat û medenî. Teyna top û tufeng peri nikên, nikay aqil û fikir, rindê û holê lazima ma merdiman rî. Ma zî wazên bîe guên rijnayiş, bîe cerg û herbona, pê sîyasêt û fikira bires azadîyê xwi û welat xwi. La her çî haw çiman verdo, hema hêt ma di tay dewlêt êst sê vergon sêr kuêyon har û hov mênd, heywan yin ra nêrm.Turkîya,Îran, Îraq û Surîya di nîe demoqratê esta û nîe zî yow heq, huqûq merdiman. Teyna kiştiş, hepis kerdiş û zulim est nî welaton di. Welat ma zî mîyon nî vergon haron di bû leti û yin ra her yow yow felqê erd ma guret xwi dest, şar ma zî kerd bindest.

Ereb, Fars û Tirk von ma musilman û şima zî biray mayê. La yi şow û ruej zûr kên von nîe Kurdîstan est û nîe zî heq kurdan. Von, kurd wazen welat ma parçek, la êaw welat kurd? Kam welat kurd kerd çahar parçi? Se serro zulim ben ma nî dewleton di. Narê nî serron peyînan di daeş amê bî belay sarrê şar welat ma, yin hezaron ra cinî, kêynê, qij û camîyêrd ma him bêrd kişt û him zî sê koleyon bazar di ruêt ereban. Sinî merdim bîyar tehmul nî guron pîson bik? Na semed ra yow hêt welat ma di pêşmergeyan qehremanan verbo nî wahşî û hovan yow cergo gird da û şikir paştê nî murdaron şikit, yi Kurdîstan ra fetelnay. Êr serasêr dunya di hemi kes yin ra tersen, çunke guron pîson kên. Nîe Ewropa verdaya û nîe zî Afrîka merdiman kişên, mal milk şar talan kên. La şikir Humay ra pêşmergeyan ma yin pirnîk ra ard û yi kêrd vila.

Na semed ra dunya alem qedr û qîmet dona Kurdan, pê camîyerdê yin qal û qisê kena û ma ra hes kena. Eger ma zî xwi û welat xwi ra hez bik, rueja newî û ya bi bereket haw pawena ma. Emir weş û welat rind, dewlemend haw pawen ma. Ma gon bizon nanê xwi sê birayon pîya bar bik û yow cuyayiş demoqrat û medenî pê destan xwi ya viraz û heton hetayî zerrê şar welat xwi pê şa bik.

*No nuşte talebê nuştoxî ser o bê redaktekerdiş, hawayo ke ey şawito ameyo weşanayene.

Ferhengek:
ruej: roje (m)
kuê: ko (n)
nîe: ne
yow: yew
yin: înan (zh., z.)
xuêrt: xort (n)
duêst: dost (n)
guêyn: gonî (m)

# "Heyf" Romanê Kirmanckî Zêdnayo

**WELAT RAMÎNAZAD**

Romano verên yê Serwet Akkaşî, Heyf yew aşmê ra verî Dîyarbekir de weşanxaneyê Roşna ra weşanîya. Roman 286 rîpel o û yewendes beşan ra pê yeno. Akkaş serra 1980î de dewa Gundik ya Mêrdinîkî ya Erdexanî de maya xo ra bîyo. Meletya de dest bi wendîşê beşê Ekonometrî yê Fakulteya Îdarî û Îqtîsadî ya Unîversîteya Înönü kerd. La unîversîte nêmcet verdayo. Da-des serrî ko de mucadele kerdo, dima têpîşîyo û demeyêko derg zîndan de mendo.

Babeta romanî; grûbêka gerîllayan seba erzaq ardişî şonî dewêk, uca de raştê operasyonê leşkerî yenê û mîyanê abluqaya operasyonî de manêne. Hetêk ra grûbe ra gerîlayêk vîndî bîyo wazeno rayîrê xo bîvîno, hetêk ra zî grubê de hîrê gerîllayî erzaq û qantiranê xo ya mîyanê abluqaya operasyonî de manenê û leşkeran dir dekewenê şerr, nê hîrê gerîllayî xo senî pawêne û xoverrodanê, hetêk ra grûbe ra di gerîllayî bi di qantiranê xo wazenê xo biresnê kampî û heto bîn ra kampî yeno bombakerdiş. Roman mucadele, ciwîyayîş, psîkolojî, kesayetî û hevaltîya gerîllayan, têkilîya gerîllayan û xoza, cografya, bandora erazî ser o şerê, psîkoljîya leşkeran û şerê gerîllayan û leşkeran ser o ameyo munitene.

Roman, kitabanê pirozan ra Tewrate ra qismo ke tede xuliqnîyaşê dinya û ciwîyayîşî ra behs beno, bi ey dest pêkeno. Nuştox, rîpelanê verênan yê romanî de mekanê cennet û erdê Mezopotamya mîyan de têkilîyêk virazeno. Na têkilîye ser o tesbîtan û analîzan keno.

Zagros û Zerdest ha cayêk ra yenê la wendox-/e nêzano/a ke kotî ra yenê. Peynîya romanî de wendox museno ke ê ha kotî ra yenê, mîyanê eraqî de mendê û wazenê cayêke asanbîyîşî xo rê bivînî. Zagros û Zerdeşt xo rê cayêk vînenê û dekewenê mîyanê qalan, tewir bi tewir babetan ra qisey kenê. Ma derheqê nasnameyê Zagrosî de tayê çîyanê kilman bander benî la ma derheqê Zerdeştî de çîyêk nêmusêne. Derheqê nasnameyê karakteranê romanî de ma teyna derheqê nasnameyê Zinarî de tayê çîyanê dergan musenê la hetêk ra nasnameyê Zinarî zî lêl maneno.

Semedê erzaq ardişî grubêk gerîllayan bi qatiranê xo ya şewêk dekewena rayîr û ê wazenê şêrê dewêk ra erzaq bîyarê. Resêne dewe, gama ke ha qantiranê xo bar kenê, dewijêk yeno înan het vano " leşkerî ha hetê dewe ra yenê". Grûbê gerîlayan mîyanê xo ra seba rayîr kontrolkerdîşî Zinarî erşawenê, ci ra vanê na nuqta de ma bipawê. Gerîlayê bîn zî mîyan panc deqayan de qantiran bar kenê, bi lez û bez kewenê rayîr. Gerîllayî nuqtaya ke Zînarî ra vato ma bipawê, Zinarî uca nêvînenê. Grûba gerîllayan ra Kawa û Mezlûm bi di qantiran xo ra ver erşawêne. Grûba gerîllayan ra Agît, Tekoşîn û Evîne zî qando ke Zinar bireso înan apey ra hedik-hêdik rayîr şonê.

Kontolkerdîşê rayîrî de Zinar tunikê xo de bi çar panc qeleyanê şekerê çaya rayîrê xo şaş keno û vîndî beno. Şewa tarî û zûlamatê de zerê daristanan û koyan de mîyanê çemberê dişmenanê de bê nan û awe tik û teyna yo. Rewşa Zinarî zaf manena rewşa Hugh Glass (Leonardo De Capprio) serqehramanê fîlmê The Revenant Vejîn yê Alenjando Ganzale Înaritu yo. No fîlm xeylî xelatê tewr başî girewtî, dinya de fîlmê ke tewr zaf ameyê temaşekerdîş yewê înan zî o bî. Hîkayeyê fîlmî û romanî hema-hema seyyewbîn ê. Gelo çîyo ke no fîlm dinya de kerdo namdar û tewr baş la romanê Heyf nêkerdo namdar û tewr baş çi yo? Zinar dekeweno mîyanê xeyalan û fikiran. Ma derheqê nasnameyê Zînarî de teyna bander benê ke unîversîte de sinifa yewine caverdayo û vejîyayo ko. Ma heta peynîyê romanî zî nêzanê ke Zînar kam o û kotî ra yo? Ma eşiqa verêne ya Zînarê ra benê hayîdar, ma bander benê ke koyî tercîhê eşqî kerda. Gelo çîyo ke Zinarê tercîhê êşqî kerdo çî yo? Zereyê xo ra munaqeyanê zanistkî keno. Mesela çarçewaya cuya komelkî de munaqeşeyê bîyolojî keno, reseno encaman û tesbîtan keno. Ca û zemanê nê mûnaqeşayan xelet nîyo? Keso ke ortê şewe de vêşan û têşan, zerê darîstanan û koyan de mîyanê abluqaya dişmenan de rayîrê xo vîndî bikero mûnaqaşeyanê winayinan kerdîşê ey mi rê rastkên nêno. Rewşa ruhî, psîkolojî, bînhîş û mezgê keso wînasî senîn beno? Heta peynî roman merg, esîrkewtîş û vêşanî û têşanî ra zaf çîyo ke Zinar xo rê keno problem û derd, ci ra zaf terseno û zerê xo de tedir perodayîşê de yo ; derheqê aqubetê ey de embazê ey bifikîyê ke Zinar remayo yan zî teslîm bîyo. Derheqê ey de no hawa fikirîyayîşê embazanê ey, ey ser o her hetî ra tesîro giran keno. Qando ke vîndî bîyo hata nêzdîyê peynîya romanî xo sucdar vîneo, xo ra nefret, xo ra zaf hêrs beno. Agîd, Evîne û Tekoşîn zî ge-ge îhtîmalê remayîş û teslîmbîyayîşê Zinarî ser o mîyanê xo de qisey kenê. Vindîbîyayîşê Zinarî înan ser o zî zaf tesîr keno.

Agîd, Tekoşîn û Evîne mîyanê abluqaya operasyonê leşkerî de manêne. Erzaqê xo benê cayêk de limnenê, qatiranê xo zî benê cayêko dalde de bestêne. Ê zî şonî cayêk de xo limnenê û temaşeyê erzaqê xo kenê. Îhtîmal nêdanê ke cayo kê erzaqê xo tede limito, hetê leşkeran ra bêro vînayîş la eksê ci vejîyeno, erzaqê înan hetê leşkerî ra yeno vînayîş û îmhakerdîş. Agîd, Tekoşîn û Evine zî ha temaşeyê îmhakerdişê erzaqê xo kenî, Keda înan awe ver de şina. Naye ver damiş nêbenê, wazenê heyfê xo bigîrê kemîn erzêne leşkeran ser o û hetê berzanê Çarçela ancîyêne. Cayo ke înan xo tede limito yeno tesbîtkerdîş, pê helîqopteranê qobrayan yeno bombê varnayîş. Leşkerî îhtîmal nêdanê ke ganîyêk uca ra ganî bivejiyo la eksê cî beno Agîd, Evine û Tekoşîn uca ra sax vejîyêne, wexto ke cayê xo bînê cayê bombe varnayîşî bedilnêne, hewna yenê tespîtkerdîş ke çîyêk nêbîyo înan. Hetêk ra ê xo resnenê lîçeyê Çarçela. Hetêko bîn ra zî bi helîkoteran leşkerî qomando lîçeyê Çarçela de yenê ronayîş, operasyona semedê nê hîrê gerîllayan rameno.

Evîne, Tekoşîn û Agîd bînê zînarêk de vêşan û têşan û bi çend fîşekana xo lîmnêne, lûlîya tifîngê xo bînê zînar ra vejêne û ha tetîkê de yê. Leşkerêk û gerîlayêk tê çîm a yenê. A game zeman vindeno... Seke mîyanê xo de peymanêka bêvenge bivirazîyo; ne ma ti dîy ne zî to ma dîy...

Kampê gerîlayan bi teyareyanê şerî yeno bombakerdiş. Di gerîllayî seba ke heyfê bombakerdişê kampî bîgîrê xo ca de hedre kenê, dekewenê rayîr, şonî rayîrê erebeyan de mayîn ca kenê û teqnêne.

Mezlûm û Kawa nêzdîyê kampî resenê yew qantire, uca de qantirêk linga aye sermetkîna, se kenê çi kenê nêêşkenê qantirê bixelesnê, qantirê qintira ra erzêne war ro. Kawa û Mazlûm xo resnêne kampî la çi bivênê; kamp hetê teyareyanê şerî ra ameya bombakerdiş. Her ca tar û mar bîyo... Kawa û Mazlûm şonî fermandarê kampî het, se kerdo çi kerdo ci ra vanî, fermandarê zî seba aqubetê Agîd, Evîne, Tekoşîn û Zînarî di gerîllayan înan dima erşaweno.

Nameyê roman Heyf o la muhtevaya roman û nameyê roman yewbînan nêtepişenê. Mavajim ke muhtevaya roman û nameyê roman yewbînan bitepişe û temam bike. La nuştox qet mefhumê heyfî ser o bîngeyêko felsefîk û etîk munaqeşe û ciperskerdîş nêkerdo û nêrasayo heyfgirewtîş edelat o edalet nîyo? Dîyaklektîkê serdestan û bindestan de seba bindestan cayo tewr girîng hefygirewtiş gêno. Goreyê mi ganî nuştox nê kontekstî ra romanî bimunayêne û seba heyfgirewtîşê bindestan diskorêk awan bikerdêne.





Roman, kitabanê pirozan ra Tewrate ra qismo ke tede xuliqnîyaşê dinya û ciwîyayîşî ra behs beno, bi ey dest pêkeno. Nuştox, rîpelanê verênan yê romanî de mekanê cennet û erdê Mezopotamya mîyan de têkilîyêk virazeno. Na têkilîye ser o tesbîtan û analîzan keno.

Ke çarçewaya heme romanî de merdim biperso çi sebeban ra heyf yeno girewtiş? Yew seba ke erzaqê gerîllayan hetê leşkeran ra yeno îmhakerdîş, gerîllayê kemîn erzenê leşkeran ser, leşkerî zayîyat danê, leşkerî seba ke zaîyat dayo wazenê heyf bigîrî. Dîyin zî kampê gerîllayan yeno bombakerdiş gerîllayî zayîyat danê naye ra wazenê heyfê xo bigîrî, di gerîllayî şonî rayîrê erebayan de mayîn ca kenê. Nê di rewşan de heyf nîyî mîsîlenme yeno kerdîş. Mîsîlleme zî yew tewirê xoverdayîş o. Qamsamê mefhûmê heyf hîna hera yo. Dîyakletîkê bindestan û serdestanê cayo tewr giring hefy gêna. Dîyakletîkê înan de wexto ke bindestî xo dano serdestî qebulkerdîş, heyfê bindestî yeno girewtîş. Çend rojî ra verî referandumê xoserîya Kurdîstanê Başûrî heyfgirewtîş bi xo yo. Goreyê fikrê mi nameyê romanê Heyfî "lewêyê çînbîyayîşê de ciwîyayîş" (lewê: uç) (bibiyêne bi muhtevaya roman ra tepiştende (tutarlı) bîyêne. Çimkî gerîlayan hemverê heme çetinîyanan, astengan, bê îmkananîya xoza û vera qewetê bêsînorî yê dişmenî de ciwîyayîşê xo berdewam kenê. Ke eke bipersîyo ke romanî de se beno ke cewabê lewê çînbîyayîşê de ciwîyayîş gênê. Qapaxê kitabî zî no fikrê mi rê seke bingeh bibo. Qapaxê kitabî, durî ra koyê kewîyî estê, ser o lewê zînarêk de merdimêko çekdarin esto yewna paye aver şêro erzeno mîyanê çînbîyayîşî. Qapaxê kitabî fikrê; lewê çînbîyayîşê de ciwîyayîşî zaf baş sembolîze kerdo.

Romanê Heyf, goreyê mi romanê kirmanckî zêdnayo. Romanê kirmanckîyê ke heta nika mi wendê, înan de munaqeşekerdiş, ciperskerdiş, analîzkerdişê babet û persê felsefîk, sosyolojîk û zanistkî ti vajê ke qet çîn î. Serwet Akkaş, bi Heyfî hem romanê kirmanckî de bingeyê mûnaqaşêkerdiş, ciperskerdiş û analîzkerdişê babet û persê felsefîk, sosyolojîk û zanistkî ra awan kerdo hem zî nê hetan ra zêdnayo. Nê hetan ra ziwanê kirmanckî de hera kerdo. Mesela roman de femînîzm, têkilîya bîyolojî û komelî, têkilîya waştîşan û îhtîyîyan, têkilîya însan û herre, welatê ey ser o munaqeşeyî, ciperskerdîşî û analîzî zaf estî.

Serwet Akkaş hîrês û hewt serrî yo. Ez nêzano çend serrî yo ke dest bi nuştîşê kirmanckî kerdo la qaso ke ez texmîn keno hewt-heşt serrî ra zêde nîyo. Heyf zî xora romanê ey verên o. Nuştoxî romanê xo yo verên de hetê şuxulnayîşê kirmanckî ra ziwanê xo nêşîyayo dewlemend, xorîn, hera û wirdlêkin (ayrıntı) bikero, romanê ey hetê şuxulnayîşê ziwanî ra qels, req, firq û teng mendo. Ez bawer kena ke nuştoxê romanî xo ê bînan de hem hetê şuxulnayîşê ziwanî hem zî hete xoxorînkerdiş ra xo xeylî aver bero. Xora nuştoxî romanê xo yo verênî ra na bawerî daya wendoxan...


Nameyê roman Heyf o la muhtevaya roman û nameyê roman yewbînan nêtepişenê. Mavajim ke muhtevaya roman û nameyê roman yewbînan bitepişe û temam bike. La nuştox qet mefhumê heyfî ser o bîngeyêko felsefîk û etîk munaqeşe û ciperskerdîş nêkerdo û nêrasayo heyfgirewtîş edelat o edalet nîyo?



# 25 saliya Nûbiharê û 20 saliya Bîrnebûnê



ROHAT ALAKOM







Di dawiya sedsala 19an û destpêka sedsala 20an de çend paytextên cîhanê wek Qahîre û Stenbol dibin navenda pêldayîn û pêşdeçûyîna welatevînî û netewîheziya (nasyonalîzm) Kurdî. Di nav Kurdan de qiymetê kaxiz û qelemê mezin dibe. Têgehên wek ronakbîr, nivîskar, komele, partî, rêbaz û destûr, belevok, meş û civîn, propagande û ajîtasyon, pirtûk, kovar û rojname her diçin belav dibin û hejmara wan zêde dibe. Di destpêka sedsala 20an de wek mînak tenê li Stenbolê ji 10an zêdetir kovar û rojnameyên Kurdî derketine. Ev yeka bûyereke nû bû ku di dîroka Kurdî de pêk dihat. Di dawiyê de dîroka çanda Kurdî û dîroka weşangeriya Kurdî her çû rengîn û zengîn bû.

Dîroka weşangeriya Kurdî ya peryodîk (vedor/demî) gelek kevn e. Wek tê zanîn rojnameya Kurdî ya yekem cara pêşîn di sala 1898an de li Kahîreyê bi navê Kurdistan derketiye û jiyana xwe heta sala 1902an berdewam kiriye. Di navbera van pênc salan de bi giştî 31 hejmar derketine. Ji ber dijwarî, tengasî û zordestiyan rojnameya Kurdîstan cihê çapa weşana gelek caran guhartiye wek Misr, Swîsre û Îngîltere. Ev yek baş nîşan dide ku weşangeriya Kurdî di nav kîjan qonaxan re derbas bûye. Ji van 31 hejmaran 26 hejmar cara yekem ji aliyê lêkolerê kurd Kemal Fuat ve li Almanyayê hatine dîtin, wek koleksiyon di sala 1972an de li Bexdayê ji nû ve hatine çapkirin. Piştî 20 salan rojnameya Kurdistan vê carê di sala 1991an de ji aliyê M. Emîn Bozarslan ve li bajarê Uppsalayê hatine weşandin. Piştî van her du çapan çar hejmarên rojnameya Kurdistanê dîsa di arşîvan de hatine dîtin (hejmar 10 û 12 ji aliyê Celîlê Celîl ve û hejmarên 17 û 18an ji aliyê Malmîsanij ve). Divê em diyar bikin ku heta niha ji van 31 hejmaran tenê hejmara 19an hê nehatiye dîtin. Bi peydakirina vê hejmarê bêgûman dîroka weşangeriya peryodîk wê hin jî rengîntir bibe! Ji sala 1898an heta niha 119 sal derbas bûne. Di navbera wan salan de bi sedan gelek rojname û kovar bi Kurdî li deverên Kurdistanê û derweyî welêt derketine. Hemû van weşanan wek çavkanî îro dewlemendiya çand, dîrok, ziman û edebiyata Kurdî pêk anîne. Dirêjahiya jiyana wan ji hev gelek cudatir e. Wek mînak rojnameya Rêya Teze li Rewanê ji sala 1930 heta roja 1/8/1999an bi qasî 4770 hejmar derketiye. Hin rojname û kovar jî hene ku tenê çend hejmar hatine weşandin.

Wek tê zanîn îsal (2017) du kovarên Kurdî ango Nûbihar 25 saliya xwe û kovara Bîrnebûn 20 saliya xwe pîroz dike.

Çawa tê zanîn kovara Nûbihar cara pêşîn li Stenbolê di sala 1992an de derketiye û heta niha qasî 140 hejmarên wê hatine weşandin. Kovara Nûbihar ku wek weşaneke çandî û hunerî tê nasîn bênavbirî heta niha weşana xwe bi serfirazî û bi pergal domandiye. Bawerî, hêvî û evîn sê peyvên giranbiha ne ku alîkariya vê rêwitiya demdirêj kirine. Kovara Nûbiharê di hejmara xwe ya 138an de bi cihdayîna gelek peyamên xwendevan û nivîskarên xwe 25 saliya vê weşana giranbiha pîroz kiriye. Ev 25 sal in Kovara Nûbiharê bi eynî formatê, bi eynî zimanî û bi eynî kelecanê her derdikeve. Navê Nûbiharê her tim navê Ehmedê Xanî "nivîskarê nivîskaran" û berhema wî ya bona zarokan Nûbiharê tîne bîra me.

> Kovara Nûbihar ku wek weşaneke çandî û hunerî tê nasîn bênavbirî heta niha weşana xwe bi serfirazî û bi pergal domandiye. Bawerî, hêvî û evîn sê peyvên giranbiha ne ku alîkariya vê rêwitiya demdirêj kirine. Ev 25 sal in Kovara Nûbiharê bi eynî formatê, bi eynî zimanî û bi eynî kelecanê her derdikeve. Navê Nûbiharê her tim navê Ehmedê Xanî "nivîskarê nivîskaran" û berhema wî ya bona zarokan Nûbiharê tîne bîra me.

Kovara Bîrnebûn ku di sala 1997an derketiye heta niha qasî 69 hejmarên wê hatine weşandin. Kovar wek dengê kurdên Anatoliya Navîn tê nasîn. Pêşiyê bi Kurdî û Tirkî bi du zimanan derdiket, piştî demekê, niha bi temamî Kurdî derdikeve. Lêkolînerê Fransî George Perrot berî 150 salan, di sala 1861an de li gundên Kurdên Antoliya Navîn digere û lêkolîneke bi navê Kurdên Haymanayê bi Fransî diweşîne. Di cîhekî lêkolîna xwe de Perrot bala xwendevanan dikişîne ser bêdîrokiya Kurdên Anatoliya Navîn. Perrot wan nifşên Kurdan ku li pey xwe tu çavkanî û belgeyek nehîştine, dişibîne pelên darên payîzê ku yek bi yek diweşin û winda dibin: "... Nifşên wan didin dûv hev û mîna pelên darên payîzê li nik me dikevin û tu şopê nahêlin, ew jî weha didin dûv hev û tu şopê li paş xwe nahêlin". Piştî vê balkêşiyê ew dîsa qasî 150 salan tên jibîrkirin. Di sala 2000an de vê carê lêkolîna Perrot bi destê Kurdên Anatoliya Navîn bi wergera Kurdî ji nû ve li Swêdê hate weşandin. Perrot û Kurdên Anatoliya Navîn piştî gelek salan nasiya xwe li Stockholmê dane hev. Bi saya kovara Bîrnebûnê Kurdên li Anatoliya Navîn di sala 1997an de ji nû ve hatin keşifkirin. Kovara Bîrnebûnê gîhişte hawar û gaziya wan. Kurdên Anatoliya Navîn ku berê hatibûn jibîrkirin, niha dîroka xwe ew bi xwe dinivîsin. Ne tenê dîrok, zimanê xwe pêş de dibin û berhemên folklorîk bi rêya Bîrnebûnê derbasî ser kaxizê dikin. Ew bi kelecaneke mezin seferber bûne. Kovara Bîrnebûnê bi hejmara xwe ya 69an cîhekî fireh daye dîtin û pîrozahiya xwendevan û nivîskarên xwe. Herwiha berpirsên kovarê bi gazîkirina 200 mêvanî şeva 7/10/2017an li bajarê Stockholmê bi navê Pîrozahiya Bîst Saliya Kovara Bîrnebûnê şevekê li dar dixin.

Wek xwendevan û nivîskarê salane yê van herdu weşanan ez careke din 25 saliya Nûbiharê û 20 saliya Bîrnebûnê bi can û dil pîroz dikim, ji van weşanên Kurdî re saline gelek dirêj dixwazim.

# Axx Ax! Bostek ax



MURAT BAYRAM

Ji beriya heft salan ve cara pêşî ye min pê li axa Başûrê Kurdistanê kir. Cara pêşî ye li cihekî bûm ku alaya Kurdistanê ber bi esmanan ve hatibû bilindkirin.

Ew Miradê ku heft salan ji vî Miradî piçûktir bû, dilê wî li serê qelema wî dijeniya, hema her tişt dinivîsî. Bêguman wî ew roja xwe ku çûbû Başûrê Kurdistanê jî nivîsîbû.

Li taxeke sosyetîk a Stenbolê li wî Miradî digerim... Ne li vê derê ye. Ez wî di gora notên wî de dibînim.

"Deriyê Sînorî yê Îbrahîm Xelîl - Başûrê Kurdistanê, 10.08.2010

Çawa ku min pê li vê axê kir, siya alaya Kurdistanê mohra xwe li eniya min da, muzîka xwezayê, xwe bi pirrepirra dengê wê xemiland. Rûyê min germ bû, pirçûkên laşê min gij bûn, kuvikên min sist bûn.

Hema di cihê xwe de sekinîm.

...

Leşkerekî paseport ji me xwest û got: "Hûn bi xêr hatin Kurdistanê". Ez ji Kurdistana neyî derbasî Kurdistana heyî bûbûm...

Dema ku min zanî, ez li Kurdistanê me, min got qey min barek ji ser pişta xwe danî. Nû ez pê hesiyam, bi salan barê bindestiyê li ser pişta min bû ku ez stuxwar bûm. Wek zox û edawa bi salan li laşê min kom bûyî û ji nifşka ve bide der, valahiyek ket laşê min.

Nû sebra min li leşkeran hat, ew rûken bûn lê ez elimîbûm yên rûtirş, bi zimanê diya min diaxivîn ku ez elîmîbûm ên zimanê diya min wek yê terorîstan û wek ên paşdemayiyan didîtin. Ez pê hesiyam ku yên dewletê diparêzin yên ji me ne, yên me ji nexêrxwazan biparêzin jî ew in, ne hewce ye ez xwe ji wan biparêzim.

Berê lûleya çekên wan leşkeran ne ber bi min ve bû. Wan tenê sîwana rûkeniya xwe ser min vedigirtin.

Bêtirs min da rê. Min li ser vê axê gavên Kurdî avêtin, min bi Kurdî nefes stand... Lê min nedizanî ez çi hest bikim, hema girî û ken li ser rûyê min pengan. Bi hezaran mirov bi hezaran rewşan hatin ber çavên min. Xwedê dizane ka çend pêşmergeyan da vê rewşa ku ez dibînim, bibînin bêvedan ketin ser rêyên mirinê û xwe ji gulleyên ku bi ser Kurdistanê de bên kirin çeper.

Ev axa ku Kurd lê bûne enfal, ji bo azadiya miletê xwe hatine kuştin û li ber xwe dane dibînim ku bêhna azadiyê jê tê. Lê min dizanî ku çawa çêbûna azadiyê ji wan re mizgîniyek bû, ji me yên mayî re jî parastina wê erkek e.

Dema ku mirov di nav tiştekî de bin, piştî demekê jê re ew tiştê ku tê de ne, wek tiştekî xwezayî tê û nikare qîmeteke bilind bidê. Lê yên wek Kurdan, yên hê jî ji azadiyê têr nebûne û hê nû hinek tişt bi destên xwe xistîne, ji bo wan qîmeta azadiyê gelek e.

Ji bo me Kurdan navê Kurdistana şirîn li vê axê bê kirin, gelek biqîmet e.

Qîmeta heyîna bostek axa ku cîhan nas dike û em Kurd dikarin xwe pê nav bidin nayê gotin..."

Ez ê di nav notên Miradî de winda bibûma, telefonê lê da. Bi mûzîka telefonê veciniqîm. Hevaleke min bi WhatsAppê badikir. Xwedêyo! Ev keçik çiqas "fotojenîk" e. Mirov ji wêneyê profîla wê ya WhatsAppê dibêje qey lîstikvan an modêleke naskirî ye. Dema min telefon vekir û jê re got "selam kankî" wê dest bi axiftinê kir. Behs dikir ku bi kurikekî Tirk re nîşanî bûye. Min xwe negirt û pirsî:

•Ew jî dê xwe hînî Kurdiyê bike?

•No, ma çi hewce ye, em dikarin bi Tirkîyê ji hev fêm bikin.

•Zarokên we dê bi kîjan zimanî biaxivin?



> Ev axa ku Kurd lê bûne enfal, ji bo azadiya miletê xwe hatine kuştin û li ber xwe dane dibînim ku bêhna azadiyê jê tê. Lê min dizanî ku çawa çêbûna azadiyê ji wan re mizgîniyek bû, ji me yên mayî re jî parastina wê erkek e.


•Tirkî...

Hat bîra min ku xwendekareke min a alman digot:

"Mêrê min Kurd e. Divê ji beriya zarokên me hebin ez hînî Kurdî bibim. Çawa be zarok dê hînî Almaniyê bibin lê heke di malê de em wan hînî Kurdîyê nekin nabe..."

Bîranîn, not û axiftinên hevala fotojenîk serê min gêj dikin!!

Her hesasiyetên xelkê hene. Tirk tiştinan, Faris tiştinan, Ereb tiştinan dixwazin. Qey hesasiyet û daxwazên me nînin. Roja ku me ferq kir hene û ne ji yên xelkê kêmtir in, jixwe em serbixwe ne. Qasî Kurdistanekê qedra wê yekê jî heye ku ji sedî 92,73ê welatiyên deng dayîn yên Başûrê Kurdistanê dizanin ku welatê wan heqê wan e.



FIRAT CEWERÎ

## Xewna te bi cih tê Mîrê min!

Celadet Alî Bedir-Xanê ku neviyê Mîr Bedir-Xan e û kurê entelektuelê bijarte Emîn Alî Bedir-Xan e, berî avakirina komara Tirkiyeyê bi kurtedemekê ji bo xwendinê diçe Munîxa Almanyayê. Hingî Almanya di hundirê krîzeke mezin a aborî û siyasî de bû û loma Celadet Bedir-Xan jî di hundirê wê belengazî û şerpezetiyê de xwendina xwe berdewam kir û bi xwe jî para xwe ji krîzê girt. Hema piştî bi kurtedemekê komar ava bû û vegera wî ya Tirkiyeyê bêimkan bû. Loma ew seriyekî çû Misrê û ji wir jî berê xwe da Şamê. Ew li Şamê pêrgî gelek serokeşîr û mezinên kurdan hat. Piraniya wan mîna Celadet Bedir-Xan akincî bûn. Celadet Bedir-Xanê edebiyatvan û edebiyathez, ew sirgûn ji xwe re mîna firsendekê dît, ji kurdên ku ji gelek deverên welêt li wir civiyabûn, destkewtî bû û li wir xebata xwe ya li ser gramerê -ku berê jî li ser xebitîbû- dewam kir. Bi alîkariya wan kurdan û li ser zanebûn û tecrubeyên salan bingehê gramera kurmancî danî. Paşê li ser hîmê wê gramerê dest bi derxistina kovara Hawarê (1932) kir. Wî bi derxistina kovara Hawarê tradisyona kurdan ya bi tirkî an jî tirkî-kurdî şikand û kovara xwe bi kurdî derxist, lê di hin hejmarên destpêkê de hebekî cih da fransî. Ew nivîsên bi fransî jî an wergerên berhemên kurdî bûn, an jî agahdariyên li ser ziman, edebiyat, folklor û rabûn û rûniştina kurdan bûn.

Bêguman, mirov dikare bibêje ku destpêka weşana Hawarê, despêka edebiyata kurdî ya modern e jî. Bêyî istisna, piraniya nivîskarên wê jî, nivîskarên kurd yên li sirgûnê bûn. Celadet û Kamran ji xwe ji destpêkê ve sirgûn bûn û li Stenbolê hatibûn dinyayê, lê li Şamê jî jiyana sirgûnî dijiyan. Wekî din nivîskarên kovarê yên berdewam yên mîna Qedrî Can, Osman Sebrî, Nûredîn Zaza, Qedrî Cemîl Paşa, Haco Axa, Dr. Nafiz, Rewşen Bedir-Xan û yên din hemû sirgûn bûn, ne li ser erda welatê xwe bûn. Yanî, tovê edebiyata kurdî ya nûjen, li xerîbiyê dihat avêtin û her li xerîbiyê jî berê xwe dida. Di hundirê deh-panzdeh salan de Celadet û Kamran bi hev re an jî cihê cihê çend kovar derxistin, bingehên gramerê avêtin, li ser wî bingehî alfabeya kurdî çêkir, dest bi wergerandina edebiyata dinyayê û wergerandina kitêbên pîroz mîna Quran û Încîlê kirin. Bi kovara Hawarê re, weşanxaneya Hawarê jî hatibû avakirin ku di wê weşanxaneyê de bi kurdî û fransî nêzîkî bîst kitêbên li ser mijarên cihê hatin weşandin. Piraniya wan kitêban ji aliyê Celadet û Kamran Bedir-Xan ve hatibûn nivîsandin an jî wergerandin. Zimanê kurdî, ji qalibê folklorî û klasîkî derdiket û pê edebiyateke hevdem dihat nivîsandin. Çi bigire, bi awayekî profesyonelî, cara pêşî û bi awayekî xurt bi zimanê kurdî berhemên pexşanî hatin nivîsandin. Nimûneyên çîrok, roman, piyes, folklor û wergerên ji edebiyata dinyayê hatin pêşkêşkirin. Kovara Hawarê li biyanistanê, di navbera edebiyata kurdî ya klasîk û modern de û herweha di navbera edebiyata kurdî û ya cîhanê de bûbû mîna pirekê. Lê, mîna îro, do jî problema mezin nebûna xwendevanên zimanê kurdî bû. Mirov di Hawarê de li gelek nivîsên Celadet Bedir-Xan rast tê ku ew gazinan ji kurdan dike û bi her rê û metodê diçe ser wan da ew li zimanê xwe vegerin, berhemên bi zimanê xwe bixwînin û dest bi nivîsandina zarê xwe bikin. Lê mixabin, ew hişyariya milî li ba kurdan tunebû û polîtîkaya asîmîlasiyonê ya xurt ku li Tirkiyeyê li dar bû, kurd çavtirsandî kiribûn, rê nedida ku kurd xwe bigihînin zimanê xwe û bi zimanê xwe perwerde bibin.

Gava weşanek neyê firotin, berhem neyên firotin, wê weşan û weşanxane nikaribin li ser lingan bimînin. Loma, kovara Hawarê jî ji ber bêxwedîtiyê ket krîza aborî û ew krîz bû sebebê dawîhatina jiyana xwediyê wê Mîr Celadet Alî Bedir-Xan û vemirandina rohnîtirîn dema gulvedana edebiyata kurdî û hişyariya milî ya nûjen…

Îro, gava li başûrê welêt ji sedî 92.73ê gelê me ji serxwebûnê re dibêjin erê, çavsoriya serdestên me mezintir bûye. Îro, gava gelê kurd dibêje xewna me ya sedsalan bi cih tê, serdestên wan di hundirê hewlekê de ne ku xewna wan li wan biherimîne.

Xewna te hêdî hêdî bi cih tê Mîrê min, tu êdî bi rehetî di gora xwe de binive, neviyên te alaya te hildigirin!

www.kurtcekitap.com:

# ‘Xwendin ji we, pirtûk ji me’

SÎNEMÊ SAKÎ

Malpera Kurtcekitap, wek malpera firotina pirtûkan a online ya bi Kurdî kar dike. Di vê malperê de, him pirtûk û kovarên Kurdî him jî berhemên ku behsa Kurdan dikin tên firotin û her wisa malper ji bilî bi Kurdî, bi Tirkî jî xizmetê dide şopîner û xwînerên xwe. Berpirsiyarê Giştî yê kurtçekitapê Ekrem Malbat di derbarê xebatên kurtcekitap û rewşa bazara pirtûkên Kurdî de ji Heftenameya Basê re axivî.




**Kurtcekitap di 2016an de cihê xwe di qada Kurdî de girt**

Ekrem Malbat li ser avabûna malperê dibêje, kurtcekitap di Gulana 2016an de dest bi kar kiriye û wiha qala armanca xebatên kurtcekitapê dike, “Sedema yekemîn ku me dest bi vî karî kir ew e; me xwest em pirtûkên ku bi zimanê Kurdî an jî bi naverok behsa Kurdan dikin derxin pêş û bibin pirek di navbera xwînerên Kurdî û weşanxaneyên Kurdan de. Me bi vê niyetê dest pê kir û em vê gavê hatin astekê.”

Malbat, di derbarê têkiliya di navbera xwîner û weşanxaneyên Kurdî de wiha diaxive, “Di xwendevaniya pirtûkan de xala herî muhîm têkiliya di navbera pirtûk û xwîneran de ye. Ev pir çiqas baş bê avakirin ewqas îstifade jê tê kirin. Lê avakirina vê pirê ne hêsan e. Bi xisûsî ger xwîner Kurd û pirtûk jî Kurdî be ev hê zortir e. Lewra cihên ku Kurd lê dijîn li gelek deveran sîstemên kar ne xurt in. Her wiha hinek bêsistemî di weşanxaneyan de jî hene. Mesela weşanxaneyên Kurdan pir pirtûk çap kirine. Ji van pirtûkan gelek ji bo Kurdan bi qîmet in jî. Lê mixabin çapxane bi qasî ku girîngiyê didin çapkirina pirtûkekê, ewqas girîngiyê nadin danasîn û belavkirina wan pirtûkan. Mesela hinek pirtûk hebûn ku ez bi salan li wan digeriyam ku bi dest bixim lê min li tu deverê ew nedîtin. Niha carinan em dibînin ku heman berhem di depoyekê de bi sedan lib riziyane. Di vê mijarê de ez dikarim bi dehan mînak bidim. Hinek weşanxane jî hene em paşê dibihîzin ku pirtûk bi kiloyan firotine. Helbet, ew jî ji neçariyê ye lê disa jî sed car heyf. Îro bi sedan malperên pirtûkfiroşiyê hene û gelek pirtûkên Kurdan di van malperan de tên firotin. Lê ji ber ku ev malperên Tirkan e reklama pirtûkên Kurdî nakin. Mesela em wek kurtcekitap.com bi taybetî pirtûkên hemû weşanxaneyên Tirkan lênakin. Ji bo çi? Ji bo ku dîsa pirtûkên Kurdan nekevin paş winda nebin.”

> Bi qasî weşanxane û xwîneran, pirtûkfiroşên ku di navbera van her du aliyan de dibin pir jî girîng in. Malpera kurtcekitap jî ku xebateke wisa dimeşîne him pirtûkên Kurdî him jî yên li ser çand, huner, folklor, wêje û dîroka Kurdan online digihêne xwînerên xwe.

**“Herî zêde pirtûkên li ser ziman û dîrokê eleqayê dibînin “**

Malbat destnîşan dike ku li gor dîtin û tecrûbeya kurtcekitapê zêdetir hin cure berhem eleqayê dibînin û wiha behsa van berheman dike, “Ji her cûreyê jî xwîner hene lê cûreyên herî zêde tên xwestin pirtûkên li ser ziman û yên li ser dîrokê ne. Di berhemên dîrokê de, piraniyên bi Tirkî hatine nivîsîn ew tên xwestin. Ji bo romanan jî tewecuhek heye lê ne ji bo hemûyan bi piranî romannivîsên naskirî pirtûkên wan tên xwestin. Mesela hinek pirtûk hene zêdetir li hinek bajaran tenê tên firotan. Wek mînak çend heb pirtûkên lêkolînî yên li ser edebiyata Kurdî hene bi piranî ji bajarê Mêrdînê tên xwestin. Sedem jî ew e ku li wir beşa Kurdî heye û ew pirtûk wek wane tên xwendin. Di nava van de pirtûkên zarokan jî di hêla xwestinê de gihiştin asteke baş. Lê ew asta ku em dixwazin re hê gelek maye mixabin.”

Malbat di derbarê bandora rewşa awarte û atmosfera sîyasî ya li ser firotina pirtûkên Kurdî de jî van agahiyan dide, “Mixabin ev salek zêde ye ku du alozî bi hev re hene. Yek qirîza aboriyê ye, ya duduyan jî aloziya siyasî ye. Xwîner heya xwe di van her du hêlan de azad nebîne bi dilxwazî pirtûkan nade destê xwe. Bi taybetî jî aloziya siyasî gelek bi bandor e. Lewra hinek xwîner hene dema ku pirtûkeke Kurdî distîne tam ne bawer e ku, ’gelo ev pirtûk wê sûdê bidê an zirarê! ’ Di pêvajoya çareseriyê de daxwazeke zêde hebû ji pirtûkên Kurdî re lê bi xelasbûna pêvajoyê re ew daxwazî jî gelek kêm bû.”

## “Kurdên dîasporayê ji yên li welat zêdetir pirtûkan dixwînin”


Malbat li ser pirsa, ‘ji bo pirtûkên Kurdî, ji derveyî welêt jî sîparîş tên xwestin û zêdetir kîjan cure pirtûk tên xwestin?’ wiha dibêje, “Bi awayekî eşkere dikarim bibêjim ku Kurdên dîasporayê ji yên li welat baştir pirtûkan dixwînin. Çend heb sedemên vê yên muhîm hene. Yek jê ew e ku Kurdên dîasporayê di hêla rewşenbiriyê de em dikarin bibêjin ku di asteke jortir de ne. Ya duduyan di hêla aboriyê de tengasiyên wan kêm in. Ya din, ev ya herî muhim e; di hêla siyasî de tu xemeke wan nîne. Ji ber wê jî her cure pirtûkan dixwazin lê bi taybetî pirtûkên wêjeyê û yên ji bo zarokan dixwazin. Ev yek nîşan dide ku Kurdên dîsaporayê gelek girîngiyê didin perwerdehiya zarokên xwe. Dixwazin zarokên wan ji çand û zimanê xwe dûr nekevin.”

Ekrem Malbat li ser plan û xebatên kurtcekitapê jî wiha dibêje “Bi rastî dema me dest pê kir projeyên me gelek bûn. Ji projeyan di hişê me de cî nema. Lê mixabin rewşa siyasî ya li Tirkiyê her çû xerabtir bû. Wek herkesî me jî bandoreke neyînî jê dît. Ji bo pêşerojê jî projeyên me hene û xebatên me wê berdewam bikin.”

# “Xebatên Çandnameyê bi giştî dildarî ne”

RONYA ROJ

Ev deh salên dawîn, bi pêşveçûna teknolojiyê, di qada nivîs û xwendinê de tiştên nû çêbûn. Dema ku mirov behsa wan cure xebatan dike malperên ku li ser gelek cure mijaran xebatên nivîskî, bi dîmen û bi deng diweşînin tên hişê mirov. Yek ji wan malperan Çandname ye ku ev malper bi zaravayên Kirdkî û Kurmancî û li ser mijarên jiyan, kelepor, perwerde, zanist û hwd. xebatan dimeşîne. Berpirsê malperê Firat Bawerî ji Heftenameya Basê re di derbarê Çandname û xebatên Kurdî yên di qada dîjîtal de axivî.




**Çandname di 2015an de ava bû**

Firat Bawerî radigihîne ku Çandname di Adara 2015an de hatiye avakirin û wiha behsa armanc û rêgezên malperê dike, “Me malper bi motîvasyona hezkirina miletê xwe, xwestina xizmetê û kêmasiya xebatên çandî û populer ên li ser înternetê dest bi xebatên xwe kir. Çend rêgezên me yên malperê hene; di nivîsan de siyaset an jî dijberiya partiyekê tune ye. Ji bo tu bîrdoziyan re ne qada propagandayê ye û ne giredayî tu partî, komele û cemaatê ye. Em, ne radîkal in ne jî pir nerm, rêya me rêya navîn e. Em ne çepgir ne jî rastgir in rêya me reya navîn e. Armanceke me ya sereke jî agahiyên li ser Kurdî û bi awayekî bi rêk û pêk parvekirina wan agahiyan e. Çandname di her qadên jiyan, kelepor, perwerde, zanist û hwd. de weşana xwe didomîne. Li ser malperê cureyên parvekirinan zêde ne (vîdeo, deng, dîmen, nivîs, dokument, interaktîvîte û hwd.) Armanceke me jî ew e ku em hin agahiyên girîng ên li ser Kurdan di zimanên biyanî de bigihênin şopînerên xwe.”

> Li ser înternetê bi dehan agahiyên nivîskî yên bi deng û bi dîmen hene û hin ji wan bi riya malperan tên weşandin. Bi Kurdî jî xebatên malperan tên kirin lê yek ji berpirsên malpera Çandnameyê Firat Bawerî dibêje “Cureyên malperên Kurdî gelekî hindik in.”

Bawerî di derbarê rêveberina kar û barên Çandnamê de wiha dibêje, “Ez, Paşa Amedî û Ridwan Xelîl wek rêvebirên malperê xuya dikin. Lê di malperê de nivîsên gelek heval û nivîskaran jî hatine weşandin. Di nav Kurdan de kesên ku dixwazin xizmetê bikin kêm in. Lê dîsa jî gelek kesan piştgirî daye Çandnameyê û nivîs û xebatên xwe ji me re şandine. Ji aliyê teknîkê ve hevalê me Ridwan Çandnameyê pêş ve dibe, gelek caran jî bi nûçeyên xwe yên balkêş beşdarî fikriyata malperê dibe. Ez û hevalê me Paşa jî bêhtir li ser naveroka malperê dixebitin. Jixwe hevalê me Paşa, edîtor û nivîskarekî baş e. Xebatên malperê bi giştî bi dildarî dimeşin. Tu kes tu pereyî ji bo ku xizmetê dide nastîne û em hevî dikin ev xebat salên dûv dirêj bidomin. Em di malperê de hin caran tiştên taybet jî diweşînin wek beşa Pirsnameyê ku armanca vê ji nêz ve naskirina rewşenbîr û nivîskarên Kurdan e. Wekî din di beşa weşannasînê de ji bo kovar û pirtûkên tên weşandin vîdeoyên danasînê amade dikin.”

**“Divê li ser mijarên cur bi cur malperên me hebin”**

Bawerî li ser naverokên malperên Kurdî û eleqeya xwînerên Kurd, bo xebatên dîjîtal jî wiha diaxive, “Em Kurd mixabin teknolojiyê/dijîtalê pir kêm bi kar tînin, sedemên vê gelekî zêde ne. A din jî gel hîn zêde tiştên Tirkî û Erebî dixwînin ji ber ku bi salan perwerdeyeke mecbûrî bi van zimanan dîtine. Dîjîtal li gor çapkirinê yanî kaxizî hîn hêsantir e, lêçûna wê jî gelekî kêm e lê cureyên malperên Kurdî gelekî hindik in. Ji berê ve xeyaleke min heye ez dixwazim li ser her mijarên cur bi cur malperên me hebin. Mînak, malperên astronomî, tenduristî, perwerdehiyê û hwd. Em nikarin bibêjin qet tune lê niha gelekî kêm in. Bi rastî dema ku şer û tundî tune be gel hîn zêde eleqeyeke mezin nîşanî xebetên Kurdî dide lê şer û tundî, gel dûrî xebatên Kurdî dike. Mînak, beriya rewşa awarte malpera me zêdetir dihat şopandin. Li gorî berê xwendina malperê gelekî kêm bûye, helbet em xwe jî rexne dikin û divê em xebatên xwe pêşdetir bibin. Di dîjîtalê de xwendinên dirêj jî hinekî dijwar e û mirov diwestîne.”

**Ji Çandnameyê xebatên Kurmancî û Kirmanckî**

Mirov gava ku li xebatên Çandnameyê dinihêre zêdetir nivîsên bi Kurdî (Kurmancî-Kirdkî) li ser çand, huner û folklorê dibîne. Bawerî wiha behsa xebatên malperê dike, “Armanca malpera me ew e ku bê siyaset û bîrdozî li ser her qada jiyanê nivîs, vîdeo, wêne, lêkolîn û nivîsan amade bike û biweşîne. Bi rastî di xebatên Kurdî de hîn zêde li ser mijarên siyasetê xebat hene lê li ser malbat, zarok, teknolojî, perwerdehî, tenduristî û hwd. xebat kêm in. Me xwest em li ser van mijarên ku xebat li ser wan kêm tên kirin bixebitin û van kêmasiyan hinekî temam bikin. Lê mixabin pir kes ne dibin alîkar ne jî bala xwe didin van mijaran. Ehmedê Xanî sê sed sal berê gotiye “bazara Kurdî kesad e” hîn jî ev gotin rast e û derbasdar e. Bê siyaset tu nivîs bala Kurdên me nakişîne û zêde nayê xwendin. A din jî, di qada çand, huner, folklor û hwd de jî xebat gelekî hindik in. Hêviya me ew e ku zêde bibin. Li vir ez dixwazim bangê hevalên ku bi zaravayê Dimilkî/Zazakî dinivîsin bikimbila ji me re nivîsên xwe bişînin. Ji ber ku rewşa vî zaravayê Kurdî xerab e. Divê em her Kurd li vê zaravayê Kurdî xwedî derkevin û bidin xwendin. Yanê nivîs ji wan, weşandin jî ji me.”



CIWANMERD KULEK

## Jiyan û Nazım Hikmet

Dema min cara pêşî ew xwend, min zanî ku dixwazim bibim şair. Min helbestên bi terzê wî dinivîsandin û hewl dida hawê wî bim. Sala dawî a lîseyê min bi helbesteke wî serî li şeva xwendina helbestan da. Navê helbestê Taranta Babuya Beşinci Mektup (Nameya Pêncemîn ji Taranta Babu re) bû. Piştî ku li xwaringeha vala a dibistana yatilî min bi dengekî hêlî vê helbesta Nazım Hikmet ji mamosteyê me yê edebiyatê re xwend, mamoste destê xwe bilind kir hewa û çavên wî li ser çend xwendekarên dî ên li dora maseyekê rûniştibûn, vî navê ku li şahê şairên berê dikirin bi qîrîn got: Sultan-uş Şuara! Dû re midûrê dibistanê qebûl nekir ku vê helbesta bi coş û xuroş li şevê bê xwendin û bi vê re helbestên ku xwendekarên dî ên li dora wê maseyê kom bûbûn jî red kirin. Belê, her kes ji her tiştî ditirsiya, û midûrê me jî fikar dikirin. Min jî rabû bi tiştekî ku nikaribûya şûnde vegerîne, bi helbestkarekî ku heçku di rojgareke berî siyasetê de hatibû dinyayê, serî lê da. Min helbesta Yunus Emre Gel Gör Beni Aşk Neyledi hilbijartibû ji bo xwendinê. Di wê şeva dawî a sala min a dawî a lîseyê de tenê hiştin ev helbest bê xwendin û ev bû helbesta dawî di jiyana min de ku min li hember mirovan xwend.

Li Eistedfoddaê, Festîvala Netewî a Galan, çalakiyeke bi navê Zehmetiyeke Wergêranê hebû. Ji neh wergêran hatibû xwestin ku helbesta N. Hikmet Yaşamaya Dair wergerînin zimanê Galî. Di festîvalê de dê xelata wergêrana yekemîn bihata dayîn. Tevî ku di programê de nîn bû, juriya pêşbaziyê ji min xwest ku ez jî vê helbestê wergerînim kurdî û tevî tirkiya wê di seremoniya xelatdayînê de bixwînim. Bi vî rengî piştî panzdeh salan min ê careke dî helbestek bi tirkî li hember xelkê bixwenda û belkî cara yekê bibûma sebeb ku di çalakiyeke festîvala Galan de ji bilî zimanê wan bi zimanekî dî tiştek bihata xwendin.

Dema min dev ji nivîsîna helbestê û xeyala helbestkariyê berda, min pê re dev ji tiştekî dî jî berdabû: zimanê tirkî. Piştî ku min dest bi zimanê kurdî kir yek ji peyvên pêşî ên ku ez fêr bûm –hem wek lêker hem wek navdêr –peyva “jiyan”ê bû. Heta wê çaxê min ev peyv li derdora xwe nebihîstibû, tevî ku zimanê axaftinê tenê kurdî bû. Eger bixwesta bigota “filankes li filan derê dijî,” diya min dê bigota “filankes li filan derê ye,” eger bixwesta bigota “filankes çend salan li filan derê jiya,” bavê min dê bigota “filankes çend salan li filan derê ma,” eger bixwesta bigota “filankesê hîn dijî,” dapîra min dê bigota “filankesê hîn sax e,” eger bixwesta bigota “filankes tiştekî xerab jiya,” bapîrê min dê bigota “tiştekî xerab hat serê filankes,” eger bixwesta bigota “filankeso 33 salan jiya” cîranên me dê bigotana “filankeso 33 salan ‘emir kir,” eger bixwesta bigota “jiyana me ne xweş e,” min ê bigota “heyata me ne xweş e.” Nav û bizavên ku diketin nav koma “jiyan”ê hemû, bêyî ku bi vê diyardeya arizî û manederiya giştî bibin, bi şiklên xweser dihatin îşaretkirin. Lewma, xwendin û nivîsîna bi kurdî hîn di destpêkê de ev şanî min dabû: heta hingê bêyî ku hayê me jê hebû em jiyabûn.

Wê rojê, dûr ji welatê xwe, dûr ji xortaniya xwe, dûr ji xeyalên xwe yên berê, dûr ji pêşeroja ku dixwazim herimê, gava min helbesta Nazım xwend ev hatin bîra min. Ji bo vê jiyana ku di heqê wê de tenê dizanim ku em ê rojekê jê biqetin û bimirin, kerem kin wergêrana vê helbestê:

Meseleya Jiyanê

1.

Jiyîn ne karê henekan e,
Tu ê bi ciddiyeteke mezin bijîy,
Wek sihoriyan, li ser meselê,
Wate, ji jiyînê pê ve û wê de ne li benda tiştekî bî
Wate, wê karê te hema jiyîn be.

Tu ê di meseleya jiyînê de ciddî bî
Tu ê ewqasî, heta wê radeyê ciddî bî ku
Em bêjin destên te ji pa’ re girêdayî, pişta te li dîwar e,
Yan jî bi berçavkên xwe yên mezin
Û berbaneka xwe ya spî li labaratuwarekê
Karibî ji bo însanan bimirî
Hetta ji bo însanên ku te ruwê wan nedîtiye
Hetta dema ku kesî ji bo vê zext li te nekiribe
Hetta tevî ku tu zanibî
tişta herî xweş herî rast jiyîn e.

Wate, tu ê di meseleya jiyînê de ewqasî ciddî bî ku
Di heftê saliya xwe de jî, bo nimûne, tu ê zeytûnan biçînî
Û tew ne ji bo ku ji zar û paşiyan re bimîne
Lê ji ber ku tu çiqasî ji mirinê bitirsî jî tu jê bawer nakî
Ji ber ku jiyîn pêştir e ji mirinê.

2.

Em bêjin, em ketiyê emeliyateke giran in,
Wate, ihtîmal e ku
em cardî ji maseya spî ranebin.
Erê ne mumkin e ku dilê mirov ne bi keser be ji çûna hinekî zû,
Em ê dîsa jî bikenin bi meseloka Bektaşî a ku ji me re dibêjin,
Em ê di pacê re binerin, ka bê baran tê,
Yan jî em ê bê tebat
li hêviya dengûbehsên dawî ên ajansan bin.

Em bêjin ji bo tiştinî hêja ku mirov di ber wan de şer bike,
Em bêjin em li sengeran in,
Hîn li wê derê, di êrîşa yekem de, hîn wê rojê
Mimkun e mirov li ser dev bikeve û bimire jî.
Em ê bi hêrseke seyr bi vê zanibin
Lê dîsa jî em ê wek dînan meraq bikin
Dawiya şerê ku belkî bi salan dewam bike.

Em bêjin em di hepsê de ne
Temenê me jî nêzîkî pênciyî ye
Bila hîn hijdeh sal jî mabe ku deriyê hesin vebe.
Dîsa jî em ê bi derve re bijîn
Bi mirovên wê, ajelên wê, şerê wê û bayê wê re,
Wate, bi derveya li pişt dîwar re

Wate, em li kû bin û çawa bin bila,
dê bijîn wek ku qet namirin…

3.

Ev cîhan dê sar bibe,
Vê stêra li nav stêran
Pirtikeke zêravê a li qedîfeyê şîn,
Wate, vê cîhana me ya qerase.


Ev cîhan dê sar bibe rojekê
Hetta ne weke lodeke qeşayê
Yan ne wek ewrekî mirî jî
Ew ê wek gûzeke vala gêr bibe
Li tariya zilûmat a bê ser û ber.

Êşa wê dê ji niha de bê kişandin
Xemgîniya wê dê bê hiskirin ji niha de.
Tu ê bi vî rengî ji vê dinyayê hez bikî
Ji bo ku karibî bêjî “ez jiyam”…

Nazım Hikmet

Bihûşteke veşartî:

# Kemaliye, bi navê xwe yê şaristanî; Eğin



Di nava xeyal û rastiyê de, di tenêtiya zinaran de weke ku li benda dema xwe ye. Para wê îro bi tenêtî û tenhabûnê xwe teslîmkirina çiyayan be jî, ji bo maceraperestan bihûşteke veşartî ye Kemaliye. Hûn ji kîjan maceraperestî bipirsin wê bibêje 'Xwedê kirî'. Başe ku vî welatî pala xwe daye tenêtî û bêdengiya çiyayan.

MEHMET ALİ AYDIN

Kemaliye, li jora çemê Firatê ye û di navbera gelî û zinarên bilind de weke ku li benda demê be disekine. Dema wê tim dema veguhestina rojê ye. Di nav xeyal û rastiyê de ne sikakên wê. Xeyalên nû li van sikakan tevlî xeyalên kevin dibin. Xeyalên berê li malên vê sikakê nobedar in. Di maceraya Kemaliyeyê de tenêtî hevaltiya îro dike. Ji devera ku rawestgeha karwanan bû ber bi welatekî ku koçberiyê dilê wê şewitandiye ve hatiye Kemaliye. Wisa ye, ne hêsan e welatekî navenda bazirganiyê be û were vî halî ku kesek berê xwe nedê û silavekê lê neke. Zeman kevin dibe, av kevin dibe, bajar kevin dibin lê wisa xuya dike ku li Kemaliyeyê tenetî kêm nabe.

Di nava xeyal û rastiyê de, di tenêtiya zinaran de weke ku li benda dema xwe ye. Para wê îro bi tenêtî û tenhabûnê xwe teslîmkirina çiyayan be jî, ji bo maceraperestan bihûşteke veşartî ye Kemaliye. Hûn ji kîjan maceraperestî bipirsin wê bibêje 'Xwedê kirî'. Başe ku vî welatî pala xwe daye tenêtî û bêdengiya çiyayan. Ne wisa bûya wê fetîşîstên betonê ev der jî bikirana beton û çîmento. Welatê xeyalan jî wê bikirana goreke betonî. Baş e ku di nav xeyalên nû de xeyalên kevin reqsê dikin. Baş e ku xeyalên nû tevlî ruhê xeyalên kevin dibin. Di dîrokê de navenda bazirganiyê bû lê niha tenêtiya zeman, di kolanên rê û malên wê de olan dide. Pistepista tenêtiyê ye îro, tişta tê guhê wî bajarî. Koçberî di maceraya zeman de bi kodên îro nexş dike.

Lê Kemaliye ne ji bilî vê ye. Dem û av kevin bibin jî, mekan bi kodên xwezayê olan dide û digihîje aramiyê. Sikakên teng, malên textîn ku li kêleka hev bi rêz bûne li hember herikîna demê li ber xwe didin. Mîrkutên li ser deriyan yek digihîje huşûyê yê din xwe davêje jiyanê. Bihûşteke xwe di tenhabûna zinaran de vedişêre ye Kemaliye di heman demê de. Av kevin dibe, zeman kevin dibe. Av diherike, zeman diherike lê Kemaliye ji jor ve bi dilrehetiyeke huşûyî li herduyan dinêre

**Kemaliye li ku derê ye?**

Kemaliye li kêleka çemê Avareş e ku beşa herî mezin ê çemê Firatê ye û ji çiyayên Minzûrê derdikeve. Bihûşteke veşartî ye ku sikakên teng, malên textîn ku li kêleka hev bi rêz bûne li hember herikîna demê li ber xwe didin.

Dîroka wê baş neyê zanîn jî li gorî ku nivîsên li ser tatan hatine dîtin ku nêzîkî kaniya Dillî, dîroka wê digihîje B.Z bi 2000an. Hebûna av û daristanan mirov kişandine vê herêmê. Di salên 1900an de yek ji girîngtirîn navenda bazirganiyê bû, di roja me de cihê ku xelk jê koç dibin, ciwanên wê bo lê bijîn tu sebep nabînin lê belê ji bo maceraperestan jî cihekî pir girîng e Kemaliye. Li aliyekî çiyayên bozik ku şewqa xwe didin ser ruyê Firatê. Li aliyê din jî malên textîn ku di nav şînahiyê de wenda bûne. Dema ti dikevî nav bajêr germahiya mirovan, xwedîderketina çanda xwe li ber çavê mirov dikeve. Mirovê tu bajarî weke yê vî bajarî ji axa xwe hez nake. Ew kesên dimînin ji ber vê hezkirinê û aramiya ku av û şînahî dide mirov dimînin.

Herêma Kemaliyeyê B.Z di sedsala 4. de ketiye bin serweriya Bîzansiyan, ji sedsala 7. ve jî rastî êrîşên Ereban hatiye. Piştî Tirk hatine Anatoliyayê ketiye bin serweriya Selçûkiyên Anadoliyê, Dewleta Îlhanî û Akkoyûniyan. Di dema Çelebi Mehmed de jî tevlî dewleta Osmanî bûye. Bi demeke mezin de girêdayî Eyaleta Diyarbekir weke Lîvaya Arapkir hatiye îdarekirin. Di heman demê de jî warê ku Etî û Urartuyiyan herî zêde jê hez dikir bû Kemaliye. Berê xwe bidin kura wê hûnê rastî şaristaniya van herdu medeniyetan bên.

Li ser tabelayên navçeyê navê wê Kemaliye (Eğin) derbas dibe. Li gor daneyên fermî Kemaliye be jî gel hê jî jê re dibêje Eğin. Di navbera Elezîz, Erzîngan û Meletî de ye. Demeke dirêj bi Elezîzê ve girêdayî mabe jî di sala 1990î de ket ser bajarê Erzînganê. Çanda wê zaftir ji van her sê welatan tesîr girtiye lê belê korîdora Helebê jî xwedî tesîrekê ye li vî bajarî. Ji bo hûn bikaribin biçin Kemaliyeyê hûn dikarin bi balafirê biçin Meletî an jî Erzînganê û bi dolmîşan berê xwe bidin Kemaliyeyê. Otobês an jî Ekspresa Anadolî ya trênê jî alternatîfeke din e.

Herêm bi salan bûye navenda kerwanên ku ji behra reş ber bi Kurdistanê ve diçin. Zanaatkarên wê, karîgeriya xalîçeyan û bi qesabên xwe deng vedaye. Demekê ji Ermen û Rûman re jî bûye mal. Niha jî nasnameya hemû neteweyên herêmê di hundirê xwe de dihewîne.

**Malên textîn ên Kemaliyeyê**

Bi mîmariya xweser a kevirîn û karîgeriya textînî (ahşap), li herêmê karaktereke sereke ye. Ji ber ku text berfê zeft dikin û di nava xwe de avê derbas dikin serê van malan bi sacên polayî hatine pêçandin. Zeximbûna textan û guncavbûna avûhewaya herêmê mirov ber bi çareseriyeke wiha ve birine. Mal bi bexçeyekî derdikevin sikakê. Dema hûn dikevin malê jî ji 'Guverte' ku ji kevirên biçûk pêk tê, derbas dibin. Ev kevir ji Lîkyayiyan bo Anadoliyê mîras mane. Ji ber ku mal ber bi berwara zinaran ve hatine çêkirin weke terasê hatine çêkirin.

Li malan li qata yekem de keziyên kevirîn balê dikişînin. Kevirên biçûk di navbera kevirên mezin de bi pergala kezîkirinê cih digirin. Ev yek li hember erdhejê jî malan zeximtir dike. Ev qata yekem di hin malan de weke axur, hin malan de jî weke embarê tê bikaranîn.

Mirov karîgeriya textînî him di mobîlyayên malê de, him jî di şibake, kepenk û kulekên malan de dibîne. Bi taybetî jî li gundên der û dor mirov rastî karîgeriyên balkêş tê. Mînakên avadankirinê yên sivîl, parastina malan ji aliyê gel ve û bikaranîna zanaata textan ji aliyê gel ve bûye sedem ku ev şaristanî heta îro were. Helbet tamîratê dixwaze lê li gor der û dora xwe gelekî baş û zindî ye. Beriya zanaatkarên Ermenî û Rûm terka vî diyarî bikin şaristaniya xwe li vir ava kirine û hê çûne. Niha jî hin kes hene bi van zanaatan ve mijûl in. Nifûsa Rûman herî zêde li gundên Venk (Yaka), Şırzı (Esertepe) dima û niha jî ev gund weke berê li ser nigên xwe ne û zindî ne.

Dengê ava ku li sikakan diherike bêguman hesta jiyanê dide mirov. Li herêmê kêşeya herî mezin kêmbûna avê ye. Av her diçe kêm dibe. Pirsgirêkeke din jî ew e ku bikaranînên ji derveyî welêt hatine. Xebatên ku karakterê herêmê piştçav dike rastî bertekan tê. Li aliyê ku qaşo restorasyona wê tê kirin û teslîmê TOKİyê hatiye kirin de ev bertek eşkere ye. Nava keviran vala kirine û kevirên biçûk jê derxistine û bi xercê tije kirine. Tê gotin ku textên li terasên malan hatine çêkirin jî ne zexm in. Mihtemel e ku di demeke nêz de ji ber berfê terikandin û şikestin derkevin holê. Li deverên biçûk dema karên wiha tên kirin zû rastî bertekan tên. Li kolanan bi kê re biaxivî aciziya xwe ji ber kiryaran tîne zimên. Yek ji giliya gelê herêmê jî ew e ku, li navçeyê gelek hosteyên xwedî tecrûbe hene, heta di bin serpereştiya zaningehê de navenda restorasyonê hatibe vekirin jî bi îhaleyan kesên ne xwedî tecrûbe, ji deverên din tînin û bi wan restorasyonê dikin. Di encamê de jî restorasyon ji destên ne xwedî tecrûbe derdikevin holê. Mirov bi awayekî vekirî dibîne ku restorasyon û karkirina kevirîn ne li gor ruhê textîn e û amatorî li ber çavan e. Malên ku nehatine restore kirin hê jî li ber çavê mirov pir xweşik xuya dikin. Hê jî weke gencîneyeke çandî li ber çavan dimînin.

Qada çarşiya kevin ku li navenda bajêr e ji ber sotineke mezin hatiye wendakirin. Lê hê jî ev qad weke navenda navçeyê tê bikaranîn. Dema hûn ber bi bilindahiyan ve diçin ku ji sotinê tesîr nexwarine, hûn rastî sikakên xweser, avahiyan û avên ku li kêleka sikakan diherikin tên. Lê belê li vî diyarî dengê Firatê beriya bendavan xweştir olan dida. Niha santralên ceyranê ev dengê bi coş kêm kirine. Gel bi berxwedaneke xurt li hember vê yekê jî derdikeve.

Li zinarên Kemaliyeyê Aşxaneyeke ku hê jî dixebite, mizgefteke dîrokî û Lokhaneya ku ji tûyê hişk û gûzan tê çikirin heye.


62 gundê vê navçeyê hene û her gundek ji yê din xweşiktir e. Tê gotin ku gundê Apçaxayê bi rêzikên Ahmet Kutsi Tecer ku digot, "Li wir gundekî dûr heye" hatiye taswîrkirin.

Li vî gundî jî xebatên restorasyonê bi lez bûne. Sedema wê jî xwedê zane dîtina ji der û dorê ye.

**Navdarên Kemaliyeyê**

Wikipediya di nava navdarên Kemaliyeyê de Wezîrê berê yê Pîşesazî û Bazirganiyê Ali Coşkun, Wezîrê Enerjiyê yê berê Ziya Aktaş, Nivîskar û Helbestvan Ahmet Kutsi Tecer, Enver Gökçe, Cîgirê Serokwezîrê piştî kutadaya 12ê Îlonê Zeyyat Baykara, Çêker Mustafa Oğuz, Helbestvan Behçet Kemal Çağlar, Hunermend Mustafa Özgül, Lîstikvan Cem Davran, Balyozê Romayê Uğur Ziyal, Spîkerê Kanaltürkê yê polîtîkayê Tuncay Özkan, Siyasetmedar Tahsin Şahin Yiğit, rojnameger Yusuf Ziya Ademhan, Serokwezîrê berê Şemsettin Günaltay (1949) û Serokê Giştî yê Partiya Karkeran (İşçi Partisi) Doğu Perinçek dinivîse.

Herwiha gundê Başbağlar ku bi qetlîama Başbağlar tê nasîn jî di sînorên vê navçeyê de ye.



Ev bajar xwedî kanyona duyemîn mezin a cîhanê ye. Kanyonê bala geştiyarên biyanî kişandibe jî mixabin di nav geştiyarên Tirkiyeyê de pir nayê zanîn. Her sal werzîş û festîvala xwezayî ji pêk tên. Rêzefilma Pir (Köprü) mijarên li vê navçeyê rû dane dike mijara xwe.

## Kanyona mezin a duyemin a cîhanê

Ev bajar xwedî kanyona duyemîn mezin a cîhanê ye. Kanyonê bala geştiyarên biyanî kişandibe jî mixabin di nav geştiyarên Tirkiyeyê de pir nayê zanîn. Parêzgerê Erzînganê yê berê Recep Yazıcıoğlu ji bo danasîna vê kanyonê pir xebitîbû. Li gor gelê herêmê festîval û werzîşa xwezayî jî berhemên wî ne. Her sal werzîş û festîvala xwezayî ji wan rojan heta îro pêk tên. Hey cihê wê hatiye em bilêv bikin: Rêzefilma Pir (Köprü) mijarên li vê navçeyê rû dane dike mijara xwe. Xemgîniya herî mezin a gelê herêmê jî di sohbetên ligel şêniyan de jî diyar e ku di sala 2003an de mirina Recep Yazıcıoğlu ye. Mijara rêzefilmê jî pira ku ji aliyê parêzger Recep Yazıcıoğlu ve hatibû çêkirin e. Herwiha navê pirê jî 'Pira Parêzger Recep Yazıcıoğlu' (Vali Recep Yazıcıoğlu Köprüsü) ye. Di kanyona tarî de ji sala 2008an ve werzîşa xwezayî tê kirin. Û di festîvalê de jî xwe avêtina bi BASE Jumping ê tên kirin.

Bajarê ku heta salên 1940î debara xwe bi çêkirina xalîçe, çêkirina bezan, solan û polayan dikir piştî koçberiya ber bi Erzînganê ve hejmara wê ketiye heta 2500 kesî. Havînan jî ji bo geştiyar û werzîşvan tên Kemaliyeyê hejmara şêniyan digihîje 5000 hezarî û gelê Kemaliyeyê jî bi vê yekê debara xwe dike. Kemaliye ji bo werzîşa xwezayî weke mînak raftingê jî guncav e.



## Mîrkutên deriyan, yek ji bo jinan yek ji bo mêran e

Mîrkutên deriyan jî cur bi cur in. Lê armanca wan yek e. Di deriyan de du mirkut hene. Yek dengekî qalind derdixîne ew ji bo mêran e ya din jî dengekî bi tîz yanê zirav derdixîne ew jî ji bo jinan e. Bi vî awayî xwediyê malê li gor mêvanê xwe, xwe dide hev. Dema dengê qalind lê dikeve jinên malê jî dizanin ku mêvanê wan mêr e û li gor wê ew jî radibin xwe didin hev û çarikên xwe girê didin.